ABDULLAH ÖCALAN

# AXAFTİNÊN KONGREYA AVABÛNA PKK'Ê (1978)

WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê

DÎROKA ÇAPÊ: SIBAT 2016

CIHÊ ÇAPÊ: ÇAPXANEYA AZADÎ

WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê

# NAVAROK

Pêşekî ........................................................ 5

**AXAFTİNÊN KONGREYA AVABÛNA PKK'Ê (1978)**

Rewşa Siyasî û Berê Muhtemel Ê Pêşketinan ....... 7

Programa Partiyê ............................................. 29

Sosyalîzm û Rêxistinbûn ................................... 42

Wezîfe û Hedefên Me ........................................ 68

Encam ........................................................... 83

Pêşekî

Di ser re tam 38 sal derbas bûne. Dema em berê xwe didin van analîzên Rêbertiyê yên destpêkê, weke milîtanên PKK'Ê dibe ku em bi tiştên ji me zêde ne biyanî ne re rû bi rû bimînin. Lê dîsa jî îsabet û kûrbûna dahûrandinên polîtîk, îdeolojîk –wexta ku em evqas salên di ser re borî ne li ber çav bigirin- ji ber ku ji tazebûna xwe ti tişt kêm nekirine û berovajî ji aliyê jiyana pratîkî ve hatine piştrastkirin di asteke pir bilind de zanistîbûna xwe diparêzin.

Dibe ku di vê derbarê de gelek tişt bên gotin lê em mafê nîqaşê (xwendina vê berhemê) didin hevalan. Weke Komîteya Xebatên Şehîdan em ji xebateke bi vî awayî pêşkeşî hevalan kirinê baxtewar in.

Ev berhema Rêbertiya me, di rojeke meha reş a Sibatê ku komploya navneteweyî hatiye lidarxistin de pêşkeşî hevalan kirin, me hestiyar dike lê ew gotina zerîn a Rêbertiyê jî di bîra me deye:

*"TİŞTÊ MİN NEKUJE, MİN XURTİR DİKE"*

Silav û Rêzên Şoreşgerî
Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'Ê

Axaftinên Kongreya Avabûna PKK'Ê

13.02.2016

# AXAFTİNÊN KONGREYA AVABÛNA PKK’Ê (1978)

## Rewşa Siyasî û Berê Muhtemel Ê Pêşketinan

Eger em di aliyê fêmkirina têkoşîna me de Tirkiyeya salên 1970’an bînin bîra xwe, di pêvajoyek ku zanebûna neteweyî qet nebû an jî pir kêm bû, nedihate fikirîn da ku sosyalîzm weke doxtrînekê were qebûlkirin û were ragihandin pratîka welêt û li welat pratîze were kirin de em bi rê ketin. Ji bo ku em bi civîneke xurt li ser pirsgirêkên rizgariya welêt kûr bibin, şert û mercên wê demê rê nedidan. Dîsa, di wan deman de me nekaribû fêm bikin ku li ser welatê me çewisandineke (baskı) bi çi şiklî heye, û me nedizanî ku vê çewisandinê çi têkilî çêkirine. Me, bi şiklekî pir zeîf analîz dikir ku pirsgirêkeke me ya welêt, pirsgirêkeke me ya rizgariyê heye. Di vê mijarê de hin fikrên soyut (razber) bala me kişandibûn; lê têra xwe analîzek nebû. Cudatir, li ber ronahiya van analîzan têra xwe kadrobûnek qet nebû. Me di van şert û mercan de dikarîbû bifikirin ku bi terzeke pir sereta şiklekî bidin têkoşînê, di şert û mercên neteweya hakim de, di şert û mercên îdeolojiya

burjuwa ku bi şiklekî pir giran li ser ciwanên wê derê hakim bû de weke grûbeke têkoşînê derkevin an jî me dikarîbû hin rêgezan (ilke) bînin bîra xwe. Me nedikarîbû ku ji vê zêdetir tiştekî bikin.

Bi taybetî ev pirsgirêk pir bala hevalan dikişîne: Me çima nekarî di destpêkê de bi rêxistin û programeke hê cidîtir derkevin meydanê? Belê, me ji ber van sedeman nedikarî ku em derkevin. Di wê pêvajoyê de bi giştî ji ber bandorên pir giran ên burjuwazî ku li ser rewşenbîrên neteweya hakim hebûn, dîsa girêdayî bi vê re emê ku di asîmîlasyoneke pir giran re hatine derbaskirin û di bin tesîra burjuwaziya hakim de bûn zêde nedikarî tiştekî bikin. Bi her şiklê çewisandinên li ser me dihatin pêkanîn û bi her şiklê polîtîkayên asîmîlasyonê ku dihatin pêşxistin, li pêşiya avêtina gaveke xurt dibûn asteng.

Pêwîst e, îro bi misogerî derketina me ya di şert û mercên wê rojê de were rexnekirin. Bi rastî jî, derketina me ya di wan şert û mercan de, bi giştî bûye sedema karekter û taybetmendiyên me yên îro jî. Ji bo ku em kêm-zêde rewşa xwe ya îro fêm bikin, divê bi misogerî şert û mercên berbiçav (somut) ên dîrokî yên derketina meydanê ya wan rojan were fêmkirin. Bêyî ku em van tê bigihêjin, em fêm nakin ku ka wê sosyalîzm çawa were gihandin Kurdistanê û bibe rojev, li ser pratîkeke diyar û rêxistinbûneke çawa were pêkanîn. Derketina me ya meydanê ya li wir pêwîstiyeke diyalektîkê bû. Ev ne teseduf e, û ne jî dikare bi derketina meydanê ya çend dahî an jî çend şexsên hişyar were îzahkirin. Ne wiha ye. Li wir derketina me ya holê, bi temamî encameke xwezayî ya di raboriyeke (geçmiş) dîrokî ya dirêj de, di bin mekanîzmaya zext û kedxwariyeke diyar de ragirtina welat e. Rewşeke bi temamî li gorî pêşketinên dîrokî û li gorî pêşketinên di asta cîhanî de ye.

Dema em di vê riyê de derketin meydanê, weke tê zanîn em hê zêde ji şovenîzma neteweya hakim û ji şovenîzma sosyal a di nav refên şoregerî de pir tesîr bûn an jî tevî ku em ji van tesîr bûn, li pêşberî van bi reaksiyoneke zêde nîşandanê, di vê mijarê de ew bi

şiklekî hişk rexnekirinê, me hewl da ku em ji nû ve û di şert û mercên welatê xwe de bi şiklekî rast Marksîzmê pratîze bikin. Birastî jî sê çar sal li ser vê mijarê xebat hate meşandin. Divê ev neyê jibîrkirin. Di qada teorîk de mehkumkirina şovenîzma sosyal û piştî vê jî mehkumkirina derketina holê ya gelek gruban, nikare were gotin ku tesaduf e. Di vê mijarê de bi têkoşîna ku me bi şiklekî pir bi kûrahî pêş xistiye û bi taybetî ji ber rexneyên me yên li ser îdeolojiyeke wiha ku li ser ciwanên Kurdistanê çewisandineke pir zêde pêk aniye, bi her ku diçe teşhîr û deşîfre kirina sosyal şovenîzmê bû sedem ku tesîra wê ya li ser rewşenbîrên Kurd an jî grubên dixwazin li Kurdistanê şoreşê bikin û ji bo hemû Kurdistanê nêrîn pêş bixin hinekê bişkê, û hê zêde pêvajoya ji bo Kurdistanê rêxistin û îdeolojî avakirinê hat destpêkirin.

Me, bi rastî jî bi kovarekê, bi ajîtasyon û propagandayeke xurt ev xebat nekir; me hê zêde bi propagandeya devikî, di yekeyên (birim) pir biçûk ên xwendevanan de, di civînên li ser kursiyan de, di komale û lokalan de xebateke wisa dikir. Lê, ev jî wezîfeyek e. Ji ber ku eger em rewşa tevgera şoreşger a Tirkiyeyê ya di wê demê de bînin ber çavên xwe, eger em rastiya ku wan jî hê zêde xwe li komele û dibistanan bisînor kiribûn, li lokalan xebat dimeşandin bînin bîra xwe, ji bo me, ew rexnekirin û bagaja xwe ya îdeolojîk li vir dagirtin pêşketineke herî xwezayî bû. Eger em bala xwe bidinê, piraniya hevalan şahidê wê pêvajoyê ne, me kêm-zêde li vir şovenîzma sosyal û şovenîzm derbas kir û karibû layiqê dîroka welêt, rastiya welêt bin an jî di vê mijarê de em ketin pêvajoyeke diyar a pêşketinê. Di heman demê de me dest pê kir, em hêdî hêdî li welêt belav bin. Eger me di qada îdeolojîk de, li metropolên neteweya hakim, li merkezên perwerde û çandê yên hê girîng pêşketineke bi vî şiklî bi ser nexistana, em bi temamî pê bawer in ku me ne di şert û mercên welêt de ji nû ve paşde vegerek çêdikir an jî pirsgirêka şoreşê ya vî welatî ji xwe re weke hedef didît û ne jî grubên esasî yên ku îro li vir in, dikarîn grubên herêmî çêbikin.

Bi misogerî bingehekî vê yê îdeolojîk heye. Li ser vê bingehê îdeolojîk hê zêdetir piştî ku me Kemalîzm, ku şiklê herî bihêz ê neteweperestiya neteweya hakim e û şovenîzma sosyal şiklê wê yê di nav refên çepa şoreşger de ye, têra xwe teşhîr kir û di encama van rexneyan de me fêm kir ku di qada neteweya hakim de, di qada serdestiyê ya burjwazî de em nikarin zêde tiştekî peyda bikin, me pêwîstiya bi vegera welêt hê jî zelaltir kir. Li ser vê bingehê, me karîbû ji hêzên pêşverû, şexsên niyetbaş û girêdayî berjewendiyên gel in re vebêjin; ji bo ku di aliyê civakî, çandî û siyasî de ji nû ve qadên pêşketinê ji bo gel werin afirandin cudatir ji vegera welêt ti reyên me yên din nemane. Û yên ku karîbûn dev ji berjewendiyên xwe yên burjuwaziya biçûk berdin û pirsgirêkên xwe derbas bikin, fikarên xwe yên şexsî bidin aliyekî, yên ku girêdayî bi kerameta mirovbûna xwe ve bûn, ji ber baweriya xwe ya bi enternasyonalîzm û welatparêziyê hatin nav şert û mercên welêt.

Helbet dihat payin ku bi ketina nav van şert û mercên welêt re, em ê bi hin fikrên îdeolojîk ên ku çavkaniya xwe ji hêzên hakim ên herêmî digirin re rû bi rû bimînin û bi van re bikevin nîqaş û pevçûnekê. Hê dema em nû derdiketin, me ji xwe re erk û wezîfeyek ku di asta rêgezekê (ilke) de ye hilbijartibû. Li gorî vê; ya yekem rexnekirina şovenîzm û şovenîzma sosyal a ku çavkaniya xwe ji neteweya hakim digire; ya duyemîn jî, hin grubên herêmî yên burjuwayên nijadperest ên reformîst ku hê zêde di bin tesîra şert û mercên neteweya hakim de û li gorî polîtîkayên mêtingeriyê çêbûne –dixwaze bila çavkaniya xwe ji hêzên komprador an jî ji hêzên burjuwayên biçûk bigire- û di bin zextan de ne, bi şovenîzm û şovenîzma sosyal re zêde zêde têkildar in dibe ku hebin, pêwîstî pê hebû da ku ev her du xet jî bi misogerî werin deşîfrekirin, teşhîrkirin û maskeyên wan were xistin xarê. Me, ev wek erk û wezîfeyên îdeolojîk ên herî girîng danîbûn ber vê gruba derketiye holê.

Ya rast, pratîka îro û asta ku me îro bi dest xistiye nîşanî me daye ku, ji bo me bi vî şiklî tesbîtkirina hedefên me yên di qada

îdeolojîk de çiqas zehmet e. Ev her du xetên îdeolojîk bi rastî jî dikarîbûn bibûna hedefên îdeolojîk ên wê kêliyê. Helbet, xetên ku Marksîstan bikarîbana li dijî derketana wê bibûna ev her du xet.

Versiyonên cur bi cur, şiklên cur bi cur ên van her du xetan ê hebin. Jixwe, me yek neda pêş ya din. Şovenîzma sosyal ji aliyê çend gruban ve tê temsîlkirin, nijadperestiya ku teslîmiyetê diparêze ya reformîst ji aliyê çend gruban ve tê temsîlkirin, cihanê çawa fêm dikin û dikin çend parçe, me ev bi ti tiştî nehesibandin. Bingehê wan ê esasî ev e; yanî li aliyekî şert û mercên herêmî, şert û mercên neteweya hakim û ya din jî şert û mercên neteweya bindest şikil dide van, van derdoran li aliyekî jî ji bo ku karektera xwe veşêrin di her mijarê de qalibên navneteweyî ji xwe re esas digirtin. Lê ji ber vê, ji ber ku qalibên navneteweyî ji xwe re esas digirin, me ti car ji bo ti gruban negot "filan grup, bi temamî Marksîst e". Me, hê zêde ew di çarçoveya berjewendiyên wan ên herêmî de, berjewendiyên neteweya ku temsîla wê dikin an jî berjewendiyên hêzên hakim ên burjuwaya van neteweyan de girtin dest. Dîsa, me ji bo nêrîn û îdeolojiyên ku wan pêş xistine bi şiklê ku hê zêde xizmeta van çînan dikin ew girtin dest û rexne kirin. Van rexneyan hêzeke pir mezin da me.

A rast, eger hinekê mirov bala xwe bidê, bila li aliyekî bimîne wiha bi sedan, deh hezaran hatin gel hev, wê demê me nikarîbû bi deh kesan re jî werin gel hev. Li aliyekî nûnerên (temsilci) paşverûtiya herêmî yên li wir, li aliyê din nûnerên burjuwaziya hakim di aliyê fikir de mafa jiyanê jî nedida me. Helbet paşverûtiya me ya çandî û xwe negihandina me ya şiklên fikrên hemdem jî, em dixistin tengasiyeke mezin. Lê weke min got, dema birîn bi vî şiklî rast hatin tesbîtkirin û ya din jî dema ku me rêbaza ji çavkaniyên esasî yên Marksîzmê fêrbûn ji xwe re esas girt, ne mimkûn bû ku pêşketinek çênebe. Di çi astê de bi tena sera xwe dibe bila bibe, di çi astê de hindik dibe bila bibe, bi şiklekî aşkere li ber çavan bû ku grubeke têkoşînê ya ku ji xwe re hedefên wiha rast yên berbiçav

(somut) ên dîrokî ne tesbît dike, wê bi misogerî pêş bikeve, li wir şikil bigire û pêşengiya li welêt bi misogerî bi dest bixe. Baweriya me ya wê demê ev bû.

Pratîka îro pêş dikeve jî, hê zêde nîşanî hevalan daye ku em çiqas mafdar in. Aşkere ye ku têkoşîna me ya bi şovenîzma sosyal re em birin welêt. Di heman demê de têkoşîna me ya îdeolojîk, çalakvanî û rêxistinî ya li dijî hêzên hakim ên herêmê, beşên burjuwa, burjuwayên biçûk û feodal û nûnerên wan , em bi gel re kirin yek. Dîsa, vê; hişt ku em ji hin xiyalên (ev ne zêde ne) xwe yên ne li cih ên derbara van dest berdin û rastbûna tesbîtên me yên li ser van were piştrastkirin.

Dema me ji nav şert û mercên neteweya hakim xwe dida aliyekî dihat gotin, *"Ev tiştê tê kirin cudaxwazî ye, zeîfî û parçebûn xistina nav refên proletaryayê ye, li berevajiya entarnasyonalîzma proletarya tevgerîn e."* Dema em hatin vê derê jî hatibû gotin; *"hûn wêlatparêzan parçe dikin, gel bi hev didin qirkirin, hûn gel parçe parçe dikin, hûn cudaxwaz in, hûn li ser ser serê gel bûne belaya herî mezin."* Belê, em di vê mijarê de jî neman şaş. Me dîtibû ku yê vê dibêjin hem li ber pêşketina neteweyê û hem jî li ber pêşketina gel, astenga herî mezin in û me ji encama pratîka gelên cîhanê derxistîbû ku, divê em zora xwe bidin ser van û em ji vê mafdar derketin. Tevî ku heft-heyşt grub in û li pişta wan alîkariyeke madî ya pir zêde mezin û destekeke civakî ya zêde zêde berfireh hebû, me, li dijî hêzên paşverû yên herêmî û li dijî nûnerên wan ên li qada îdeolojîk têkoşîneke bi vî şiklî da û di demeke kurt de ew bi bin xistin û qederekê li pey xwe hiştin. Me kariye bi derbeyên mezin li wan danê, li ser parçeyeke mezin a welêt, qet nebe di qada îdeolojîk de kontrolê çêkin û tesîra xwe nîşan bidin.

Em ê mijara cewhera îdeolojîk a şovenîzma sosyal li vir venekin. Dîsa, em ê li ser cewhera îdeolojiya ku temsîla wê paşverûtiya herêmî dike, nîqaş nekin. Em ê van mijaran hê bêhtir di beşa (bölüm) programê de bigirin dest an jî jixwe, programê di vê

mijarê de nêrînên me yên girtine dest. Em hê zêde hewce dibînin ku van mijaran li wir nîqaş bikin, bigirin dest. Hê zêde, mijara ku em dixwazin bigirin dest, hineke din ji nêz ve dîtina pratîkên ku me li gorî du hedefên girîng ên îdeolojîk pêş xistiye.

Piştî ku me hin tesbîtên teorîk pêş xist û ev kir amûreke têkoşîna îdeolojîk, helbet em di maneyekê de bi yekbûna pratîka li welêt û li welêt bi ji xwe re pratîkek amadekirinê re rû bi rû man. Berevajî, bi sedan sal e ku li welêt zemîneke pê nebawer û durû ku ji aliyê îxanet, elçaxtî, xulamtî û bêslbûnê ve hatibû pêkanîn hebû. Aşkere ye ku ev zemîn wê bi helwest û bi armancên me yên niyetbaş ku bi berjewendîparêziya (çıkarıcılık) gel û welatparêzî re dagirtî ye, nakok bikeve û em ê bi van re bikevin pevçûnên mezin, heta bi berdêla wendahiyên mezin be jî, carcaran bi dijwariyeke zêde be jî em ê biçin ser van. Bi kurtahî, aşkere ye ku li vê herêma ku mirovbûn û welatparêzî nebûye para wê û heya asta herî dawî tarî an jî heya asta herî dawî tijî kelem, dibe ku di aliyê taktîkî de hin şaşitî jî werin kirin û hin têkiliyên zêdegavî (aşırı) û kêliyên bi tirs jî were jiyîn

Di teoriyê de fikreke şoreşgerî avakirin an jî di teoriyê de rêxistinbûnek, têkoşînek avakirin û ev pratîze kirin du qonaxên cuda ne an jî du qadên xebatê yên girîng in. Karîn di teoriyê de Marksîzm afirandin, karîn teoriya Marksîzmê di rastiya welêt de pratîze kirin erk û wezîfeyeke girîng e. Em, zehmetiya vê û giraniya hewldanên di vê mijarê de, gavên di vê mijarê de hatine avêtin di kîjan astê de girîng in înkar nakin. Me, bi tevahî ev nîşan da. Lê belê em bi heman şiklî înkar nakin ku pratîka li welêt wê pir zehmet be û di vê mijarê de astengiyên mezin jî wê derkevin. Her wiha rewşa hevalên pratîk meşandine şahidê vê ye. Hevalên me yên di aliyê teorîk de pir baş pêş ketine, di pratîkê de bi temamî neserkeftî bûn an jî hin hevalên ku di aliyê teorîk de pir zeîf in, karîne serkeftî bin. Gelo sedema vê çi ye? Ev, ji qutbûna ji hev ya teorî-pratîkê an jî ji heman tişt nebûna teorî û pratîkê û ji baş fêmnekirina ev her du

rastiyên ku hev û du tesîr dikin lê du qadên cuda ne, pêş dikeve. Analîzên heya asta dawiyê rast, ji nişka ve nikarin bibin sedem da ku mirov çalakiyên serkeftî yên şoreşgerî bi pêş bixe. Eger tiştên ku pratîk pê hewce ye neyên bicihanîn, tedbîrên ku xebatên pratîk ji me dixwaze, rêxistin û taktîkên destdayî neyên peydakirin, perwerde û pisporiya (uzmanlık) ji bo vî karî neyê afirandin, em ti car nikarin têkoşîna ku ew teorî ferz dike û ji me dixwaze, biafrînin.

Tê fêmkirin ku, bi rastî jî, di pratîkê de lebikîna (emeklemek) hevalên me yên ku di aliyê teorîk de bi hêz in û me di pratîkê de dixe nav zehmetiyên pir mezin, çavkaniya xwe ji vir digire. Ji hevalan bû ku eger di aliyê teorîk de dozek hal kiribin di aliyê pratîkê de jî hal kirine û hin nêrînên di aliyê teorîk de pê bawer in, wê bê rêxistin û bê têkoşîn çêbibin. Ev, bi aliyekî xwe dişibiya rewşa destpêkê ya derketina Marksîzmê. Digotin, *"Em li ser sosyalîzmê biaxifin û fêr bin, ew ê ava be".* Di destpêkê de rewşeke bi vî şiklî hebû. Nezîkbûna yên me jî, tenê bi şiklê "*em pirsgirêka neteweyî fêr bin"* bû, tu dibêjî qey em ê pê xelas bibûna… hin hevalan, jixwe ev îtîraf kirin. Gotin; "*Me digo qey bi pirsgirêka neteweyî baş nîqaşkirinê, li beranberî hêzên cur bi cur baş parastinê, ê şoreş çêbibe."* Heya vê astê hatibûn xistin nav subjektîvîzmê.

Li aliyê din jî, hin hevalan bawer dikirin bi zêde zêde xwe dan pratîkê, bi du-sê çalakiyên çekdarî yên xurt an jî bi çend çalakî kirinê wê karibin li welêt şoreşê bikin. Morala van hevalan jî di astekê de têkçûbû. Yanî ev jî bibûn qurbana xeletiyeke subjektîvîzmê: *"Çima nabe? Me evqas hewl da, canê xwe da, lê hê jî çima şoreş çênebû?"* Van jî fêm nekirin ku ji bo şoreşê, avakirina teoriyeke bihêz û rêxistinbûneke bihêz pêwîst e. Ji wan bû ku wê karibin bi çend pratîkên sînordar, pratîkên ku nikarin pêş xwe bibînin welêt rizgar bikin. Helbet ev hinekê bû sedema bêbawerbûna wan. Aşkere ye ku, eger nikaribin xwe nû bikin an jî eger nekarîne di wexta xwe de de xwe nû bikin, dibe ku ji van qutbûn jî were hêvîkirin.

Heman tişt ji bo şexsên di aliyê teorîk de pêş ketine jî darbasdar e. Eger van hevalan xebatên pratîk ên ji bo rastbûna teoriya wan bi xwe û xebatên pratîze kirina vê teoriyê pêwîst in bi cih neanîbin, fêm nekiribin ku pratîk xebateke pir cuda ya pisporiyê ferz dike; dibe ku morala van jî hinekê têk biçe û ev veguheze bêbaweriyê, heta dibe ku bibe sedema qutbûna van.

Her çiqas kêm be jî, ji ber vê yekê yanî ji ber bi şiklekî qut girtina dest ya teorî û pratîkê an jî ji ber fêmnekirina têkiliya di navbera van her du qadan de, bi qasî ku li gel hin kesan rewşa îxanetê pêş ketiye û pir kêm be jî li gel hin kesan hinekê bêbawerbûn an jî bêmoralî peyda bûye. Ev, bûye sedem ku li gel hin kesan rewşa xwe tevlî nekirinê pêş bikeve lê, hin kes jî bi xwe re pêşketinan çêbikin. Her ku yekbûna teorî-pratîkê bi hevalan xwe da hîskirin, ji ber ku ev heval di aliyê bi şiklekî afirîner fêmkirina Marksîzmê de bi îdîa ne, her ku derfeta ketina bin barê pirsgirêkan û ji wan pirsgirêkan re çareserî peyda kirinê ji bo van hevalan hat dayin, ev heval bihêz bûne û her ku çûye ketine pêvajoya ji têkoşîna li welatê me tê meşandin re rêbertîkirinê. Ev jî, ji bo şexsên ku pirsgirêk rast fêm kirine û ji pirsgirêkê re çareseriya rast peyda kirine bi vî şiklî ye.

Helbet em di vê qadê de jî di nav pêşketineke diyar de ne. Her wiha ji ber ku ji bo me pirsgirêkên bi vî şiklî zêde ne girîng in; divê hûn ji ber her du sedemên ku me niha diyar kirine zêde bi ber bayê van fikran nekevin; *"teorî ji bo çi bi şiklekî baş nehat pratîzekirin?"* an jî "*teoriyê, li gel me di pratîkê de ji ber çi tevgereke rizgariyê ya xurt neafirand?"*. Em dikarin, şaşitiyên şexsên ku bi vî şiklî difikirin û bi vê ferasetê (anlayış) ne bibînin, em dikarin bibînin ku ev hê zêdetir şaşitiyên subjektîf in. Em, sedema vê bi baş fêmnekirina hem ji teorî û hem ji pratîkê an jî ji baş fêmnekirina mijara, gelo teorî û pratîk li ser hev çawa bitesîr dibin ve girêdidin. Tevî vê em dikarin bêjin ku li paş vê, hin motîfên civakî û hin ferasetên (anlayış) burjuwaya biçûk jî hene.

Di vê pêvajoyê de hin tiştên din ên ku pêwîst e werin gotin hene. Ne tenê ji bo yên ku di têkoşînê de neserkeftî bûne û xwe dane goşeyekî, em dikarin di heman wextê de ji bo yên di nava têkoşînê de ne, behsa rewşa bêdengî û aramiyê an jî ji afirêneriyê (yaratıcılık) dûrketinê bikin. Diviyabû dema hat fêmkirin ku kêm zêde fêmkirina teoriya Marksîzmê û ev li ser pirsgirêka neteweyî pêkanînê, nayê maneya li welêt şoreş çêbûye, me hê zêde berê xwe bidana fikreke teorîk a rêkûpêk û fikr û têgînên ku hê bêhtir mercên welêt aşkere dikin. Lê belê li şuna vê, di vê mijarê de hinêkê bêdengbûn, her wiha ji bo hê bihêztirkirina vê teoriyê bi şun de mayina ji pratîka pêwîst, têkiliyên pratîkî zêde bikarneanîn, di nav hevalên me yên grubê de an jî di xebata me ya grubê de, kariyê li hin herêman ji bêdengî û bêhelwestbûnê re rê vebike. Demdirêj an jî demî (geçici) be jî, vê rewşê kariye bibe sedema bêdengiyê. Lê, dibe ku li herêmên ev pirsgirêk baş hatiye fêmkirin û hatiye aşkere kirin pêşketinên bilez çêbibin. Tê fêmkirin ku, divê em sedema di cihekî de zêde pêşketinê û di cihekî de bêdengmayinê li vir lê bigerin.

Hevalên berpirsiyariya wan a teorîk û pratîkî heye û şexsên berpirsiyar, ji ber ku nekarîne vê girêdanê baş fêm bikin, ji ber ku nekarîne li herêmên xwe û di nav grubên xwe yên herêmî de bi şiklekî biquwet vê temsîl bikin, di asteke diyar de ji pêşneketinekê re rê vekirine. Lê, hevalên ku ev girêdan baş dîtine jî li herêmên xwe pêşketineke xurt çêkirine. Yanî maneya vê ev e; hevalên ku neketine şaşitiya sûbjektîvîzmê û çi qada teorîk be çi jî qada pratîkî be bi israr bi ser zehmetiyên mercên têkoşînê de çûne, karîne pêşketinan çêbikin û di têkoşîna me gihandina van rojan de ked û destek dayine.

Îro, têkoşîna me, bi taybetî di qada îdeolojîk de wezîfeyên girîng bi ser xistine. Di qada îdeolojîk de bi misogerî şovenîzma sosyal hatiye teşhîrkirin, şoreşgeriya neteweya hakim jî hatiye xistin rewşek ku bi qasî berê nayê naskirin. Nêrînên reformîst lîberal ên

ku çavkaniya xwe ji paşverûtiya herêmî digirin, têra xwe hatine teşhîrkirin û mirov ji bo van jî dikare bêje heya asteke diyar hatine bibinxistin. Ji ber vê yekê hineke din neçar mayine da ku berê xwe bidin Marksîzmê. Yanî, ev jî bûye sedem ku oportonîzmên xwe yên kevin ên çors (kaba) hineke din ziravtir bikin û bi şiklên cuda derxin pêşberî me. Helbet ev rewş di têkoşîna me ya îdeolojîk de erk û wezîfeyên nû dide ser milê me. Têkoşîna ku em ê li dijî şiklên oportonîzmên hê ziravtir bûne bidin, wê biawayê ku em ê di aliyê rêbazên çors ên têkoşînê de, di îdeolojî û rê û rêbazên têkoşînê de hin guherînên şiklî bikin û têkoşînê bimeşînin bibe; divê ev jî bi misogerî bi lêkolînkirinê bibe (ez di maneya lêkolînkirinê û rêxistinbûneke merkezî de dibêjim); vê têkoşînê wezîfeyeke wiha daye ser milê me ye ku em têkoşînê ne bi rêbazê çors, bi rêbazên moderntir û bi awayê têkoşîna îdeolojîk û bi rê û rêbazên modern şer bikin.

Wezîfeyên îdeolojîk ên li dijî şovenîzma sosyal û têkoşîn di vê demê de jî neqediyane. Her wiha, têkoşîna me ya li dijî beşên burjuwaziya reformist û berdevkên burjuwaziyê jî neqediyaye. Dîsa, rêgezên (ilke) me yên pratîkî yên li dijî van neqediyane(di pratîkê de heya bi pêşxistina şerê çekdarî), hin şiklên têkoşînê yên ku em ê pêş bixin hene û divê em di van mercan de lê bigerin û van peyda bikin. Divê em li şuna rêbazên kevin ên têkoşînê, rêbazên nû yên têkoşînê pêş bixin û li şuna ku em li şiklên kevin ên oportonîzmê bigerin, pêwîst e em li şiklên nû yên oportonîzmê bigerin û lêkolîn bikin. Weke min gotiye, di şert û mercên îro hê pêşketî de wezîfeyên me yên îdeolojîk wê derkevin meydanê. Girîng e; serkeftina me ya di vê qada îdeolojîk de girîng e. Grubên ku em li dijî wan têkoşîn didin û me ew bi bin xistine, ji nû ve bi şiklên cuda, bi şiklên nû yên oportonîst derdikevin pêşberî me. Ev bûyereke girîng e. Divê karibe ev bi misogerî were dîtin û li dijî van şiklên nû, rêbazên me yên nû yên têkoşînê jî were fêmkirin. Divê heval karibin pêşniyar û nêrînên xwe yên di vê mijarê de pêşkeş bikin.

Di encama van hemû têkoşînên me yên îdeolojîk de, ya rast em di derbara cîhanê de gihîştin nêrîneke hê saxlem û ji bo ketina welêt jî em hatin li ber deriyên hê saxlem. Her ku nêrînên me pêşde çûn, di qada siyasî, îdeolojîk û her ku diçe di qada rêxistinî de wezîfeyên me yên hê zelal derketin holê. Di vê pêvajoyê de di netîce û encama têkoşîna ku me di qada îdeolojîk de daye, me cîhaneke çawa analîz kir, me karîbû cîhanê çawa bibînin, me karîbû rewşa li cîhanê çawa têbigihîjin?

Eger bi baldarî lê were nêrîn, me di vê mijarê de pêşketin û guherînên girîng pêk aniye. Me, destpêkê bi şiklekî feodal cîhan fêm dikir. Em ji bîr nekin ku dema em zarok bûn têgihîştina me ya cîhanê bi temamî bi şiklê îslam-gawur bû, her ku em pêş ketin feraseteke me ya bi şiklê burjuwaziya biçûk çêbû. Yanî dihat gotin, '*her tişt Tirkiye ye*' an jî '*Tirk, neteweya herî mezin a cîhanê ye*'. Na, ev ne bi vî şiklî ye. Ji ber ku em di vê çarçoveya îdeolojîk de pêş ketibûn me nedikaribû derdora xwe û cîhanê bibînin, baweriya me pê nebû ku cîhanên cuda hebin û gelên cuda jî karibin pêş bikevin. Her tiştê li pêşiya me, ji aliyê burjuwaziyê ve hatibû diyarkirin. Ji beriya ku em bi Marxîzmê re têkilî çêbikin nêrînên me yên li cîhanê, ferasetên (anlayış) me ev bûn.

Eger hûn bala xwe bidinê, me raserbûna (üstünlük) Rojava û cîhana kapîtalîst piştre qebûl kiribû. Di pêvajoyên ku me hê sosyalîzm baş nas nedikir de, her ku agahî û zanistên me di asteke diyar de hineke din pêş ketin, me qada kapîtalîst û qada emperyalîst (NATO, Ewrûpa) quweta herî mezin a her tiştî didît û xwe jî, weke civatên di asta herî dawî de bêquwet, paşde mayî, bêşikil didît. Ji ber şertûmercên navxweyî, jiyîna komplekseke, û quweta dijmin pir zêde mezin dîtin hebû. Van hemûyan li gel me kesayetî ji holê rakiribû, kesayetiya neteweyî nemabû, kesayetiyek ku em karibin di asta takekesî (birey) de jî biparêzin û qebûl bikin nebû. Ji bo ku em bi temamî ji raboriya (geçmiş) xwe birevin, ji şertûmercên xwe yên herêmî birevin û ser bêkesayetiyê

binuxumînin, ketina şiklên sexte hebû. Û her wiha bi vî şiklî, em ketibûn ser riya ji emperyalîzm û mêtingeriyê re bûn maşayê.

Lê belê me bi vê rewşê, qîma xwe neanî, me ev nêrînên li cîhanê bes nedîtin. Me bawerî û hêviya xwe ya ji bo hebûna cîhanên cuda parast. Ya rast, me wê demê fêm kir ku; divê em xwe bi taybetî di qada zanistê de hineke din pêş bixin an jî di zanistê de, bi taybetî di zanistên civakî de pêş bikevin. Ji ber aşkere bû ku; ji bo bendewariyên me yên mirovahiyê û civatên gel ên ku em ji nav hatine em ê nikaribin ti tiştî bi dest bixin. Vaye van hemûyan berê me da zanistê, û bi taybetî jî zanista civakî. Van hemûyan berê me da ku? Da nêrîneke (feraset) serdemê. Di pêvajoya van hemû pêşketinan de me nêrîna xwe ya li serdemê, hineke din berbiçav (somut) kir û hineke din li gorî rastiyê sererast kir.

Ev jî, hê zêde di programê de hatiye diyarkirin. Di pêşnûmeya (taslak) programê de nêrîna me ya li ser serdemê û pêşketina şaristaniyê ya ku ev serdem xwe dispêrê, hatiye vegotin. Dîsa, mijarên wek, îro di serdemeke wiha de ku di nav pêvajoya şaristaniya ku ev serdem xwe dispêrê de weke welat û weke gelekî hebûna me li ku derê dest pê kiriye, di nava pêvajoyên dîrokî de çawa pêş ketiye hatiye daxistin meydanê. Hewl hatiye dayin, were diyarkirin ku ka di roja me ya îro de jî cihê me çi ye û em li dijî kîjan çewisandinên (baskı) dawî yên siyasî û aborî disekinin.

Ez ê dîsa fikrên xwe yên li ser vê mijarê hê zêde di wê beşê de vebêjim an jî di cih de dibînim ku di derbara programê de bi kurtahî çarçoveyê bidim, lê belê ez ê bi berfirehî jî li wir vebikim. Ez difikirim ku vê, ji wê mijarê re bihêlim. Dîsa, nêrîna li ser cîhanê û di nav vê de şîroveya me ya li ser welêt, erk û wezîfeyên siyasî, îdeolojîk û hê zêdetir rêxistinî yên ku van daye ser milê me, em ê di beşa rêziknameyê (tüzük) de bidin pêş. Em difikirin ku dema li ser rêgezên rêziknameyê tê axifîn em qala wezîfe û erkên rêxistinî bikin. Wezîfe û erkên me yên siyasî jî, eger beşa programa nû ya erk û wezîfeyên me di ber çav re were derbaskirin, bi şiklê hin

rêzikan(madde) li wir hatiye pêşxistin. Dema em van zelal dikin, em dikarin erk û wezîfeyên xwe yên siyasî aşkere bikin.

Em di cih de dibînin da ku li vir, ev qasê bînin ziman: di derbara serdema me de îro hin fikrên balkêş pêş ketine. Di vê mijarê de bi taybetî di demên dawî de bi têgînên weke 'cîhana sêyemîn, 'welatên bê blok', 'welatên kêm pêşketî', 'welatên di pêvajoya pêşketinê de' hewl didin cîhanê bixapînin. Divê, durûtiya van têgînan were fêmkirin. Ya rast, divê em zanibin ev têgîn tên derxistin da ku têkoşînên rizgariya gelan ji bingehên xwe yên rast werin dûrxistin û li armancên sexte werin girêdan; derfetên ketxwariya emperyalîzmê werin zêdetirkirin û zilm û zora emperyalîzmê were veşartin. Şovenîzma bûn dewleta mezin, berjewendiya emperyalîzmê, neteweperestî, dibe sedem da ku cîhan bi şiklê 'welatên bê blok', 'welatên kêm pêşketî', welatên li ser riya pêşketinê' û 'sererastkirinên aborî yên nû' were analîzkirin. Lê ji bo serxwebûn, demokrasî û sosyalîzma di berjewendiya gelan de ye ev ti tiştî nabêjin. Dibe ku ev şiklên nêrînên li ser cîhanê, nêrînên emperyalîzmê û bi taybetî nêrînên revîzyonîstên li welatên emperyalîst û hem jî li welatên ku li dijî emperyalîzmê têkoşîn dikin bin. Dibe ku ev nêrîn, li welatên din ên ku di navberê de mane, hê bêhtir jî nêrînên burjuwaziya wan welatan, ku bi taybetî ên îdîa dikirin burjuwayên neteweyî ne, hêzên burjuwazî ku dixwestin di pîşesaziyê (sanayi) de pêngaveke nû biavêjin û rewşenbîrên berdevkiya van hêzan dikirin bin.

Têkîliya van nêrînan, bi misogerî ne bi enternasyonalîzma cîhanî ya proletaryayê re, ne bi têkoşîna azadî û demokrasiyê ya gelan re nîne. Bi taybetî di dema Lenîn de, di dema Stalîn de têgînên bi vî şiklî nebûn. Cîhan, ku bi şiklekî şoreşgerî bi Yekîtiya Sovyetên Sosyalîst ketibû pêvajoya sosyalîzmê û bi şiklê welatên emperyalîst ku li dijî wê tifaqeke pîroz ava kiribû, bibû du blok. Welatên sosyalîst li aliyekî bi tevgerên karkerên welatên emperyalîst re tifaqên xurt pêş xistibûn û li aliyê din bi têkoşînên

rizgariya çînî ya gelên mêtingehan re tifaqeke xurt ava kiribûn. Û hema bêje weke yek cepheyî, li dijî hêzên emperyalîst şer dikirin. Ev cephe ku di merkeza wê de Yekîtiya Sovyetan hebû û li aliyekî ji tevgerên çînên karker yên cîhanê û li aliyê din ji tevgerên rizgariya neteweyî ya mêtingehan pêk dihat, bi taybetî bi Şoreşa Cotmehê re pêş ket. Dema ku li Sovyetan avabûna sosyalîzmê pêş ket, ev cephe hê jî qeyimtir bû. Bi pêşketina vî cepheyê re, em bûn şahidê pêşketinên bi vî şiklî; di şerê cîhanê yê duyemîn ê emperyalîst de kampa emperyalîst bi binkeftineke mezin re rû bi rû ma, li cîhanê hejmara welatên sosyalîst hê jî zêde bû, tevgerên çîna karker ên cîhanê û tevgerên rizgariyê yên neteweyî li ser esasên pêşketina kampeke sosyalist ku di merkezê de Yekîtiya Sovyetan hebû hê jî zêde pêş ketin.

Ev eniya ku ji beriya şer bi taybetî ji aliyê Enternasyola 3. ve hatiye pêkanîn, kariye di şerê cîhanê yê 2. de mînakên heya asta dawî erênî nîşan bide. Vê ferasetê, li dijî kampa faşîst, eniya demokrasî û rizgariya neteweyî biriye serkeftinê û ji bo beşeke mezin a gelên cîhanê serxwebûn û azadî aniye. Di serdemeke wiha de li aliyekî dikaribû di navbera emperyalîzm û burjuwayên hevkar ên welatên cur bi cur de tifaq werin çêkirin an jî di navbera hêzên herêmî de hin tifaqên herêmî (emperyalîst û nokerên wan dihatin gel hev bi hev re kampek pêk dianîn; mînak Cemiyetî Aqwam a hevgirtî) werin çêkirin. Li aliyê din jî, li dijî vê, bi pêşengiya Sovyetan, di pêşengiya Stalîn de jî eniya (cephe) hevgirtî ya gelên cîhanê hatibû çêkirin. Û weke ku min niha got, vê, bi serkeftin qezenckirina di Şerê Emperyalîst ê Duyemîn de, piştrast kiriye ku nêrîn û feraseteke serdemê ya di çi astê de rast e. Lenînê ku yek ji hostayên sosyalîzmê ye Analîzên wî yên li ser emperyalîzmê û nêrînên wî yên li ser pirsgirêka neteweyî di salên 1914 û 1916’yan de digihîne asteke berbiçav (şênber). Ev sal, derbara pêşketineke bi vî şiklî an jî blokbûneke bi vî şiklî agahî didin. Ev blokbûn bi Şoreşa Cotmehê re ji bûn diyardeyeke (olgu) teorîk derdikeve, her ku diçe

di pratîkê de berbiçav dibe: Bi pêşketina avakirina sosyalîzmê ya li Sovyetê jî, karîbû bibe rastiyek ku her kes dikare bibîne. Her wiha piştî Şerê Emperyalîst ê Duyemîn, bi serkeftina sosyalîzmê, tevgerên rizgariya neteweyî û demokrasiyê re şiklekî serdemê yê ku êdî kesek nikaribe înkar bike derket meydanê. Me dît ku; fikrên ji aliyê hostayan ve bi salan e wek teorî hatine pêşxistin di pratîkê de jî mane û wateya xwe dibînin û êdî bloka emperyalîst ji bo karibe li ser piyan bisekine bi temamî ketiye pêvajoya paşde kişan û hin sererastkirinên nû, lê li aliyê din têkoşîna gelên cîhanê û bi taybetî tevgerên rizgariya neteweyî li ser vê esasê pir mezin dibin. Ti aliyê neyê fêmkirin ê serdemeke bi vî şiklî nîne. An jî ne mimkûn e da ku, ev, bi çend nêrînên durû yên li ser serdemê ve werin guherîn.

Rewşa cîhanê ku hostayan bi şiklekî heya asta dawî zelal raxistine meydanê, têkoşîna rizgariyê ya gelên cihanê ku li ser bingeha van nêrînên teorîk ên saxlem gihîştiye astên herî bilind, kariye li gel her kesê ku hinekê xwesteka wê/î ya fêmkirina cîhanê heyî û di fêmkirinê de rast tevdigere, her kesê ku hinekê eleqe û sempatî nîşanî têkoşîna rizgariyê ya cîhanê dide nêrîneke diyar a fêmkirina serdemê çêbike. Serdemeke bi vî şiklî, bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê I. ji bo beşeke mezin a gelên cîhanê, tenê ji bûn pirsgirêkeke teorîk derketiye, hatiye warê pirsgirêkeke rizgariya madî û di vê qadê de gelên cîhanê mînakên mezîn ên têkoşînê dayine. Ev, di heman wextê de bûye sedem da ku gelên cîhanê bi şiklekî acîl rêxistinên rizgariyê yên neteweyî pêş bixin. Em dibêjin vê nîşan daye ku; bêyî bi derketina şerekî nû pêwîstî bibîne û xwe li hêviya lidarxistin enternasyoneleke komînîst bigire, gelek çiqas weke me şêniya wî kêm dibe bila bibe û di aliyê aborî de kêm derfet dibe bila bibe û amûrên wî yên hilberînê çendi paşdemayî dibin bila bibin, bêyî ku li van hemûyan binêre, bêyî ku li hêviya şerekî cîhanê ye nû bimîne, destpêkirina têkoşînê ya vî geli, di vê serdemê de şert û mercên destdayî yên navneteweyî û bingehên

madî yên serkeftinê pêk tîne û ti mercên pêş û asteng, nikarin pêşiya têkoşîneke rizgariyê ya bi vî şiklî bigirin.

Dema ev rewş bi vî şiklî pêş dikeve, avakirina sosoyalîzmê ji aliyê gelên cîhanê ve bi taybetî jî li gorî nêrînên rêberên mezîn ên sosyalîzmê, ev weke mînakekê pêşkeşî gelên cîhanê kirin, ji aliyê gelên cîhanê ve avakirina tevgerên cepheyê yên yekgirtî û bi tesîr, aşkere ye ku wê bibe sedem ku emperyalist û hevkarên wan serî li sererastkirinên nû bidin, û wê ev jî, destpêkê di qada îdeolojîk de were destpêkirin. Divê, îro, evqas zêdebûna van nêrînên li serdemê û ji aliyê van nêrînan ve di asteke cidî de hatin astengkirina şoreşên gelên cîhanê weke tesaduf neyê dîtin. Divê hê bêhtir di naveroka roja me de li sedemên vê were gerîn. Dibe ku di asta revîzyonîst, emperyalîst an jî neteweperst de be, ji bo ku rewşên îro yên îdeolojiyên bi vî şiklî were fêmkirin, di zanîna rewşa îro ya cîhanê de sûdeke mezin heye. Pêwîst e gelek heval, rewşa îro ya cîhanê ku wan matmayî dihêle û nêrîna gelek hevalan jî tarî dike, bibînin û di mercên îdeolojîk ên tevlîhev ku bi taybetî cîhanê berevajî nîşan didin de, ji bo ku riyên xwe ronî bikin û bimeşin li rewşa cîhanê ya îro baş binêrin.

Cîhana îro cîhaneke çawa ye? Belê, cîhana îro, ya rast ji cîhana ku hostayan ji Şoreşa Cotmehê vir de, yanî ji cîhana ku ji aliyê Lenîn ve hatiye analîzkirin-pêşdîtin ne cudatir e. Serdema me serdemek wiha ye ku; emperyalîzm hebûna xwe berdewam dike, girêdayî bi emperyalîzmê re çewisîna neteweyî bi şiklên cuda tên meşandin; dîsa avakirina girêdayî bi Şoreşa Cotmehê re pêş dikeve û xurt dibe, li ser bingehên avabûna sosyalîst tevgerên rizgariya neteweyî û tevgerên çîna karkeran pêş dikevin. Sosyalîzmê cepheyên ku bi dest xistine wenda nekiriye, cepheyên îro weke bûyî diparêze. Belê, îro li van cepheyan hin tevgerên xêrnexwaz hene; dibe ku em rastî hin helwestên xêrnexwaz, oportunîst, sextekar werin. Em nikarin înkar bikin ku, gelên cîhanê, tevgerên rizgariya neteweyî û tevgerên çînên karker bi şiklê ku welatên sosyalîst di merkezê de cih bigirin

bi girêdaneke xurt li hev hatine girêdan, (dibe ku ev girêdan ne organîze bin, divê em vê ji bîr nekin, dibe ku weke cepheyek ku rasterast an jî enternasyonalek rasterast nehatibin gel hev), weke rastiyek ku tê jiyîn li dijî emperyalîzmê piştgirî didin hev, û li dijî zilm û zor û dagirkeriya burjuwazî di astekê diyar de dibin asteng. Rêveberên van welatan bi emperyalîzmê re çendî têkilî datînin bila daynin, bi wan re çendî bi şiklê noker têkilî pêş dixin bila pêş bixin, dîsa jî hevgirtineke wiha ya têkiliya madî (berbiçav) heye an jî rewşa gelên cîhanê ya li dijî emperyalîzma îro vê nîşan dide

Gumana me ne ev e; tevî pêşketina evqas tevgerên rizgariya neteweyî, evqas destkeftên tevgerên çînên karker û li cîhanek ku di avakirina sosyalîzmê de evqas xurtbûyî, em ê paşde bizivirin û dubare li serdemek ku emperyalîzm bilind dibe û dîktatoriya xwe li cîhanê ava dike vegerin an jî wê serdemek bi vî şiklî ji nû ve were afirandin. Baweriya me bi vê nîne. Em, feraseteke (anlayış) bi vî şiklî, li dijî nêrîna me ya cîhanê û li dijî Marksîzm û Lenînîzmê dibînin. Em xwediyê nêrîneke (anlayış-yorum) dîrokî an jî nêrîna materyalîzma dîrokî ne ku dibêje; *Dibe ku di dîrokê de dîktatoriyên demkurt werin avakirin, pêşketina dîrokî weke tevgera li ser xeteke rast nabe, dibe ku carcaran paşde biçe, lê belê ev paşde çûyîn ji bo ku bi lezeke hê zêde pêşde çûyîn çêbe pêk tê.* Dîsa, *"dibe ku di dîrokê de di hin serdeman de sekinînek çêbe, lê belê dibe ku ji vê sekinîn û aramiyê tovên cîhaneke nû derkevin. Armanca paşde vegerê an jî weke şidandina yayekî hinekê vekişînê, ji bo ku bi misogerî ber bi pêşve pêngaveke mezin were avêtine. Dibe ku di rewşa tê hesibandin ku sekinî aram e de jî, hin hêzên ku tovên nû ne derkevin holê"*, yanî em xwediyê nêrîneke dîrokî an jî feraseta materyalîzma dîrokî ne ku dibêje, di rewşa sekinî û aramiyê de quwetên nû pêk tên û ev quwetên nû, rewşa kevin a aramiyê qat bi qat derbas dikin. Ji dema ku em ferî Marksîzmê bûn pê de, em fêrî vê nêrînê bûn û em vê weke bûyî diparêzin.

Di serdema me de bi taybetî hin nêrîn hene ku dibêjin; *"teknolojî pir pêş ketiye, her roj şiklên cuda yên bombeya atomê tên pêşxistin û cîhana me bi tehlûkeya bombeyên atom, hîdrojen, nîtrojen, notron re rû be rû ye û ji ber vê sedemê jî, divê gelên cîhanê jî di cihê xwe de rehet bisekinin"*. Cuda ji vê li NY'ê her roj sererastkirinên nû tên nîqaşkirin û li gorî van sererastkirinan tê gotin ku wê *"hineke din zêde bertîl û derfetbidin gelan"*. Em dibînin ku ev jî, ji aliyê endamên cuda yên dewletê ve, ji aliyê serokwezîran ve, ji aliyê her şiklê zanyarên burjuwazî ve bi şiklekî cidî tê nîqaşkirin. Dema em li bejn û bala wan û axaftinên wan dinêrin, em dibêjin qey bi rastî jî dixwazin hin sozan bidin gelan an jî dixwazin van sozên xwe pêk bînin. Ev hemû jî tiştên virt û vala ne, nêrînên bêbingeh in. Tiştekî ku gelên cîhanê ji van hêvî bikin, nîne. Zanyarên burjuwazî qasî ji destên wan tê û dikarin, derbara sîstemên nû, derbara "cîhanên kêm pêşketî, yên di rewşa pêşketinê de ne û cîhanên duyemîn, cîhanên sêyemîn" bila li zankoyan nêrîn pêş bixin, pirtûk binivîsin, di vê mijarê de sererastkirinên siyasî, rêxistinên siyasî çêbikin, ti qezenc an jî feydeya ku ev hewldan bidin gelên cîhanê nîne. Nikarin ji gelên cîhanê li benda ti alîkariyên berbiçav bin. Weke min niha got, ji bo gelên cîhanê ya diyarker (belirleyici) ew e ku, bêyî ku li benda şerekî nû bisekinin, bêyî ku li kêm an jî zêdebûn û nû an jî kevinbûna hêza xwe binêrin di cih de dest bi pêvajoya şerê rizgariyê kirin e. Serdem, serdemeke wiha ye. Serdema me ji me re dibêje, divê gelên cîhanê timî ber bi rizgariyê ve têbikoşin. Ev serdem jî, weke serdemên berê serdemeke hê xurtir a xelasiyê ye

Di dîroka cîhanê de, ji bo gelên cîhanê, pêvajoyek ku şert û mercên wê evqas destdayî bûye nayê bîra me. Ji bo gelên cîhanê di ti pêvajoyan de şertûmercên evqas destdayî nekariye werin gel hev. Bi taybetî ji bo xelasbûna ji bindestiya neteweyî bi qasî îro di ti pêvajoyan de şert û mercên destdayî derneketine meydanê. Heta dema ku nêrînên Lenîn pir baş werin fêmkirin, tê dîtin; wî, pêvajoya

çûna sosyalîzmê jî bi kûrahî bi têkoşînên rizgariya gelan ku îro tên dayin ve giradayî bû. Ji bo ku welatekî sosyalîst hebe, hewceye tevgerên çîna karker hebin. Em vê înkar nakin, lê riya ku diçe cîhaneke sosyalîst bi giranî di têkoşîna îro li dijî emperyalîzmê tê dayîn re derbas dibe. Em vê jî, ji nedîtî ve nayên. Em dikarin ji cewhera nêrînên Lenîn vê derxin; li tevahiya cîhanê temamkirina avakirina sîstema sosyalîst, hê bêhtir bi şerên di cepheyan de li dijî emperyalîzmê werin meşandin dibe.

Di têkoşîna ku gelên bindest ên mêtingeh û mêtingehên nû li dijî emperyalîzmê bidin de, bi giranî avakirina sosyalîzmê esas e an jî ev tevger li ser bingeha avakirina sosyalîzmê bilind dibin. Divê çînên karkeran jî hebin lê bi giranî pirsgirêka serdem û roja me ya herî giring a herî acîl ku sosyalîzmê nêzîk bike û sosyalîzmê di asta cîhanî de bike realîteyekê, ev têkoşîna rizgariyê ya van gelan e. Hê bêhtir, ev ê encamê diyar bikin. Ev têkoşîn wê diyar bikin da ku sosyalîzm di asta cîhanî de bibe realîteyekê. Lê, li ser kîjan esasî? Li ser esasê pêşketina welatên sosyalîst, li ser bingeha ku tevgerên çînî yên karkeran hebûna xwe berdewam bikin Têkoşîna gelan bi giranî li ser van esasan, wê serdema me ji bûn serdema emperyalîzm û şoreşên proletar derxe û bike serdema avabûna sîstema sosyalîst. Lê belê divê em derbara vê serdemê de jî, ne bikevin nava xiyalên bê esil û ne jî pir dûrî feraseteke bi vî şiklî bin û bê bawer bimînin.

Bi qasî ku em ji hostayên afirîner ên Marksîzmê fêr bûne, bi qasî ku me ji pêvajoya pêşketina têkoşînên serdemê fêm kiriye, eger cepheya rizgariyê ya gelên cîhanê ji aliyê oportunîst û revîzyonîstan ve neyê astengkirin; ev erk û wezîfe, ne wezîfeyek ku di pêvajoyeke dîrokî ya ewqes dirêj de pêk were û dibe ku ji pêvajoya ku burjuwazîyê li dijî feodalîzmê serkeftin bi dest xistiye hê kurtir bibe. Şoreşa cîhanê di demên destpêkê de (helbet, girêdayî bi serdema rekabetê re) dibe ku weke realîteyek ku di nava salekê de pêk were xuya dikir. Digotin; *"Eger em karibin li Ewrûpayê,*

*burjuwazî têkbibin û paşê jî kelheyên wan ên li wir bi dest bixin, em dikarin şoreşê heya mêtingehan jî berfireh bikin. Em dikarin alîkariya teknolojîk, alîkariya çandî (kültürel) bikin û sosyalîzmê bibin wan deveran jî."* Belê, difikirîn ku di demeke hê kurtir de xwe bigihînin cîhaneke sosyalîst.

Lenîn, di serdema emperyalîst de ev feraset û nêrîn hineke din guhert û li gorî serdema emperyalîst sererast kir. Li gorî wî, dibe ku têkoşîna li dijî emperyalîzmê hê di cih de be û hewce bû ku gelek têkoşînên rizgariyê yên neteweyî werin dayin. Tenê. Dikare bi hevkariya tevgerên rizgariyê, welatên sosyalîst û tevgerên çîna karkeran, sîstema sosyalîst were avakirin. Ew jî difikirî ku, mînak di salên 1920'an de, li Ewrûpayê wê şoreşek çêbe û ev şoreşa Ewrûpayê dikare bibe bingeheke şoreşa cîhanê an jî wê şoreşa cîhanê di salên 1920'an de di asteke girîng de pêk were û wê di vê mijarê de qonaxeke girîng were derbaskirin. Her wiha di Stalîn de jî bi heman şiklî ye. Li gel Stalîn li ser dirêjbûna temenê emperyalîzmê, hê jî zêdetir li ser mijara hemû welatên sosyalîst wê paşde vegerin û wê ji nû ve serdema emperyalîst bilind be de fikreke herî biçûk jî nîne. Wek antî-emperyalîstekî rast û durust, bawer dikir ku; bi hişyarî û têkoşîna timî ya gelan li dijî emperyalîzmê, di pêşengiya partiyên proletaryayê de bi rabûna şoreşên mêtingehan û bi alîkariya aktîf a Sovyetan, dikare temenê emperyalîzmê pir were kurtkirin, mînak dikare di sed salan de, di pênce salan de emperyalîzm ji hev bikeve. Belê, yên ku van nêrînan diparêzin, ew hosta ne ku hem di aliyê teorîk de û hem jî di aliyê pratîkî de ji têkoşîna gelan re rê vekirine.

Baş e, me ji vê bi şunde çi dît? Ji vê bi şunde, hema bêje em bi gelek gotinên vala yên weke; *'wê emperyalîzm ji gelên cîhanê re dubare aştî bîne,* wê bi sîstemên nû yên ekonomîk derfetên nû yên pêşketinê bide gelên cîhanê' re rû bi rû man. Helbet ji ber ku ev hemû nêrîn hinekê bitesîr bûn, di cepheyê rizgariya gelên cîhanê de di asteke diyar de di cihê xwe de sekinîn û aramiyek an jî parçebûnek ket nav van cepheyan, vê rewşa bê hêvîbûnê, di nav refên komunîst de parçebûnek çêkir û her ku çû asta têkoşînên rizgariyê

ket û …. Belê, me karîbû van encaman bibînin. Di panzde-bîst salên dawî de ev bûyer hatin jiyîn; emperyalîzmê xwe ji nav de restore kir; bi taybetî bi pêşengiya Amerîkayê, emperyalîzma cîhanî dubare kapîtalîzm restore kir, dagirkeriya nû pêş xist, rêxistinbûnên leşkerî yên yekgirtî û rêxistinbûnên ekonomîk afirand. Mînak rêxistinên weke, IMF, CE (Civata Ekonomîk A Ewrûpa) NATO, CENTO, SEATO û hwd. Hem di aliyê ekonomîk de, hem di aliyê polîtîk de û hem jî di aliyê leşkerî de derketina holê ya van rêxistinan, bi misogerî tê maneya bi pêşengiya DYE'ê xwe restore kirina Emperyalîzmê. Bi xwe restorekirinê re êrîşek ku li dijî tevgera sosyalîst a cîhanê dest pê kiriye jî heye, ev jî nayê înkarkirin.

Di encama van hemûyan de, ji ber ku di asta cîhanê de hê jî kapîtalîzm xurt e û quweta xwe di asteke girîng de diparêze, li welatên sosyalîst bi taybetî di pêkhateya (yapı) jor de feraset (anlayış), tore û taybetmendiyên mirov, ku ji civaka kevin mayine hebûna xwe didomînin, dîsa li welatên sosyalîst di pêvajoya avakirina sosyalîzmê de çêbûna hin şaşitiyên burokratîk, bûne sedem ku di nav tevgera komunîst a cîhanê de, hem li welatên sosyalîst û hem jî di partiyên komunîst ên ku şoreş li dar nexistî yên welatên şoreş pêkneanîne de, di mijarên weke 'li gorî enternasyonalîzma proletaryayê alîkariya gelên cîhanê kirinê' de û her ku diçe di mijara 'gelo divê li beramberê emperyalîzmê, welatên sosyalîst çawa werin girtindest' de hin nêrînên dikare weke nêrînên revîzyonîst werin binavkirin û ji derveyê Marksîzmê werin nirxandin, derkevin meydanê. Îro, em dikarin di asta cîhanî de behsa aktîfbûna van nêrînan jî bikin. Em dikarin di vê derbarê de wiha bêjin; tevgera şoregerî ya cîhanî, li dijî emperyalîzma cîhanî û bi taybetî jî li dijî hemû bermayiyên (kalıntı) cîhana kevin bi lez pêş diket weke ku ji ber vê leza xwe ya mezin hinekê hêjiya be an jî ev leza zêde, bûyîbe sedem ku bikeve nav hin çal û kortên li hawîrdorê. Niha hêjandina vê tê jiyîn an jî ev hêjandinên şoreşa cîhanî, li gorî xweseriya mercên her welatî tê jiyîn.

## Programa Partiyê

Burjuwaziya Tirk li aliyekî di nav dilê feodalîzmê de xwe ava dike, feodalîzm jî li aliyê din bi taybetî di nav amûra dewletê de ji xwe re cih amade dike û li aliyê din jî li gel rê û rêbazên mêtingeriya feodal rê û rêbazên dagiriyê yên kapîtalîzmê jî qebûl dike. Van hemû rêbazan tevlihev dike, bi şiklekî têkilhev, bi ser de jî weke ku sîstema çewisandinê (baskı) ya feodal a çar sed-penc sed sal berê têrê nekiribe bi hemû çekên kapîtalîzma modern xwe xemilandiye, hê jî kûr kiriye û pêş xistiye û dest bi pratîkeke çewisînê kiriye. Ya rast program bi vê jî nemaye; hê jî zêdetir bi kûrahî bingehên dîrokî lêkolîn kiriye. Çewisandinên di serdema feodal de tenê di aliyê burjuwaziya Tirk de negirtiye dest, hewl daye fêm bike ku di şikil girtina pêkhateya (yapı) Kurdistana îro de bandora feodalîzma Ereb çi ye. Kariye di vê mijarê de jî delîlên têrker (doyurucu) û yên baweriyê bidê pêş. Bi vê jî qîma xwe neaniye, hewl daye mijarên weke; di serdema koledar de çêbûna qebîleyên Kurd, bûn eşîr û li ser axên îro bi cihbûna Kurdan bide fêmkirin. Di van xebatan hemûyan de hewl daye bi sosyalîzma zanistî ve girêdayî bimîne.

Dibe ku ev hemû, weke agahî û zanisteke zêde xuya bin, lê ne wiha ye. Ji bo fêmkirina çewisandina feodal, serdem hatiye xistin ber lêpirsînê û ji bo fêmkirina çewisîna ku di serdema feodal de hatiye pêşxistin –bi taybetî ji ber ku hê jî li Kurdistanê feodalîzm bi şiklekî kûr tê jiyîn- û ji bo fêmkirina serdema îro, fêmkirina sîstema çewisandinê ya li ser neteweyê jî, hewldan hatiye dayin ku bi fêmkirina hemû taybetmendiyên serdema feodal di dîroka Kurdistanê de hemû diyardeyên (olgu) li Kurdistanê werin fêmkirin.

Programê ku xebata xwe bi vî şiklî berdewam dike, weke me gotiye piştî şerê Emperyalîst ê I. hemû giraniya xwe daye ser ji nû ve parvekirina Kurdistanê. Ji ber ya ku roja me ya îro ji herî nêz ve eleqadar dike an jî di şikilgirtina Kurdistana îro de bandoreke diyarker (belirleyici) kiriye, ne çewisandina ku di pêvajoya dagiriya Ereban de hatiye pêşxistin û şiklên çewisandinên feodal, şiklên

çanda feodal e. Statuya Kurdistana îro, hê bêhtir piştî Şerê Emperyalîst (dîsa di heman pêvajoyê de bi misogerî zilm û zora siltanên Tirk tesîr lê kiriye, di çêbûna şert û mercên îro de tesîra vê jî zêde zêde heye) di encama şerê di navbera feodalên herêmî û burjuwaziya Tirk a ciwan û şerê navbera emperyalîzma Îngîlîz-Fransiyan de hatiye diyarkirin. Program, hewl dide ku van tiştan rave (izah) bike û di vê mijarê de nêrînên rêkûpêk û bi sîstem pêş bixe.

Taybetmendiya herî diyar a progamê ew e ku mijarên weke '*piştî Şerê Emperyalîst ê I. ji aliyê emperyalîst û hêzên mêtînger ên ku li hev kirine ve çawa Kurdistan hatiye parçekirin û ev parçekirin bi çi şiklî neheq e, emperyalîzm û mêtingeriyê berjewendiyên girseyên gel ên ku li Kurdistanê dijîn çawa paşguh kirine, çawa riyeke herî biçûk a pêşketinê ji wan re nas nekirine û nêzî naskirina hebûna wan jî nebûne'* girtiye dest. Emperyalîst û mêtingeran tevî ku di vê qonaxê de navê vî welatî û hebûna gelên ku bi şêniyeke pir li vî welatî dijîn nas dikir, ji bo pêşketina aborî û siyasî ya vî gelî riyeke herî biçûk jî venekirine û bi tevahî helwesteke weke, ev gel di nav lepên xwe de parçe parçe kirinê, di nav lêpên xwe de girtinê û heya dilopa xwîna wî ya dawî dagirkirinê ji xwe re kirine qanûneke esasî. Car caran bi hev re li ser vê mijarê şer kirine û car caran jî li hev kirine. Bi taybetî di navbera Îngîlîz û burjuwayên Tirk de pevçûnên bi şîdet û lihevkirin çêbûne. Ev li Lozanê wiha ye, li Sewrê wiha ye û piştre jî sala 1925'an di pirsgirêka Misul de wiha ye. Ev hemû bûyerên ku di dîroka nêz a Kudistanê de pêk hatine û ji şikilgirtina Kudistana îro re bûne sedem, xwediyê girîngiyeke dîrokî û siyasî ne.

Belê, em ti car nikarin bi şiklê bûyereke çêbûyî û xelasbûyî li vê raboriya (geçmiş) dîrokî ya nêz binêrin. Ev wezîfe, ji aliyê hin kesan ve weke raboriyeke dîrokî, weke mijara bermahiyeke dîrokî tê girtindest. Lê belê ji bo me bûyerên heya asta dawiyê pir girîng in û encamên wan ên siyasî ên pir nêz hene ku; jiyana me ya îro ji pir

nêz ve eleqedar dikin û xwediyê naverokeke dîrokî û siyasî ne. Em, bi rewşa ku Kurdistana ji aliyê van bûyerên dîrokî, siyasî ve hatiye diyarkirin qebûl nake re xwe rû bi rû dibînin. Statuya Kurdistanê ku car caran bi şer car caran jî bi lihevkirinê ji aliyê emperyalîst, mêtinger û feodalan ve hatiye diyarkirin, ne statuyek ku ji aliyê me ve were qebûlkirine. Ji bo me ne statuyek e ku girêdayî bi wê re pêşketin çêbe, Partî û gel karibe bi şiklekî azad pêş bikeve; ne statuyek e ku gelek pêşketina xwe ya siyasî, aborî û çandî bi şiklekî azad pêk bîne. Berevajî, em, ne mimkûn e di derbaskirina vê statuyê de, rejîmên siyasî yên di encama peymanên (anlaşma) cur bi cur de û di encama peymanên hiqûkî ku hê jî hebûna xwe didomînin de hatine avakirin, saziyên kedxweriya aboriyê yên ku ji aliyê van rejîman ve heya asta talanê hatine pêşxistin qebûl bikin. Di asta ku em vê qebûl dikin de jî, em ê nikaribin ji bo girseyên gel ên li vî welatî, li ser vê axê dijîn soza jiyaneke azad û hê pêşketîtir bidin.

Program, di vê mijarê de têra xwe bi nazikî tevgeriyaye. Bi pêşxistina şiklên tehlîlên cur bi cur li qadên cur bi cur, hewl daye nîşan bide ku ev yeka ne mimkûn e. Wê demê, hem çewisandina li parçeyên din û li tevahiya Kurdistanê pê re rû be rû tê mayin, ew parçe dayine emperyalîst û nokerên (işbirlikçi) wan; hem jî ketin bin siya statûya Tirkiyeyê ya parçeya li Tirkiyeyê û her ku diçe ji Tirkiyeyê re bûn afir û gelaşdank (çöplük), em nikarin weke rewşeke asayî qebûl bikin an jî vê statuyê qebûl bikin.

Ya rast, program Mîsak-i Milî'yê red dike. Bi taybetî dixwaze bila ji bo rêxistinên reformîst be, dixwaza bila ji bo rêxistinên herêmî û teslîmkar be, dixwaze bila ji bo tevger û grubên sosyal-şoven be, em Mîsak-i Milî ku ji aliyê grubên din ve weke daneyekê (veri) tê qebûlkirin bînin bîra xwe. Mîsak-i Milî ev e: axên ku leşker û artêşa Osmaniyan bi hêz û quweta xwe ya cewherî di destên xwe de digirtin, ji aliyê Mustefa Kemal an jî burjuwaziya Tirk a wê demê ve weke sînorên neteweyî, yanî weke Mîsak-i Milî hatine nîşan dan.

Di vê sîstema sînoran de, her tişt bi temamî ji aliyê darê zorê ve tê diyarkirin û çewisîna (baskı) neteweyî û çînî di asta herî jor de hatiye berfirehkirin.

Em, vê ji xwe re weke daneyekê, weke rewşeke asayî nabînin Em, bi vî şiklî tesbîtkirina sînoran a Mîsak-i Milî'yê, li ser van sînoran komarek ava kirinê û pêkhateya (yapı) ekonomîk ku pêkhateya jor a vê komarê pêk tîne, bingehên aborî, hemû têkiliyên civakî û çandî (kültürel) yên ji aliyê vê bingehê ve tên pêkanîn, nikarin qebûl bikin û li dijî vê têkoşîna me yê hebe.

Em dibêjin; ev, li ber pêşketinê hin asteng in ku, pêşketinê çênakin, di pêvajoyeke kapîtalîst a desthilatdariyê de ji binî de gelekî neçarî feqîrtiyê dikin, hê bêhtir bêçand û bêkar dikin. Ji ber ku em vê her diçe bi şiklê statûyek ku derfeteke herî biçûk jî nas nake fêm dikin, pêwîst e di aliyê rêgezî (ilkesel) de li dijî bê derketin. Û em vê jî weke hedefeke siyasî ya herî girîng a roja me ya îro tesbît dikin. Ev yeka hê bêhtir ji bo vê girîng e: Eger darêzên (yargı) grubên sosyal-şoven, yanî li ser şoreşa Tirkiyê, mînak darêzên TKP, ku ew ji pêncî salî vir de di şoreşa Tirkiyê de cih digire, û paşê darêzên grubên din li ber çavan werin girtin, tê fêmkirin ku em di vê mijarê de ji wan çendî cuda ne. Li her parçeyê hêzên me yên herêmî yên ku li pey herêmên cuda yên otonom dibezin, bi israr dane pey otonomiyê û ji bo vê otonomiyê bêyî ku ti car li dijî sînorên Mîsak-i Milî, an jî sînorên di nav Şerê Emperyalîst ê I. de hatiye diyarkirin dernakevin hene. Eger em van bînin bîra xwe, bi şiklekî diyar derdikeve holê ji van nêrîn û siyasetên ku têkelheviyeke feodal burjuwa ne çi ferq û cudahiya me heye. Ev, di heman demê de wezîfeya dîrokî ya proletaryaya Kurdistanê diyar dike.

Di vê pêvajoyê de, welatê me ji aliyê quwetên kapîtalîst-emperyalîst û mêtinger ve hatiye parçekirin û her parçeyê wî bi feqîrtî, talan û bi bêçandiyê re rû bi rû hatiye hîştin. Em weke şoreşgerên vî welatî, çewisandin û ketxweriya ji pênce salî, bi

taybetî ji şer vir de di hemû qadên saziyî (kurumsal) û pratîkê de tê mêşandin, sedema yekane ya feqîrtiya îro û mercên bêrehm yên jiyana îro, dibînin. Me di van de aliyekî herî biçûk ê pêşxistinê nedîtiye. Di bin nîrê vê sîstema çewisîner û kedxweriyê de li welatê me ti pêşketin çênebûne.

Eger em li Kurdistanê tabloyeke çors (kaba) ê dîrokê xêz bikin, ji serdemên destpêkê, serdemên ku Sumeran li vir, li Mezopatamyayê gava şaristaniyê avêtiye pê de di ti deman de qasî vê serdemê li derveyê serdemê mayin, li derveyê dîrokê mayin nehatiye dîtin. Serdema îro tê jiyîn di aliyê bêkesayetbûn û li derveyê dîrokê manê de, helbet her her wiha ji derveyê mirovahiyê manê de zîrvebûnek e.

Programê di vê mijarê de nirxandinên heya asta dawiyê nazik, heya asta dawiyê xwediyê rêgez (ilke) pêş xistiye. Hemû pêkhateya gel weke bêkesayetbûyî, tevahiya dîrokê weke hatin avêtina ji derveyê dîrokê, hemû têkiliyên mirovan weke ku têkiliyên girêdayî ne û ne welatparêz in dibîne. Û di heman demê de diyar dike ku; çandên sereta (ilkel) yên gelan, hemûyan derfeta pêşketinê nedîtine, gelekî ku ji ber tinebûnên di vê qadê de ketiye rewşeke aloz û di vê rewşa xwe de mayî, îro rewşek herî parçe parçe, paşde mayî û pêvajoya xwe ya herî reben û feqîr ku naye tehamulkirin dijî. Bal dikişîne û diyar dike ku; tevî ku serdem, serdemek ku teknolojî û zanist heya asta dawiyê pêş ketiye, gelên cîhanê ber bi sosyalîzmê, ber bi civaka bêçîn ve diçin û têkoşînên xwe yên germ dimeşînin, lê belê gelê me berevajiya vê yekê, weke gelekî ku ji derveyê serdemê maye û ji ti derfetên serdemê ên weke siyaset, ekonomîk, teknîk û ji pêşketinên di vê qadê de para xwe negirtiye, weke gelekî, ji binî de li derveyê van hemûyan maye. Dîsa bal dikişîne û diyar dike ku gelê Kurd ê ku di vê rewşê de ye, di kîjan astê de bi tehlûkeya tinebûnê re rû bi rû maye û îro weke ku careke din navê wî neyê zanîn di pêvajoyeke tasfiyeyê de ye, ji ber vê yekê hewl dide

wezîfeyên rêxistinî yên acîl ên rojane û şiklên têkoşînê derxe meydanê.

Di vî aliyî de pêşketina zilm û zorê, di aliyê naverok de, yanî di aliyê civakî de feodalbûna vê zilm û zorê, heta hemû gel bi şiklê bermahiyeke ji serdemên koletî û sereta mayî li ser piyan girtin, ji ber nekariye ku ti taybetmendiyên netewebûnê pêş dixin tevlî bunyeya xwe bike an jî bi şiklekî pir sînordar tevlîkirinê, rewşa vî gelî heya asta dawî xirab tê vegotin, heya asta dawî nêzî rastiyê tê tarîfkirin. Û ji vir bi derketina rê, naverok û çawaniya (nîtelik) şoreşê û quwetên ji şoreşê berjewendiya wan heyî, hedef û dijminên vê şoreşê tên derxistin meydanê û hewl tê dayin ku di vê mijarê de rêgezên rêxistinbûna hêz û quwetên têkoşêr an jî çawaniya rêxistina ku wê ev hêz ava bikin were diyarkirin. Rastiya dîrokî ku program xwe dispêrê an jî nêrîna wê li dîrokê, rastiya vê serdemê ev e û ji vir, ji bo gelekî van encaman derdixe.

Baş e, ji bo gelekî ku evqas ji derveyê serdemê maye û di vê astê de di pêvajoya xelasbûnê de ye çi tîne? Dibêje, pêwîst e têkoşîneke rizgariyê ya neteweyî were meşandin. Ji bo pêşketinê, ji bo di her qadê de zindîbûnê, rizgariya neteweyî! Û, dibe ku maneya vê ya herî safî serxwebûn be, dibe ku ev serxwebûneke siyasî ya ku piraniya gel tevlî dibe be. Hedefa şoreşê ev e, hedefa herî acîl ev e. Erk û wezîfeya herî girîng ya şoreşê bi vî şiklî diyar dike.

Girêdayî bi vê re, şerta wê ew e ku; serxwebûna neteweyî were pêşxistin, serxwebûna siyasî were pêşxistin û di nav serxwebûna siyasî de feodal werin tasfiyekirin. Îdîa dike ku welatek ku tê de feodal û komprador dijîn nikare azad be. Li aliyê din diyar dike ku li vî welatî hin çîn pêk hatine, hin grubên neteweyî wê nikaribin ji serxwebûna neteweyî sûd bistînin, êdî di aliyê dîrokî de naveroka van hatiye valakirin. Qedera ku dîrokê ji van re pêşdîtiye; di derbara netewe de tiştek negotin, xwediyê nasnameyeke neteweyî nebûyin an jî asîmîlebûna di nava neteweya hakim de ye.

Ji bo ciwanan, ji bo gundiyan, ji bo karkeran ji bo hemû girseyên kedkar jî vê dibêje: pêwîst e ji nû ve cîhanek were avakirin û riya vê jî di serxwebûna neteweyî re, di serxwebûna welêt re derbas bibe. Dibêje; riya alîkariya ku em karibin bidin hemû mirovan, heta riya alîkariya herî nêz ku em ê bidine gelê ku li herî nêzî wî em dijîn, di têkoşîneke rizgariyê ku li vir were meşandin re derbas dibe. Û bi heman şiklî riya feydeyek dan gelên cîhanê jî, riya vê ya weke wezîfeyekê pêkanîna vê ya li pêşberê gelên cîhanê jî, bilindkirina têkoşîna serxwebûnê ye. Diyar dike ku hêzên ji vê herî zêde sûd bistînin, tebeqe û çînên karker, gundî, ciwan, rewşenbîr û beşên din ên kedkar û hêzên ku karîne welatparêziya xwe biparêzin ên di nava tebeqeya feodal û burjuwa de ne.

Weke dijmin jî, hemû sazî û grubên feodal, eşîrî, malbatparêz, mezhebparêz û yên ku dozên xwînê diparêzin dike hedef. Dîsa, çewisandina neteweyî ya ku van hemûyan li ser lingan digire û burjuwaziya Tirk ku vê çewisandinê pêk tîne û faşîzma harbûyî ya îro, ku berdevkê vê burjuwaziya Tirk e, weke hedefa sereke dike hedefa têkoşînê xwe.

Program, esasên ku xwe disipêrê bi vî şiklî aşkere dike û di têkoşînê de hêzên ku xwe bispêrê û erk û wezîfeyên ku pêk bîne tîne ziman; rêbazeke têkoşînê ya demdirêj pêş dibîne. Yanî dibêje; ev rêgez (ilke) tenê bi rêbaza şerê gel ê dem dirêj, bi rêbaza şer ê ku di serdema me de ji aliyê hemû gelên feqîr ve tê bikaranîn pratîze dibe, û pêwîst e bi rêbazên wan gelan şer were kirin û taktîkên têkoşînê yên wan were bikaranîn. Helbet, dikare di vê pêvajoyê de rêxistin û tifaqên cur bi cur bên pêşxistin.

Weke encam, dibêje; *"Pêwîst e ev hewldan bibin sedema avakirina hikumeteke gel a demokratîk. Hikumeta gel a demokratîk a ku wê di encama tasfiye kirina çewisînên (baskı) îro yên mêtinger û di encama tasfiye kirina çewisîna (baskı) feodal de were avakirin, alternatîfa siyasî ya yekane ye. Nikare ji derveyê vê alternatîfeke siyasî were fikirîn, di pêvajoya hikumeteke bi vî şiklî de biryarên herî*

*şoreşgerane dikare bên pêkanîn. Wê bi vî şiklî mimkûn bibe ku axa welat adilane were belavkirin, gelê ku li welêt dijî, dest bi seferberiyeke berfireh a çandî (kültürel) û perwerdeyê bike, gel weke ji nû ve dest bi jiyanê bike ji nû ve were ser xwe, bi gelên cîran re li ser bingeha wekhevî û azadiyê ji nû ve yêkîtiyek were avakirin, gel karibe ji çanda mirovahiyê ya cîhanê û ji berhemên zanist û teknolojiyê sûd wergire û bi van hemûyan, ji amûrên paşdemayî yên hilberînê amûrên hilbêrînê yên herî pêşketî were afirandin. Ji bo ku ev pêk were, amûreke hem siyasî û hem jî pratîkî, amûreke wiha ya herî acîl, amûrekê siyasî hewce ye."*

Bi kurtahî eger bi evqas rêxistinbûn, evqas têkoşîn û bi evqas şer her ku diçe amûreke wisa were afirandin, eger karibe amûreke wisa ku qedera girseyên gel ên li Kurdistanê dijîn li beranberê hêzên hindur û derve biparêze were pêşxistin, wê demê di serî de parastina berjewendiyên gelên herêmê û her wiha parastina berjewendiyên hemû gelên cîhanê mimkûn dibe. Ev ê were maneya ku me alîkariya herî mezin daye têkoşîna gelên cîhanê û bi şiklekî herî bi tenduristî wezîfeya ku enternasyonalîzma proletaryayê daye ser milê me jî bi cih aniye. Ji derveyê vê, ti riyên din ên pêşketinê nehatine peydakirin. Program, ji derveyê vê, riyeke pêşketinê ya hê jî mirovane û hê jî welatparêz nas nake. Program îlan dike ku hemû rê, alternatîf û amûrên (hin kes ber bi parlementoyê ve dibezin, hin kes dibêjin '*hê zêde rê, hê zêde fabrîka"* û hin kes jî dixwazin asîmîlasyon hê jî were xurtkirin) ji derveyê vê, riyên mirin û tinebûnê ne.

Bê guman avakirina hikumeteke gel a demokratîk, pirsgirêkeke zehmet e. Wê di carekê de li hemû welêt pêk neyê. Eger em karibin îro jî komîteyeke şoreşgerî ava bikin, bigirin ji pêşwazîkirina pêdiviyên herêmî yên gelê li vir, eger em hemû wezîfeyên weke, gel ji erîşên derve parastinê bidin ser milê xwe, wê di encam de çi biqewime? Tiştê ku biqewime, ji hikumetek ku di demên pêş de were avakirin beşeke biçûk e. Eger em sed mînakên weke vê

çêbikin, eger em ji artêşa mêtînger rizgar kirî du sed herêm çêbikin, helbet hikumeteke wiha ji teorîbûnê derdikeve, dibe rastiyeke pratîzebûyî ya zindî. Eger têkoşîna me li pey hev, ji xwe re herêmên nû biafirîne, li hê zêde herêman tesîra feodal û tesîra polîs bişkîne û di encama van hemûyan de bi çalakiyên xurt ên gerîla, artêşa mêtinger bixe rewşek ku nikaribe xebata xwe bidomîne, dikare hin amûrên ku ev hikumet xwe bispêrê, komîteyên destpêkê, konseyên destpêkê an jî şiklên destpêkê yên ku hikumeteke wiha xwe bispêrê derxe meydanê.

Program dibêje û formûle dike; "*Beriya jiyîna van hemû pêvajoyan, aşkere ye ku em ê nikaribin weke hikumeteke gel a wiha derbikevin meydanê. Eger em derkevin, ev wê were maneya ku me karekî pir razber (soyut), pir xiyalî kiriye. Lê helbet eger em van şert û mercan biafrînin jî, wê bi şiklekî xwezayî, weke hedef, hikumeteke wiha derbikeve pêşberî me; ne tenê weke amûreke siyasî û amûreke rizgariyê, hem ji bo parastina serxwebûna neteweyî û hem jî ji bo derbaskirina feodalên li hindur, yanî ji bo pêkanîna demokrasiya li hindur, alternatîfa siyasî ya yekane û amûra siyasî ya herî destdayî ev e û ev amûr jî dikare di pêvajoyeke şerê gel ê demdirêj de were afirandin.*"

Avakirina hikumeta gel weke wezîfeyeke herî girîng hatiye destnîşankirin. Paşê, hin karên ku bi pêşengiya hikumeteke bi vî şiklî were kirin hene: weke karên di qada perwerdeyê de, di qada pêşketina çandî de, di dema avakirina aboriyê de, di pêvajoya ji nû ve avakirina sanayiyê de werin pêşxistin. Lê tesîra ku aborî li ser hemû qadên weke çandinî (zîraî), tîcarî, malî bike û encamên ku derxe meydanê, wê bi biryarname û bernameyên salane yên hikûmetê yên wê demê were diyarkirin. Ne mimkûn e ku di programê de li ser vê mijarê hê zêde tişt werin diyarkirin. Helbete bi van hemû tedbîrên ku ev hikumet bigire, her ku biçe wê li ser van axan dîktatoriya gel a demokratîk, yanî bi kurtahî komareke gel a serbixwe were avakirin. Her wiha bi vê re, ji bo ku li Rojhilata

Navîn, li welatên ku şoreşa xwe pêk anîne di navbera gelan de fikra şoreşgerî pêş bikeve û di navbera hêzên şoreşger ên sosyalîst û hem jî di navbera hêzên welatparêz ên demokrat de têkiliyên hê bi tendurustî, wekhev û azad pêş bikevin, wê zemînek çêbibe. Dibêje; *"Mînak, eger hewce bike (ev di programê de nehatina nivisîn, lê em ê di destgirtina duyemîn de bigirin dest) di asta herêmê de avakirina yekitiyeke komaran, eger nikaribe yekitiyek wiha were avakirin jî, qet nebe li ser bingeheke azad û wekhev anîna gel hev a gelan, hevkariya di navbera hemû hêzan de, dikare bibe sedem ku di asta herî pêş de danûstandineke têkiliyan çêbe û herî zêde jî, ji bo berjewendiya gelan ev ê were kirin û dibe ku rejîmeke siyasî ya bi vî şiklî karibe van bike."*

Dema em li encama van hemûyan dinêrin, weke grubeke têkoşînê, programeke wiha ku me îro ji xwe re kiriye hedef, me ber bi bûn rêxistineke şoreşgerî ya siyasî ya welêt ve dibe. Program di vê mijarê de diyar dike, ku kadro û amadekariya xebatên me di asteke têrê dike de bin pêwîst e em bibin quweteke rêxistinkirî. Rêxistineke wiha ya ku dibe hêzeke siyasî û ji xwe re têkoşîna siyasî esas digire jî, ji bo ku hedefên xwe pêk bîne hewce ye berê xwe bide şiklên cidî yên têkoşîn û şer.

Piştî van hemûyan, tiştê em karibin bêjin ev e; ya rast programê ji doxtrîna sosyalîst sûd wergirtiye û li ser vî bingehî riya yekane ya rizgariya gelê welêt nîşan dide. Di heman demê de ev ê li kîjan deverê û çawa were avakirin diyar dike. Program, têkoşîna azadî, demokrasî û sosyalîzmê ya gelên cîhanê weke hêz û quweteke îtifaqê ya mezin dibîne. Tevgerên çînî yên cîhanê û tevgerên gel ên demokratîk hevkarên xwe yên herî nêz dibîne. Welatên sosyalîst weke mitefîkeke mezin dihesibîne û xwe jî weke mitefîkê xwezayî ya wan quwetan dibîne. Li hemû destkeftên mirovahiya pêşverû xwedî derdikeve û weke mîrateyekê dewr digire. Û li ser van hemû bingehan, tîne zimên ku li welatek ku cihê çewisandinên neteweyî, çewisandinên feodal nemaye û bi tevahî

tasfiye bûye şexsên li welêt dijîn dikarin bikevin riya asayî ya pêşketinê û riya dîrokî ya pêşketinê, dikarin di vê riyê de gavên acîl biavêjin, dikarin wê rewşa ji sedan sal tê jiyîn a di cihê xwe de sekinînê û ya paşde çûnê, bi gavên mezin tine bikin û heta dikarin ji welatek ku di nav şaristaniya kapîtalîst de ye pêşdetir biçin, dikarin bibin welatekî hevkarê sîstema sosyalîst. Ji bo bûn welatekî bi vî şiklî, riya yekane ku were şopandin, ji aliyê programeke bi vî şiklî ve hatiye diyarkirin.

Dîsa, li dawiyê diyar dike; *"Pêwîst e bi demê re parçebûna (ji ber ku parçebûneke bêbext û di berjwendiya emperyalîzm û mêtingeriyê de ye) li beşên din ên Kurdistanê were tasfiyekirin û gelê li her parçeyê dijî, bi hêza xwe ya cewherî têkoşînekê bimeşîne. Ev gelê di nava dîrokê de bi bêbextî hatiye parçe parçe kirin, dikare vê carê li ser bingehekî hê demokratîktir, bi awayekî ku ji zilm û zora neteweyî hatiye paqijkirin, li her parçeyê bi îradeya xwe ya azad (em van hemûyan, ji ber pêwîstî bi pêşengiya sosyalîzmê dibînin dibêjin) bi rê û rêbazeke azadane were gel hev."* Li cihê gelekî ku di nava dîrokê de tine bûye û welatekî tine dibe, soza welatekî ku bi pêşengiya sosyalîzmê her diçe dikeve li ser riya sosyalîzmê dide.

Ya rast, cewher an jî axaftinên dawî yên programê ev in. Lê, pêwîst e em aşkere bêjin; ji bo ku ev hemû pêk werin û naveroka van hemûyan were dagirtin jî, eger hewce bike, divê têkoşîneke bi sedsalî were meşandin û pêvajoya meşandina vê têkoşînê jî bi hezar zehmetiyan dagirtî ye. Hewce ye ku em di vê mijarê de nekevin nav xewn û xiyalan. Program, bi taybetî diyar dike ku bi şiklên têkoşînê yên aştiyane qet nayê gihîştin van armancan û di serî de qebûl dike ku wê têkoşînek herî zehmet, şerên pir xwînavî (kanlı) û şiklên têkoşînê yên pir xwînavî werin meşandin. Lê, vê wêkî xetereyekê nabîne, yanî ji ber ku wê pir têkoşîn were meşandin, pir xwîn were rijandin, bi qasî zere-î misqal weke tiştekî neyînî li vê nanêre. Berevajî, diyar dike ku xwîna were rijandin wê ji bo azadiya ku were qezenckirin bibe hêz û quweta jiyanî.

Ez di cih de nabînim da ku di vê civînê de li ser şiklekî hê berfirehtir ê naveroka programê biaxifim. Ji ber ku di vê mijarê de agahî û danezaneke din hatibû dayin, ez bawer im dibe ku we hemûyan ev xwendibe. Ew belge, hineke din programê aşkere dikin, hineke din li ser lêkolîn dike. Jixwe eger mimkûn be, eger em di demên pêş de jî bi taybetî ji bo xebatên teorîk derfetê bibînin, ez dikarim bi rehetî bêjim ku hê zêde eşkerekirina progaramê, eşkerekirineke wê ya ku xwe disipêre lêkolîneke hê kûrtir jî mimkûn e û em dikarin bi nêzîkbûnên hê berbiçav (somut) derkevin meydanê. Lê em dibêjin; em dibînin ku nêzîkbûnên ku em di şert û mercên îro de pêş dixin de jî rêgezên têne ziman heya asta dawî şoreşgerî ne, nikare ev rêgez (ilke) werin înkarkirin û dikare were pêşxistin. Ev ê bibin rêgezên ku hemû quwetên welatparêz ên demokratîk li derdorê kom bibe û bi rastî jî, di roja me ya îro de jî li Kurdistanê ji bo van rêgezan zêmîneke fireh a welatparêz çêbûye, bûye sedem ku gelek grup çêbibin û heya astekê têkoşîn were meşandin. Dîsa li gorî ku ev program pêş dibîne; wê bi demê re ev rêgez xwe bigihînin artêşekê, cepheyên gel yên bihêz û wê encama xwe ya siyasî û xwazayî biafirîne, yanî bi hikumeteke gel a demokratîk afirandinê re bi dawî bibe û wê li cihê vê programê, yeke ku şert û mercên hê nûtir digire dîqetê, ku xwe dispêre analîza şert û mercên nû, vê carê avabûna sosyalîst û her ku diçe avabûna civaka bê çîn bike hedef were pêşxistin. Programê di vê mijarê de jî nazikbûna lazim dike nîşan daye.

Ji bo qonaxa sosyalîst zêde tişt nehatiye gotin. Ji ber ku di şert û mercên çewisîna (baskı) netêweyî û her şiklî parçebûnên feodal de sosyalîzm dan pêş, eger ne îxaneteke bi zanebûn be bi temamî dînitî ye. Ji bo ku nekeve rewşeke bi vî şiklî jî, programê tiştên wisa zêde negirtiye dest. Pêwîst e em zanibin ku gelekî hê nekariye gavên seretayî yên azadiya xwe ya neteweyî û demokrasiyê biavêje, bi erk û wezîfeyên bi vî şiklî re rû bi rû nayê hiştin û di van şert û mercên ku tê de ji bo hedefên herî nêz jî, têkoşîn û rêxistineke pir

cidî pêş neketiye de mirov nikare bi programên asta wan a îdîayê li pêş e derkeve meydanê. Hê jî wêdetir, weke hin grubên noker dibêjin; *"li Kurdistanê demokrasî pêş dikeve"* an jî *"em ê li Kurdistanê sosyalîzmê ava bikin"*. Li cihekî ku di bin zilm û zora neteweyî û di bin desthilatiya axayên feodal de ye, tiştên bi vî şiklî dan pêş, eger ne îxaneteke bizanebûn be, dibe ku berhemeke dînîtiyê, dibe ku berhama mejiyekî kole yê ku di dil de zanebûna demokrasî û serxwebûnê nîne be.

Ev hemû, mijarên ku hê jî li ser lêkolîn bên kirine. Hem program û hem jî broşûra aşkere kirinê, ev hemû dibin sedem ku em berê xwe bidin lêkolînên hê berfireh û tesbîtên hê têrker. Helbet, hevalên ji vê para xwe sitandine, hevalên ku hesesiyeta wan hene wê encamên pêwîst derxin û rêgezên (ilke) progamê bigihînin şiklê wê yê rastîn. Cuda ji vê, bi pêşketina têkoşînê re ev rêgez ê bigihîjin asteke berbiçav, ev ê di aliyê teoriyê de me bibin encamên hê berhemdar. Ji bo niha, program an jî taslaxê wê, bi vî şiklî tê pêşkeş kirin. Eger hûn jî di vê mijarê de nêrînên xwe bînin ziman wê baş bibe an jî pêwîst e bînin ziman, ne ku baş dibe şert e.

*Mazlum DOĞAN: "Tiştekî ku ez diyar bikim an jî li ser zêde bikim nîne. Hem tevlî cewher û hem jî tevlî şiklê wê dibim. Lê belê li cihekî, li beşa dawî, dibêje 'milkiyeta dewletê' …guherîna wê di cih de ye, li şuna wê 'milkiyeta kolektîf' (…)"*

*A-4*

*Bişar (A. Haydar Kaytan): "Ez jî bi temamî tevlî programê dibim. Ya girîng ew e ku ji bo bicihanîna erkên asgarî yên programê, lazim e em rêxistinbûnê pêş bixin û ji bo vê yekê hewldanên pratîkî nîşan bidin."*

*A-1*

*(Duran Kalkan): "Taslaxê programê, bi temamî nêrînên me yên siyasî û wezîfeyên me yên asgarî li ber çavan raxistiye, tevlî hemû tiştên hatine diyarkirin dibim. Tenê, hinekê li ser beşa dîrokê*

*difikirim. Tiştên di vê mijarê de hevalan anîne ziman ez qenea kirim, bi vî şiklî tevlî dibim."*

*(...) : "Ez jî bi giştî tevlî piraniya bernameyê dibim. Lê belê di beşekê de tê gotin ku dema pêwîst be nikare şiklên têkoşînê yên cuda werin meşandin. (...) Ya din jî divê têkoşîna çekdarî were gihandin asta rêgezî. Di bernameyê de çawa tê qebûlkirin? Têkoşîna çekdarî, weke avakirina artêşa gel tê pênasekirin. Avakirina artêşa gel, jixwe wezîfeyeke rêxistinbûnê ye. Li gel vê, pêwîst e, şerê çekdarî weke rêgez were diyarkirin."*

*A-2*

*(Cemil Bayık): "Tevlî rêgezên giştî yên programê dibim. Tenê, dema taybetmendiyên giştî yên Kurdistanê tê bi rêzkirin di şiqa "b" yê de, nirxandina bi şiklê 'emperyalîzm Kurdistanê weke mêtingehekê bi kar tîne' û girêdayî vê, tevlî nêrîna bi şiklê 'Kurdistan di nav çar dewletên mêtinger de xwediyê statûya mêtingeheke klasîk e' nabim. Emperyalîzmê ti car li Kurdistanê polîtîkaya mêtingeha nû nedaye meşandin. Ne mêtingeriya aborî, ne mêtingeriya li qada çandî, ne mêtingeriya li qada leşkerî heye."*

## Sosyalîzm û Rêxistinbûn

Wexta em li dîrokê dinêrin em dibînin ku gelek îdeolojiyên cur bi cur çêbûne, gelek rêxistinbûnên ku van îdeolojiyan jê re pêşengî kirine derketine meydanê û ev hemû, ji pêşketina organîzasyonên siyasî yên cur bi cur re bûne sedem. Û eger em lêkolîna xwe ya li ser dîrokê bidomînin, eger îdeolojiyeke bihêz li kîjan devera cîhanê derketibe, di kîjan serdemê de derketibe, mirovên ku ew îdeolojî fêm kirine bi misogerî bi hêz û quwetên dewletên wê serdemê re, bi hin siyasiyên wê serdemê re pev çûne. Nêrînên ku wê îdeolojiyê temsîl dikin eger li pêş wê serdemê bin, karîne pêkhateyên (yapı-oluşum) siyasî yên paşde mayî ji hev bixin û pêkhateyên siyasî yên

nû, yanî pêkhateyên jor yên siyasî biafirînin. Bi taybetî her îdeolojiya di mijara dewlet û pêşketina civakê de derketiye meydanê, di mirovên ku bi rêxistin kiriye û xistiye nav şer de bi misogerî ji pêşketineke siyasî re bûye sedem.

Lê, di dîrokê de em vê jî dibînin: wexta ku îdeolojiyekê berê xwe nedaye pirsgirêka siyasî, nedaye dewleta siyasî û nekariye berê xwe bide saziyên siyasî yên dişibin van rêxistinan, ew îdeolojî weke saziyeke terîqatî lê hatiye û her ku çûye bûye weke mezhebekê, her ku çûye bûye fosîl, ketiye rewşa bermayî û vê carê jî ketiye rewşa dînek ku di xizmeta pêkhateya kevin û pêkhateya siyasî ya kevin a mihefezekar de ye. Bi rastî jî eger îdeolojiyek ku di destpêka xwe de pêşverû ye, eger berê xwe nedayibe hedefa siyasî, yanî eger weke hedefa herî sereke xebatên siyasî diyar nekiribe, ew îdeolojî her diçe hatiye xistin rewşa dînek ku xizmeta desthilatiya paşverû dike, hatiye daxistin asta dînek ku di afyonkirin û xapandina gelan de tê bikaranîn. Bi rastî jî îdeolojiyek ku di destpêkê de pêşverû ye, eger berê xwe nedabe hedefa siyasî, yanî eger weke hedefa di asta herî pêş de, xebatên siyasî bi cih nekiribe, her ku çûye ew îdeolojî di destê îqtîdaran de hatiye xistin rewşa dînekê, di xapandin û bêdengkirina gelan de hatiye xistin rewşa dînekê.

Ev îdeolojî di rizgarkirina gelan de helbet nikarin tiştekî pêş me bikin. Her wiha jî, berevajî, di xapandina wan de û di ev rewş bi sed salan domandinê de bi roleke girîng rabûne.

Di vê mijarê de Marks wiha dibêje; *"Ma pêwîstî pê heye ku çîna karker bi polîtîkayê re mijûl be? Belê, divê mijûl bibe; eger bi polîtîkayê re mijûl nebe, ew ê weke Xirîstiyanên Serdema Navîn tenê bihuştê xiyal bikin"*. Çima Marks vê dibêje; ji bo ku tişteke bi vî şiklî neyê serê sosyalîzm û doxtorîna wî jî, vê dibêje*;"divê çîna karker ji polîtîkayê dûr neyê xistin, divê beriya kêliyekê çîna karker dest bi têkoşîna polîtîk bike û sosyalîst jî giraniya xwe bidin têkoşîna siyasî, eger ji vê dest were berdan wê bibe dîneke (ol) weke Xristiyaniyê û ev dîna jî wê bibe sedem ku gel bi afyonê were xapandin an jî bi*

*temamî bi xiyalan bijîn. Di encam de ev rewş ê bibe alîkarê herî mezin ê îqtîdarên siyasî an jî wê bibe ûtopyayeke paşverû ku berjewendiyên desthilatiyan tîne ziman."*

Helbet em naxwazin bikevin *re*wşeke wiha. Aşkere ye; em ê ku şexsên di nava evqas pêşketineke îdeolojîk de ne, bêyî ku em berê xwe bidin hedefên siyasî yên cidî, em nikarin xwe bînin asta quwetek ku jêre rêz tê girtin. Di dîrokê de mînakên vê pir in. Ma dikare dînek were nîşandan ku îro berê xwe nedabe îqtîdara siyasî? Dîsa kîjan zanyar (alim) heye ku, pirsgirêka siyasî negirtibe dest?. Hemûyan jî di merkeza fikrên xwe yên di vê mijarê de dewlet bi cih kirine, karîne li ser vê hin pêşniyaran pêş bixin û tenê vê kariye ji hin pêşketinên siyasî re rê vebike. Doxtrînên bi vî şiklî di pêvajoyên diyar ên pêşketina dîrokê de, ji bo pêşketina dîrokê, di demên diyar de bi roleke peşverû û diyarker rabûne. Çarenûsa (kader) hemû doxtrînan wiha ye. Hê jî pêştir, hemû doxtrînên felsefî yên siyasî ji bo ku berê xwe bidin pirsgirêka siyasî, yanî pirsgirêka dewletê, ji bo ku pêşketina civakî pêk bînîn, bi taybetî ji bo ku 'bihuşta' ku wan îdeolojiyan soz daye biafirînin, berê xwe dan pirsgirêka siyasî, berê xwe dan rastiya dewletê, ku îfadeya rastiya civakî ya herî kûrbûyî ye û ev çareserkirin û ber bi çareseriyê ve birin weke pirsgirêka sereke (baş-ilk) kirine hedefa xwe. Yên ku di vê mijarê de pir hewl dane, ji bo pêşketina dîrokê û di heman wextê de ji bo pêşketina gelan bûne alîkar.

Aşkere diyar e, em nikarin yek bi yek bînin ziman ku; îdeolojiya neteweperest a burjuwa, îdeolojiya feodal, şiklên îdeolojiyên cur bi cur ên ku di serdema koledariyê de derketî ne, heta eger em hê jî paşde biçin, şiklên fikrê yên ji aliyê civaka seretayî ya komînal ve bi şiklê sêhirvanî hatiye pêşxistin, di pêşketina civakan de amûrên siyasî yên bi çi şiklî afirandine û van amûran di pêşxistina ekonomî, quwetên hilberînê û zanistê de di çi astê de roleke girîng lîstine. Em bi rehetî dikarin bêjin ku, di van hemû serdeman de tenê wexta ku van îdeolojiyan berê xwe dane pêkhateya (yapı) siyasî ya jor,

pêşketinên pir girîng derxistine meydanê û em dikarin ji van îdeolojiyan re bêjin îdeolojiyên yekane yên şoreşger; lê li gel vê, îdeolojiyên ku berê xwe nedane îqtîdara siyasî û pirsgirêka siyasî ji xwe re nekirine esas jî, di bin emir û xizmeta desthilatiyên siyasî yên paşverû de bûne amûreke xapandinê, bûne terîqet û mezhebên cur bi cur û îdeolojiyên hatine xistin rewşa mezheban jî, bi rastî jî li ber pêşketina ekenomî û siyasî ya gelan bûne asteng.

Em ji bo çi vê dibêjin? Helbet, em ji bo diyarkirina rol û aliyê rêxistinbûna sosyalîzm, komînîstan û fikra komînîst vê dibêjin. Em dibêjin, pêwîst e di vî aliyê de lêkolîn li ser dîrokê werin çêkirin. Marks diyar dikir ku eger em naxwazin bikevin rewşa dînê Xristiyaniyê, yanî eger em nexwazin endamên xwe bixin nav xiyalên cîhana seretayî, em neçar in berê xwe bidin mijara îqtîdara siyasî ya doxtrîna sosyalîzmê. Em dikarin hezar carî hê girîngtir, vê rastiyê ji bo xwe bînin ziman. Eger em naxwazin li Kurdistanê sosyalîzm bibe ûtopyayekê, di destê rewşenbîran de bibe mijara vala vala axaftinê û bibe amûrek ku di nîqaşên çandî (kültürel) de li ser tê axaftin, pêwîst e em vê doxtrînê bikin amûreke têkoşîna siyasî an jî bingeheke îdeolojîk a rastîn a ku têkoşîna siyasî diafirîne. Belê, sosyalîzma ku em digirin dest, dixwaze bila di rêxistinbûnê de be dixwaze bila di têkoşînê de be, pêwîst e bi pirsgirêkên ji derveyê dewletê re zêde neyê mijûlkirin. Ne tenê di asta dewletê de jî, eger em xebatên siyasî daxînin asta partî û asta cepheyeke neteweyî, bi şert û merca ku van hemû mijaran bigire nav xwe, pêwîst e sosyalîzm her ku diçe berê me bide mijara siyaset û dewleta ku şiklê siyasetê yê herî kûrtir e.

Hostayên sosyalîzmê, xuluqkarên sosyalîzmê bi rastî jî doxtrîna xwe bi vî şiklî pênase (tanım) kirine. Li gorî îdîaya wan; pêwîst e li ber destê şoreşgerên proletar di bin xizmet û emra wan de, ji bo bidestxistina desthilatiya siyasî weke amûrekê, weke yekîtiyeke nêrînê û weke doxtrînek ku zemîna programê amade dike

sosyalîzm were bidestgirtin. Weke doxmayekê, weke mezhebekê, girtina dest a sosyalîzmê, timî rexne kirine.

Em ji ber çi bal dikişînin ser girîngiya vê? Em ji ber vê bal dikişînin: Di serdema me de qedera îdeolojiya feodal û burjuwa diyar e. Îdeolojiyên feodal, di nava sîstema îqtîdarên siyasî yên îro de û hem li ber pêşketina neteweyî hem jî li ber pêşketina demokratîk, dîsa li ber pêşketinên neteweyî û demokratîk yên ku şert û mercên jiyana gel hê jî baştir bikin bi temamî bûne asteng. Îdeolojiyên feodal, ji bo ku gel were xapandin û ber bi faşîzm û paşverûtiyê ve bê birin, weke amûrekê xizmet dikin. Ev îdeolojî, rola wan a avakirina îqtîdarên şoreşgerî bila li cihekî bimîne, berevajî, di berdewamkirina desthilatiyên siyasî yên paşverû de erkên girîng pêk tînin. Ev desthilatiyên siyasî, van îdeolojiyan pir baş bi kar tînin. Emperyalîzm û nokerên wê, di pevçûnên mezheban de, di liserpiyan girtina nêrînên dînî de, di astengkirina netewebûn û têkoşîna demokratîk de timî dikarin ji van îdeolojiyan sûd wergirin. Li aliyê din di roja me ya îro de neteweperestiya burjuwa, bi taybetî di mijara guherîna îqtîdara siyasî de weke amûrekê rol dilîze. Neteweperestiya burjuwazî ya cur bi cur, ya din jî kozmopolîtîzm, têkoşîna neteweyî ya gelan û her ku diçe têkoşîna îqtîdara demokratîk a gelan vedişêre û ji bo karibe nîşan bide da ku pirsgirêkeke wan a wiha nîne ji destê wê çi tê dike. Neteweperestiya burjuwazî, di roja me ya îro de ji bo ku dewletê biguhere, weke amûrekê bixe bin xizmeta çînên kedkar hewldan nîşan nade. Berevajî, wezîfe û fonksiyonên bi vî şiklî dane ser milên xwe: dîktatorî û îqtîdarên paşverû parastin û dan berdewamkirin, ev amûrên ku çavkaniya zilma li ser gelan in û berjewendiyên burjuwazî îfade dikin vedişêrin, bi çend reforman guhertin lê hê bêhtir jî bi awayekî mihefezekarî dan berdewamkirin. Di van şert û mercên îro de tiştekî ku ev îdeolojî bide gelên cîhanê nîn e, berevajî, zerara ku dê bide gelên cîhanê hê zêdetir e.

Helbet ev îdeolojî ji ber xwe neketine vê rewşê. Ketina vê rewşê ya van îdeolojiyan, bi derketina meydanê ya îdeolojiyeke weke sosyalîzmê, ku ji gelên cîhanê re dibe ronahî û ji wan re soza cîhaneke nû dide, ji nêz ve têkildar e. Sosyalîzmê, weke ideolojiyekê bi derketina xwe ya meydanê re rexneya hemû fikrên ku hene kiriye, rûyê rastîn ê van îdeolojiyan derxistiye meydanê û biryara xwe ya misoger a derbarê van de daye. Çi ye, ev biryar? Ev fikir û îdeolojî, ji astengek ku paşve dikişîne pê ve ne tiştekî din e. Baş e, li gel vê çi nîşan daye? Asoyeke (ufuk) pêşketinê ya bê dawî nîşanî gelan daye. Nîşan daye ku, wê gel karibin bi rêbertiya vê îdeolojiyê, gerdûnê kifş bikin û di asteke mezin de made biguherin, karibin quwetên hilberînê (üretim güçleri) û zanistê pir baş pêş bixin, karibin pêşketina civakî pir zêde bi lez bikin. Bi şiklekî zanistî, bi esas girtina zanista objektîf a heya roja me ya îro kom bûye, bi hemû pratîkên civakî ji xwe re kirin bingeh, kariye vê nîşan bide.

Di demek ku em dixwazin îdeolojiyeke bi vî şiklî li welêt pratîze bikin de, helbet em nikarin çavê xwe jêre bigirin ku ev îdeolojî tenê weke utopyayekê di pêkanîna reforman de, di bidestxistina hin mafên çandî de û di lêkolînkirina çandê de weke amûrekê were bikaranîn. Dîsa çawa ku di mijarên ji derveyê dewletê de em li dijî ne ku ev îdeolojî bi vî şiklî were bikaranînin, em li dijî sekinîne da ku bi rêxistinên wiha yên sist û bi rêxistinên ku ne şoreşger in gef li vê îdeolojiyê were xwerin jî. Aşkere ye; pêwîst e, şexsên ku ketina nav vê îdeolojiyê, mezinahiya vê doxtrînê fêm bikin û bizanin ku yên ev fêm kirine jî bi rastî jî bi avakirina cîhaneke cuda erkdar in; ne weke alîgirên hin klîkên reformîst û mezheban, hewce ye bibin berdevkê ferasetek ku timî hemû astengên li ber pêşketina gelan ronî dikin û timî wan dawetê ronahiyê dikin. Beriya her tiştî jî ji ber ku li dijî îqtîdara siyasî têkoşîneke mirin û mayinê dimeşînin, divê hemû taybetmendiyên amûrên di destê vê îqtîdarê de li ber çav bigirin, bi heman şiklî bi rêxistinbûneke pir xurt, rê nîşanê gel bidin û bi şiklê rêxistinên pir xurt derkevin pêşberê gelekî. Ne mumkîn e ku ev

îdeolojî bi şiklekî din xwe birêxistin bike, bi şiklekî din bi şert û mercên şênber (somut) ên gelan re bibe yek û xwe bigihîne gelan.

Em nikarin çavê xwe jê re bigirin da ku kadroyên bi îdeolojiyeke wiha xwe gihandine asteke diyar, bi rêxistinbûnên sist derkevin meydanê, hedefeke siyasî nîşanî gelan nedin, di ronî kirina hin pirsgirêkên çandî yên ne esasî de, di bidestxistina hin mafên aborî û demokratîk an jî hin mafên sînordar ên neteweyî de weke amûreke ji rêze were bêqîmetkirin. Eger doxtrîneke bi vî şiklî xwe bi rêxistin bike an jî, bi tiştên wiha re rû bi rû bimîne, tê maneya ku ew doxtrîn ketiye rewşa mezhebekê. Eger doxtrînek hatibe xistin rewşa mezhebekê, rêxistinbûna ku ev pêş bixe nikare ji rewşa rexistinbûna klubekê an jî komelekê derbas bibe.

Ya gelan jî, armancên wan ên pir binirx hene. Dive em vê ji bîr nekin, ku wan hêviyên xwe yên ji bo pêşerojê ti car wenda nekirine. Sekn û helwesta ku pêşerojê ji bîr dike û ji bo pêşerojê (gelecek) ne xwediyê îdîayeke pîroz e, di heman demê de ji ber ku ji bo pêşerojê ne xwediyê îdîa û xwediyê hêviyên mezin e jî, ji bo berjewendiyên rojane bi şiklê *"em ê çi bikin bila em îro bikin, em ê çi bixwun bila em îro bixwun û wê sibê çi çêbe me eleqadar nake"* ne sekn û helwesta çînên gel e. Pêşeroja çînên emperyalîst, çînên burjuwaziya biçûk, çînên burjuwa, çînên feodal nîne; ji ber ku pêşeroja wan nîne hêviyên wan jî nîne. Ji ber ku, ev di vê wateyê (mane) de çînên esasî ne, helbet nikarin îdeolojiyek ku weke sosyalîzmê hêvîdar e qebûl bikin. Aşkere ye ku ev îdeolojî bi xistin rewşa mezhebekê, wê ev îdeolojî di destê wan çînan de weke amûrekê were bikaranîn û ji kêliya ku weke amûrekê hatin bikaranînê pêve, di destê gelan de ne weke nexşeyeke rê, wê bibe weke glokeke ji derewan çêbûye û her wiha veguhere oportunîzmeke siyasî.

Bi kurtahî em nikarin li vir, doxtrîna sosyalîst bi şiklekî ji rêzê û bi şiklekî bûye fosîl ava bikin û pêk bînin an jî doxtrîneke bi vî şiklî em nikarin bi pirsgirêkên rojane ên ecêb, weke bixin nava gêravekê

lê bikin. Divê em, formasyona ku ev îdeolojî karibe ji me bixwaze, di maneyekê de asteke bilind a ruhî û taybetmendiya wê ya timî ji gelan re pêşengî kirinê, di kesayetiya xwe de hilgirin. Em nikarin weke endam û şexsên ku temsîla çînên pêşeroja wan nîne dikin, tevbigerin. Ya rast ji ber ku hin têgeh bûne ji rêzê û kalîteya wan pir ketiye, îro sosyalîzm bûye benûştê devê demogokên kolanan. Hêz û quwetên pêşeng ên sosyalîzmê, dema ku derketine ti car nedikarîn bi vî şiklî li doxtrîna xwe binêrin. Lê îro xistine rewşa benûştê devê burjuwayên her neteweyê. Heya di nav me de jî nirxa sosyalîzmê bi temamî nehatiye fêmkirin. Dibe ku pir kêm heval di ferqa vê de bin an jî bi vê zanebûnê tevbigerin.

Em ê ji çareserkirina pirsgirêka siyasî zêdetir sosyalîzmê weke rêberekî/ê çalakiyê bigirin dest. Eger nêrîna me ev be, pêwîst e, em bi misogerî rêxistinbûna vê jî weke rêxistinek ku karibe şerê desthilatiya siyasî bimeşîne bigirin dest. Ji bo vê yekê, ev ne karekî pirsgirêka teknîkî an jî bi hin pratîkên hêsan bê çareserkirin e.

Me, destpêkê her çendî weke şagirtên wê sosyalîzm girtibe dest jî, ev naye maneyê ku em ê timî bi vî şiklî nêzî sosyalîzmê bibin û timî weke şagirt bimînin. Em ê bi misogerî weke berdevk û parazvanên doxtrîneke bi vî şiklî, weke şert û merca vê ya herî girîng, li gorî pirsgirêka desthilatiya siyasî ya welatê lê dijîn pratîze bikin û vê ji bo hilweşandina desthilatiyên paşverû weke amûrekê, weke nexşariyeke çalakiyê bi kar bînin û em ê tiştê dikeve li ser milê me pêk bînin. Me, ji vî aliyî ve jî hê di roja destpêkê de (helbet ji ber ku pêwîstiya hevalan bi fêrbûn û pêşketinê heye) nikarîbû li ser pirsgirêkê bi kûranî bisekinin; ne me karîbû vê zêde pratîze bikin û ne jî me karîbû ku mijara gelo pêwîst e em pêdiviyên teorîk ên vê çawa pêşwazî bikin, lêkolîn bikin. Lê pêwîstiya me pê hebû an jî me tenê ji bo jiyîna pratîkeke diyar û ji bo di asteke diyar derfet bidin hevalan da ku xwe perwerde bikin wisa kir.

Wê ewqas fêr bibin û perwerde bibin û ewqas kar û xebat bimeşînin, hema bêje wê bigihîjin asta berdevkiyê, lê li aliyê din hê

di rewşa seretayî û bêrêxistin de bin; ev ne rewşek ku ji aliyê sosyalîzmê ve were efûkirine. Eger rêza me ji bo vê îdeolojiyê hebe, ev bi vî şiklî domandin ji aliyê me ve jî bi misogerî nayê qebûlkirin. Em ê bi vê doxtrînê, xwe bigihînin kîjan deverê û xwe çawa birêxistin bikin? Eger rêza hevalan ji bo vê doxtrînê hebe, wê vê çawa birêxistin bikin? Wê sazîbûna siyasî ya vê çawa pêk bînin? Ma hostayan ev mijar çawa çareser kirine, di vê mijarê de çi kirine? Îro zêde ne mumkîn e ku şexsên vê nizanin, weke pêşengên sosyalîst derkevin holê.

Dibe ku heval pir baş nekarîbin hasasbûna sosyalîstan, manewiyata bilind a sosyalîstan, asta cesaret, merdî, zanebûn û fedakariya sosyalîstan fêm bikin. Lê divê neyê jibîrkirin, ev îdeolojî bi misogerî ji mirov taybetmendiyên bi vî şiklî dixwaze. Bi zanebûn, bi cesaret û bi taybetîmendiya xwe ya çareserkirina pirsgirêkan, kesên bêhempa an jî kesên mînak in. Hevalên vê rewşê najîn helbet ne mimkûn e da ku bi şiklekî cidî pirsgirêkên sosyalîzmê nîqaş bikin. Îro em dibînin ku pir zêde kes li ser pirsgirêkên cur bi cur ên sosyalîzmê nîqaş dikin, lê ti kesî nekariye vê veguherîne şiklekî ku mirovahî dixwaze, nekariye têkoşîna ku mirovahî dixwaze pêş bixe û xwe bide ber.

Nekare ku bi vî şiklî çarenûsa (kader) sosyalîzmê were bidestgirtin: Li aliyekî wê welatek di bin mêtingerî û darê zorê de were çewisandin, lê li aliyê din wê sosyalîzm bi van pirsgirêkan re eleqadar nebe an jî li derdora van pirsgirêkan here û were, hewl bide da ku roja xwe derbas bike! Li cîhanê, dibe ku bi her cur îdeolojî bi vî şiklî tevbigere, lê belê sosyalîzm ti car nikare bi vî şiklî tevbigere. Dema sosyalîzm dikeve nav gelên di vê rewşê de dijîn, dişibe qutiyeke tijî dînamît. Wê bi teqînên li ser hev û timî, bi derkirina birînên nem girtî yên di nav wê civakê de ji xwe re rê vebike. Em dest berdin ji sosyalîzmê, eger di dîrokê de were bîra me; şert û mercên ku dîna Îslamê tê de derketiye holê, teqînên ku avabûna wê afirandiye û şerên ku wê jêre rê vekiriye, çendî zêde

ne. Hê dema em îro lê dinêrin jî, di dîrokê de çendî zêde bûyerên siyasî yên ku me matmayî dihêlin pêk aniye. Heta îdeolojiyên em jêre "dîn" dibêjin ku em pir sivik lê dinêrin jî di dîrokê de ewqas zêde şerên siyasî pêş xistine, ewqas zêde mirov li dora xwe kom kirine, ewqas zêde gel rakirine ser piyan. Em ê hem bêjin, sosyalîzm îdeolojiya herî nirxdar û herî pêş ketiye û hem jî tevî ku ev îdeolojî li welêt di nava gel de bi salan e dixebite, wê ji ti tesbît û pevçûnên cidî re rê veneke! Ev, nabe ku sosyalîzm be an jî sosyalîzmeke bi vî şiklî ne sosyalîzm lê tiştekî din e; mezhebek e an jî karîkatoreke sosyalîzmê ye.

Eger heval di sosyalîstbûnê de bi biryar bin, di weke sosyalîstekê/î jiyînê de xwediyê îdîa bin, mejbûr in da ku hemû aliyên xwe yên paşde mayî bînin ber çavan, rêxistinbûnên ku sosyalîzm dest nîşan dike û têkoşînên wê qebûl bikin. Mirov zanebûnê dixwazin, mirov fedekarî dixwazin, mirov cesaretê dixwazin, heval neçar in, heya karibin pêk bînin vê bikin. Eger nikarin vê pêk bînin, aşkere ye ku ew ê ji hev bikevin û sosyalîzm wê di destê wan de weke mezhebekê lê were. Vaye, divê em ji ber vê yekê timî li vî welatî serberzî û rumetdariya sosyalîzmê di ser her tiştî re bigirin. Weke grubek ku sosyalîzmê, sosyalîzma zanistî diparêze, pêwîst e em bikaranîna di pirsgirêkên siyasî de û bikaranîna di mijara taktîkên şer, birêxistin û têkoşînê de bi şiklekî herî paqij an jî bi şiklekî herî rast vê fêm bikin. Pêwîst e, em, di vê mijarê de hemû tiştên sosyalîzm ji me bixwaze pêk bînin.

Rêxistinbûn yek ji van mijaran e. Hê di derketina xwe de, mînak di salên 1800-1848'an de ji bo gelan Manîfestoya Komînîst derketiye. Di salên 1889'an de partiyên herêmî yên cuda derdikevin. Enternasyonala Duyemîn, Partiya Bolşevîk, Enternasyonala Sêyemîn û gelek partiyên komînîst ên her ku diçe zêde dibin. Yanî em dixwazin vê diyar bikin: şexsên doxtrîna sosyalîst qebûl kirine, hê di rojên destpêkê de –em dest berdin ji deh salên pêşerojê re hiştinê-, hê dema ku nû bi vê îdeolojiyê re

dikevin têkiliyê, ji xwe re weke rêgezekê qebûl kirine ku rêxistinbûneke merkezî biafirînin û weke rêxistineke merkezî tevbigerin.

Ev, ji ber çi wisa ye? Cewhera vê îdeolojiyê îqtîdara siyasî hedef digire. Ev îdeolojî, dixwaze gelan ji her curê çewisandina (baskı) siyasî û kedxweriya ekonomîk rizgar bike; ji ber vê yekê neçar e hê ji roja destpêkê de bi şiklê merkezî xwe bi rêxistin bike û di vê mijarê de pisporbûna xwe pêş bixe. Eger wisa neke îdîaya ku diparêze, ji bûn îdîayekê derdikeve, ji bo wê bi xwe ketina rewşa mezhebekê, dibe rojev. Lê sosyalîzm jî vê qebûl nake. Bi dayina têkoşînên îdeolojîk ên bi timî li dijî gelek revîzyonîstên ku dixwestin sosyalîzmê daxin asta mezhebekê(weke Kautsky û Troçkî ku ji van ên sereke ne), timî kariye ev cewhera vê îdeolojiya şoreşgerî were parastin. Yên ev cewhera şoreşgerî parastine, karîne ku ji destpêkê ve ji pêşketineke siyasî re, ji şerekî gelerî re rê vebikin. Lê dema ku, ev, ji şikil û cewherê wê yê şoreşgerî dûr xistine û kirine benûşt, wê demê jî bi rastî ev îdeolojî, weke şiklekî oportunîzmê li ber têkoşîna gelan bûye astengeke girîng.

Em ne zêde xwediyê dîrokeke kûr in. Eger ev dîrok were lêkolînkirin, pênc şeş salan derbas nake. Her kes jî dizane ku di vê pêvajoyê de di pêşketina taybetmendiyên me yên weke fedakarî, bi zanebûn, cesaret tevgerînê de tesîreke diyarker a şert û mercên paşdemayî yên welêt hene. Kariye di vê mijarê de gavên girîng werin avêtin, me kariye biavêjin. Ji ber çi me ev gav avêtin? Ya rast, me karîbû bi saya hêza ku baweriya sosyalîst daye me, em van gavan biavêjin. Ev, nikare bi ti tiştê din were tarîfkirin. Dema em pênc şeş-salan di nav pêvajoyeke ewqas giran re derbas dibûn, me ti car pirsgirêka rêxistinbûna merkezî ya Marksîzmê ji bîr nekir, me pêwîstiya sosyalîstan a bi şiklê, hê ji roja destpêkê pê de weke partiyeke xurt a merkezî rêxistinbûnê ji bîr nekir. Ti kesî, kêliyekê jî ji mejiyê xwe ev pirsgirêk neavêt. Dihate gotin ku, divê bi misogerî ev were gihandin asta rêxistineke merkezî' lê şertûmercên em di

nav de bûn ti car derfet nedidan da ku em wezîfeyeke bi vî şiklî pêk bînin.

Ev erk û wezîfe, wê rojê jî hebû, îro jî heye. Îro, em di şertûmercên hineke din pêşketî de bi çareserkirina vê wezîfe û erkê re rû bi rû ne. Ji ber vê yekê nekare ev erk û wezîfe weke erk û wezîfeyek ku ji nişka ve derketiye were dîtin û ne jî weke helwestek ku ji sosyalîzmê nayê hêvîkirin, helwestek ku sosyalîzm hêvî nake were dîtin. Berevajî, me dizanî ku ev pirsgirêk li gorî cewhera sosyalîzmê ye, bi rêxistinbûn pirsgirêkek esasî ya îdeolojiya sosyalîst e, sosyalîzmeke bêrêxistin naye fikirîn. Ji ber van sedeman em ti car xerîbê vê pirsgirêkê neman, em ti car bi xof nêzî vê pirsgirêkê nebûn. Bi qasî hêza me heye, me pê bawer kir ku pêwîst e em demekê ji beriya demekê vê bûyerê çareser bikin.

Raboriyeke (geçmiş) me ya bi qasî pênc-şeş salan heye, dibe ku ev ne demeke zêde be. Lê, ya rast ew e; di afirandina rêxistineke merkezî de ne demek ku bi vî şiklî were dirêjkirine. Eger em hê jî dirêj bikin, xetere heye da ku em bikevin rewşa klîkeke entelektuel. Eger dîroka hemû partiyên komînîst ên cîhanê were lêkolînkirin, bi taybetî jî eger dîroka rêxistinbûna komînîst, şoreşger û heta welatparêziya radîkal were lêkolînkirin, eger rêxistinên cur bi cur ên têkoşînê yên li van welatan berê xwe didin şer û têkoşînên germ, wê were dîtin ku ev rêxistin pêş dikevin û dibin ji pola; eger ev nebû jî wê were dîtin ku ev rêxistin belav dibin û dibin klubeke rewşenbîran, dibin şiklekî oportunîzmê.

Îro, pêşketina me ya di vê pêvajoyê de di çi astê de ye? Belê, di aliyê kalîtê de, di aliyê hêjmarê de qederekê pêşketin hatin çêkirin û karibû bi hin pratîkên wiha jî hinekê xwe pêş xîne. Lê niha rewş çawa ye? Pratîkên bihêz, ji me li hêviya çareseriyê ne, lê ji ber bêrêxistinbûnê qasî bi têrê dike bi van pratîkan re mijûlbûn çênabe. Di vê rewşê de tu yê çi bikî? Eger tu bixwazibî pêş bikevî, tu yê li aliyekî rêxistinbûnên hene bigihînî asteke merkezî û li aliyê din, tu yê di nav şerê germ de van rêxistinbûnên xwe bipêjînî û bikî ji pola.

Eger wisa be tê maneya ku wezîfeya te ya li hember sosyalîzmê hatiye bicihanîn an jî weke pêşengeke/î sosyalîst, tu yê xwe bi gelan û qada navneteweyî bidî qebûlkirin. Lê eger tu vê nekî, wê çi bi te were? Tu yê weke karîkatoreke rewşenbîran derkevî meydanê û xwe biqedînî. Em nikarin encama xebatek ku me evqas tê de ked daye, bi vî şiklî biçûk bihêlin. Eger xebatek ku tê de evqas ked hatiye dayin were tinekirin jî, tenê em dikarin bi merca ku di nav şerê germ de pêk were, vê qebûl bikin. Helbet em naxwazin di qonaxeke hê pêşketî de bêyî ku pirsgirêkên xwe yên rêxistinî yên merkezî çareser bike, bêyî ku bikeve nava têkoşîna germ, weke ji ber bêcesaretbunê û ji ber pêş xwe nedîtinê, hema ji ber xwe belav be. Yanî hezar carî em pê qebûl in ku quweta me di nav şerê germ de tine be, lê em ti car qebûl nakin ku hema ji ber xwe belav be. Em, vê, weke şiklekî zêde gaviya bêşerefî û elçaxtiyê dizanin.

Eger em hinekê mercên serdemê, mercên welatan û gelan bînin ber çavên xwe, wê bê dîtin ku ji ketina nav organîzasyoneke siyasî ya hê bilindtir, ti riyên me yên din nemane. Pêşxistina organîzasyoneke siyasî ya bilindtir jî, bi yekîtiyeke rêgezên siyasî ku rastiyên serdemê, rastiyên welêt ji xwe re esas digire û ji wan ne qut e dibe. Aşkere ye ku ji bo pêkanîna van rêgezan jî neçar e rêxistinbûneke qeyim were pêkanîn. Êdî ji vê pê de pirsgirêk ew e ku, şiklê vê, îlegalîteya vê, amûrên di dest de, pisporbûn, karbeşî (iş bölümü) wê çawa were pêkanîn. Kadroyên wan karan dikarin van hemûyan pêk bînin. Di aliyê şikil de bi vî şiklî bûna van, ti car nikarin bibin asteng da ku em berê xwe nedin rêxistbûneke cidî an jî pirsgirêkê bi şiklekî cidî negirin dest.

Bêyî ku were bi dest girtin, ti car nehatiye dîtin ku ti pirsgirêk ji ber xwe çareser bûne. Hemû pirsgirêk di pêvajoyeke kamilbûnê ya demdirêj de hatine çareserkirin. Rêxistineke qeyim tenê dikare di nav pêvajoyeke pratîkê de bibe kevneşopî û bi temamî şikla xwe qezenc bike û biafirîne. Lê, hem em ê ji bo vê bi cesaret tevnegerin û di vê mijarê de hewldaneke bêhempa nîşan nedin û hem jî em ê

rojekê, xwe di nav rêxistineke kamil de bibînin! Ma tiştekî wiha dibe? Ne mimkûn e. Ev, li berevajiya xwezaya made (madde), li dijî cewhera pêşketina made û li berevajiya cewhera diyalektîkê ye. Eger mirov karibe behsa tiştekî wisa bike jî, dibe ku ev şiklekî fikra metafîzîk, şiklekî fikra îdealîst û weke bermayiyeke bi şiklekî îdealîst şîrove kirina xwezayê di mejiyê me de bisekine. Ti car bi rastiyan re li hev nake

Ev tê maneya ku pêwîst e, em ji vê encameke wisa derxin: Piştî ku me sosyalîzm weke doxtrînekê qebûl kir, me yê an pêwîstiyên vê pêk anîbana û pêş ketana an jî bêyî ku me pêwîstiyên vê pêk bianîna, em ê biketana rewşa karîkatorên rewşenbîran. Eger em ya rast bêjin, me karîbû em di pratîka xwe ya heya îro de, her çendî ji teorî û pratîkê hin qutbûn û nebesî hebe jî, şiklekî jiyanê yê ku sosyalîsteke/î ji rêzê karibe qebûl bike, pêş bixin. Me karîbû amadekariyên ku karibe navarok û şiklê rêxistinbûneke sosyalîst pêş bixin, pêk bînin û me di vê mijarê de pêşketineke diyar jî çêkir. Lê em dikarin bi hêsanî bêjin ku ji vê pê de jî bi vî şiklî meşandin wê zehmet be, yanî zêdebûna di aliyê hejmar de, wê maneyeke hê zêdebûna weke gruban nebe an jî bi vî şiklî dane meşandin her ku diçe wê bibe sedema belavbûnê, pasîfîzebûnê û dîsa em nikarin bi vî şiklî li ber astengên li beranberê xwe bisekinin, em ê ji aliyê van astengan ve bi taybetî werin parçekirin û bi xetereyên mezin re rû bi rû werin hiştin.

Ev tê maneya ku em ji bo karibin ji xetereyan xwe biparêzin, ji bo em karibin bi astengên pratîkî yên mezin biwêrin, neçar e ku em berê xwe bidin rêxistinbûneke cidî. Pêşketina şiklên nû yên şer, têkoşînên zindanan, heya gelek şert û mercên weke ketin zindanan û her ku diçe di pevçûnan de jiyana xwe ji dest dan, ji me li benda rêxistinbûneke xurt e. Eger ev rêxistinbûn nikaribe were avakirin, ji bin vê berpirsiyariya giran neyê rabûyîn wê organîzeya heye ji hev bikeve, dema ji hev ket jî, wê ev rêxistin careke din bi hêsanî nikaribe bi ser xwe ve were. Ji ber vê yekê êdî em neçar in

zanebûna xwe, kesayetiya xwe bi ser hev ve bînin, hemû aliyên şert û mercên neyînî yên em di nav de ne bizanin, hemû kêrhatinên mirovahiyê bi kar bînin û berê xwe bidin rêxistinbûneke sosyalîst. Ya rast, fikreke weke "*acele hatiye kirin*" an jî *"em ê nikaribin wezîfeyeke wiha pêk bînin"* oportunîzm e, an jî ferasetên burjuwa yên ku sosyalîstek nikaribe qebûl bike ye.

Ya rast li aliyê din pirsgirêkeke rêxistinî ya bi vî şiklî weke xaçepirsekê (bilmece) çareser kirin jî bêmane ye. Sosyalîzm îdeolojiyeke hêsan û xwerû (sade) ye. Belê, em weke ku xaçepirsekê çareser bikin pirsgirêkan tînin vir. Li ser hin peyvan, dîsa li ser mijarên pir zelal û aşkere bi seatan nîqaş tê kirin. Lê ev, nîqaşên bi wî şiklî ne; ti nirx û qezenca wan nîne. Rêgezên doxtrîna sosyalîst zelal in, rêgezên rêxistinbûna vê jî pir hêsan û zirav in. Lê tijîkirina navaroka vî şiklî jî dibe ku karê mirovê herî pêşverû yê serdama me be. Eger heval xwediyê îdîa bin, dikarin vê hedefê bi dest xwe ve bînin. Wê vê bêjin; *"xizmetkarbûn û bêkesayetbûna rewşênbîrên Kurdistanê û ji derveyê pêşketinên polîtîk jiyîna rewşenbîrên Kurdistanê, ji ber kêmbûna pêşketinên civakî, civakî nebûna rêwşenbîrên Kurdistanê, ji ber van hemû sedeman îhtimala zehmetiyên ev kes bikevinê û zêde nikaribin pêş bikevin..."* Belê, eger weke çarenûsê li vê were nêrîn, mafa jiyanê ya van derdoran jî nîne. Eger ev hemû wê weke qeder werin qebûlkirin, wê demê em hê jî çima têkoşîna siyasî qebûl dikin, sosyalîzmê çima qebûl dikin?

Dibe ku di nava şerê germ de jî, di nava mercên aştiyê de jî rêxistinbûnên sosyalîst çêbin, dibe ku di nav neteweyên biçûk de jî neteweyên mezin de jî çêbin, dibe ku zêde materyal jî bi kêm materyal jî çêbin, dibe ku bi zêde kadro jî bi kêm kadro jî çêbin, dibe ku ji aliyê pêşengên xurt ve jî û li gel vê dibe ku ji aliyê sosyalîstên ji rêzê ve werin çêkirin. Cudahiyên di vê mijarê de, ne zêde diyarker in, ne mercên wiha pir xurt û pir girîng in. Ev, hê zêde, bawerî û fedekarî, hinekê cesaret û têkoşîn dixwaze. Dema ev merc hatin pêşwazîkirin, wê karê rêxistineke sosyalîst bi hêsanî

bimeşe. Lê, pir xwîn wê birêjînin, zehmetî bikişînin, di cih de bikevin zindanê, di cih de birîndar bibin, birçî bimînin, pir biwestin, dibe ku ev hemû pêk werin. Lê mercên ku min niha anîne ziman, ev jî rêxistinbûneke sosyalîst e an jî wê bi vî şiklî rêxistinbûnên sosyalîst jî pêk werin. Em nikarin zêde dirêj bikin, yanî eger em hê jî vê komê bi vî şiklî bimeşînin em ê çi bikin? Hê zêde kom, hê zêde mirov, hê zêde pirtûk xwendin, lê di aliyê rêxistinkirinê de pêşneketin. Dibe ku me hê zêde jî bi hewldanên şexsî gelek têkilî çêkiribin, lê em nikarin bi van pesna xwe bidin. Aşkere ye ku ev berhemên derketine holê pir sînordar in, tenê asta amadekariyeke diyar îfade dike. Aşkere ye ku em bi van amadekariyan hê zêde ji bo erkên cidî, ji bo encamên hê mayînde û hê peşverû xwe amade dikin.

Di pêvajoya piştî vê de, amadekariyên ku demeke dirêj berdewam kirine veguharandina pêkhateyeke hê pêşketî û her wiha têkoşîn zivirandina pêvajoyeke hineke din teknîkî, hineke din modern, bêyî ku zêde wendahî werin dayin, bêyî ku enerjiya ewqas mirov vala were derxistin, li ser her kesî/ê wezîfeyên diyar ferzkirin û hem di çarçoveya civakî de û hem jî di qada çapameniya dîtinî (görsel) de hê zêde acîl tevgerîn, wezîfeyeke dîrokî ye. Di aliyê serdemê de şiklê herî destdayî yê şer, têkoşîn û rêxistinê ev e. Ev, şiklekî xebatê yê ku gel jî ji me herî zêde dixwaze ye. Pêwîst e hevalên ku bibin endamê vê kêrhatinên xwe li gorî vê pêş bixin, bibin pêşengên vê yên bi zanebûn tevdigerin û di vê mijarê de bi fedekarî tevbigerin. Eger wisa bibe, wê ev kar bimeşe, ma çima nemêşe? Lê belê eger nebe, yanî eger mirov xwe jidil tevlî neke, eger hinekê bibe kole, serhişk be, helbet ev pêk nayê, wê nikaribe di vê sosyalîzmê de bimeşe.

Pêkhateya (yapı) me ne pêkhateyeke wiha ye. Asta baweriya hevalan, asta fedekariya wan bi şiklekî acîl rexistinbûneke sosyalîst divê. Tevî xwîna ku hatiye rijandin, zehmetiyên hatine kişandin, ewqas serpêhatiyên (tecrube) bi êş ên hatine jiyîn, eger em hê jî nikaribin berê xwe bidin rêxistinbûnekê, wê dîrok me efû neke.

Niha em bi rehetî dikarin bêjîn; ji bo me, neçar e ku rêxistinbûneke sosyalîst hebe û bi rêxistinbûneke reformîst û sist ev nayê halkirin, îdeolojiyeke sosyalîst dikare bi hedefên siyasî yên cidî re mijul be û ji bo ku ev hedefên siyasî yên cidî werin pêkanîn jî, pêwîstî bi bûn rêxistineke cidî, rêxistineke komînîst heye. Em dikarin bêjin ku li ser vê mijarê nîqaş kirin jî ne di cih de ye. Belê, em ê bi misogerî hin qanûnên vê pêş bixin, lê helbet wê bi vê jî dawî li karan neyê. Divê em li ser zêde bikin ku pêwîst e rêxistineke sosyalîst a xwe gihandiye sîstemeke diyar a qanûn û rêgezan, ji xwe re hedefên pir cidî diyar bike û li aliyekî rêxistinbûnên cidî pêk bîne û li aliyê din jî rêxistinbûnên xwe yên din bi şerekî germ re bike yek.

Erkên rêxistinî yên herî girîng ên li pêşberî me jî ev in. Çareserkirina van erk û wezîfeyan, berpirsiyariyên herî acîl yên roja me ya îro an jî yên tevgera me ne. Em dikarin ji hevalan re bêjin, pirsgireka we ya herî acîl û weke hedefa herî biçûk a rêxistinî ew e; bi merca ku ji rêxistinbûn û bitaybet jî ji pêkhateya merkezî dest pê bikin hûn ê her ku diçe komîtebûna bi şiklekî merkezî ya ber bi jêr ve pêş bixin. Vê jî, bi pêşxistin û rêxistinên civakî yên cur bi cur û bi pêşxistina rêxistinbûna kadroyên şervan ên cur bi cur bimeşînin, her ku diçe bi hemû endamên xwe bidin qebûlkirin û her wiha di nav pêşketinên siyasî yên welêt de, di nav pêşketinên civakî de heza xwe ya pêşeng derxin pêş û weke hêzeke pêşeng tevger bikin.

Dema vê grubê berê xwe dabû pratîkê, tevî hêviyên me qederekê fikarên me jî hebûn. Tiştekî wisa hatiye kirin ku me beşeke mezin a jiyana xwe mehkumê vê hedefê kiriye. Ev helbet girîng in, hemû komînîst jiyana xwe fedayê dozekê dikin, birastî jî feda dikin. Ew dikarin, ne serasera, hemû jiyana xwe, ne tenê ciwantî û hin aliyên xwe, hemû hêza xwe ya madî û manewî fedayê dozeke wisa bikin. Di vê mijarê de qederekê mînak hene. Helbet me jî kariye di asteke pêş de, di çarçoveya vê hedefê de ji bo em karibin kesayetiya xwe fedayê dozekê bikin cesaret nîşan bidin. Ev ne cesareteke hişkeber e: gelek sedemên dîrokî û faktorên civakî

hene ku vê cesaretê diafirînin. Bi sentezeke van hemûyan kirinê, me biryar daye ku em bibin endameke/î dozê.

Li gel vê, helbet di her dozê de endamên wê, şexsên ku wê dozê dikin hene. Me jî hewl daye bi hejmareke sînordar a kesan vê pêk bînin. Di dîrokê de hema bêje hemû dozên pîroz, hemû dozên ku bi şiklekî azad pêşketin û serxwebûna gelan tînin ziman, kêm an jî zêde ji aliyê hevalên bijarde (seçkin) yên wê dozê ve tên parastin. Ev kes serkêşiyê dikin, di refên pêş ê têkoşînê de cih digirin û hemû jiyana xwe bi vî şiklî, ji bo ku bibe mînak pêşkeş dikin. Pir tiştekî ji rêzê ye ku tiştê di hemû dozan de endamên wan pêk aniye, tiştê îro hemû komînîst pêk tînin, divê ku em jî pêk bînin. Em nikarin bi gotinên weke *"her kes berjewendiyên xwe difikire, her kes ji ber pîşeya (meslek) xwe şoreşgerî dike"* an jî *"her kes hem şoreşgerî dike û hem jî girêdanên xwe bi civakê re didomîne"* pîvanên xwe yên bingehîn piştguh bikin. Ya rast ew bû ku hewce dikir, me pîvanên vî karî fêm bikirana û qebûl bikirana, zanebûna ku pêwîst dikir, cesaret û fedakariya ku ji me hêvî dikir me nîşan bidana û helbet diviyabû, me li gel vê bi xwe re hêza jiyanê çêbikira.

Tevlîbûnên berê, çawa ku moraleke mezin didan me, her wiha jî baweriya me xurt dikir ku wê hêzeke mezin tevlî bikin û bibin şexsên mezin ên şopdarê dozê. Lê di demên dawiyê de rewş hinekê guhert. Dibe ku hejmara sempatîzan û têkiliyên me gihiştibe bi hezaran, dibe ku em niha karibin nêzî pênc hezar kadroyên şervan jî derxin, lê belê weke berê, weke nirxeke mezin a pîroz li dozê nêrîn nîne. Dîsa, em, nêrîna xwe ya li pratîka van hevalan, li pratîka xwe û li pratîka hin hevalan, didomînin. Li holê hin pratîkên hatine afirandin hene, dema em reftariyên (davranış) hin kesan tînin ber çavên xwe em dibînin, ku ji feraseta şiklê van têkiliyan pir cidî û nirxdar dîtinê dûrketinek heye. Baweriya me pê nîne da ku ev, çavkaniya xwe ji sosyalîzmê, ji sosyalîzm li ser dîroka civakî û jiyana civakî ya îro pêkanînê digire. Hê zêde em dibêjin, ev, çavkaniya xwe ji hemû bermahî û pîsayetiyên civakî yên ku di nava me de hebûna

xwe diparêzin digire. Bi rastî jî, ev ne rastiyek e ku sosyalîzm, otorîteyeke sosyalîst karibe qebûl bike. Dixwaze bila ji mêtingeriyê, dixwaze bila ji helwestên hevalan ên ku ji tesîrên civaka kevin çavkaniya xwe digirin bin, baweriyeke wiha peyda dibe; dibe ku di nav pratîkeke wiha de hin pratîk me paş bixin û dudiliyê biafirînin, ji ber vê yekê dibe ku keramet û nirxa vê riyê fêm nekin, şaşitiyên biçûk bikin û wê her wiha asta pîroziya vê dozê xirab bikin. Helbet ev jî bi şiklekî cidî me dixe nav fikaran.

Mirov dikarin jiyana xwe bixin xizmeta dozekê. Di dîrokê de mînakên vê pir in. Ev sekin, tenê ya nijadê mirov e. Lê aşkere ye ku, eger di nav dozekê de xirabûn an jî li gel kadro û hevalên wê, di mijarên hema bêje weke di her aliyê de zîrekî, zanebûn, cesaret, karên xwe bi xwînsarî meşandinê de xirabûnek, di nava xwe de sekinînek, nêzîkbûnên sivik an jî têra xwe biaqil tevnegerîn, yanî eger tiştên em karibin jêre bêjin tiralî û li ser keda hevalê xwe jiyîn hebe, helbet em ê nava vê pêkhateyê lê bikolin, eger hebin meyl û helwestên çewt, kesê li ser ketina riya çewt e, wê hewce bike ku em van tesbît bikin.

Em keştiyekê bifikirin; em bihesibînin ku di okyanusek ku bager û pêlên pir mezin rabûne de dimeşe û tê de bi hezaran mişk hene an jî hin cihên wê avê vedidizin. Di hin qeliştokan re bêrawestan av dikeve keştiyê... Bi kurtahî hin tiştên di nava keştiyê de hewl didin keştiyê ji vir, ji wir qul bikin û binoqînin avê. Bi misogerî di nav keştiyê de xetereyek heye. Eger ev keştî di okyanusê de bixwaze bi pêş de biçe lê di nav de tiştên wiha keştiyê dikojînin (kemirmek) û hewl didin wê binoqînin avê hebin, hewceye bi misogerî em ji vê re li çareseriyekê bigerin an jî herî kêm hin hişyariyan pêş bixin.

Şoreş riyeke wiha ye ku xetereyên tê de, ji yên okyanusan hê zêdetir in. Pêvajoya şoreşê, pêvajoyeke wiha ye ku di vê demê de ji okyanusekê zêdetir bager radibin. Ji ber vê rewş ê; aşkere ye ku pêwîst e em weke endamekî/ê keştiyê, bi şiklekî pir qeyim keştiyê li beramberê her curê xetereyan biparêzin, bi taybetî hemû

helwestên hewl didin keştiyê ji nav de hilweşînin, hemû meylên ku wezîfeyên xwe li gorî tê xwestin pêk naynin ji holê rakin. Dikare were gotin, *"Hin tişt pêk hatine, têkoşînê karibûye hin encaman derxe holê, ji ber ku mirov jî di astekê de tatmîn bûne, di astekê de gihîştine armanca xwe, weke berê bûyî ji bo têkiliyên nêzîk zêde girîngî nayê nîşandan."* Lê ev nikare were qebûlkirin. Ji ber ku em weke şexsên sosyalîst bi navgîniya sosyalîzmê ji naskirina xweza, civak û dîrokê timî kêfxweş dibin.

Helbet em fêm dikin ku pêkhateyên ji aliyê mêtingerî û feodalîzmê ve hatine afirandin yên ji derveyê mirovbûnê û pêkhateyên ku dilê mirov dikin kevir, morala me têk biriye, di me de moral û nirxên mirovahiyê nehîştine. Lê belê eger li aliyê din jî quwetên bi vê pêkhateyê re şer dikin layiqê vê têkoşînê nebin, zehmetiyên vê têkoşînê fêm nekin û li gorî vê alternatîf pêş nêxin, helbet mirov neçar e da ku xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bikin an jî divê herî kêm mercên têkoşînê ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Lê dikare ev were gotin; pêşketineke diyar, di mirovahiyê de timî ye. Heta di xwezayê de mirov hebûna herî zêde meyldarê pêşketinê ye. Di gerdûna madî de, di gerdûnê de ji bo xwe nû kirinê hebûna herî vekirî mirov e an jî taybetmendiyên mirov e, mejiyê mirov e, pêkhateya moralê ya mirov e. Lê belê, divê xwe nû kirina mirov bi misogerî di nav çarçoveyeke îdeolojîk û siyasî de were pêkanîn. Ji derveyê pêkhateyên heyî yên îdeolojîk û siyasî, bi xwe nû kirinê fikirîn ne mimkûn e. Şexsên dest bi doz û têkoşîneke diyar kirine, ne mimkûn e da ku ji derveyê platformeke îdeolojîk-polîtîk xwe nû bikin. Tenê maneyeke vê heye: bêxemiya burjuwaziya biçûk. Dibe ku sedema tengavbûna burjuwaziya biçûk, fikra wan a bi şiklê *'bi jiyaneke hêsan, ser tirsa ji jiyan û civakê girtin'* be.

Em, tevî ku li Kurdistanê şiklekî têkiliyên pir xurt û bi nirx tê dîtin, ji hevalbendiyên bêhna ehbab çawîştî jê tê, ji her şiklê têkiliyên eşîrî yên malbatî, bi taybetî ji van têkiliyên ku cewhera xwe ya demokratîk înkar dikin, ji hemû ferasetên ku cewhera

demokratîk ji bo têkiliyên xwe yên paşverû yên malbatî ji bo têkiliyên xwe yên berjewendî û ji bo têkiliyên xwe yên kesî bi kar tînin, pir dijwar jê nefret dikin. Têkîliyên ku bi vî şiklî xwe dispêrin malbatî, xismatiyên ku xwe dispêrin ehbab çawîştî û di asteke diyar de herêmtiyê, têkiliyên bi wî şiklî ne ku ti wateyan wan nîne. Gelo ev ji ber çi wiha dibe? Di aliyê zêhnî de be jî, di aliyê hestan de be jî, dibe ku pêşdîtinek be jî, divê ev li Kurdistanê bi misogerî di rola tesîra vê ya xirabkirinê ya li ser jiyana civakî de were lêkolînkirin. Kes, li pêşberî hev ne bi şiklê profesyonel weke endamên dozekê; bi temamî bi têkiliyên ku civaka me bi kûranî dijî, yên weke têkiliyên klan, eşîr û qebîle ku her şiklê pêşketina demokratîk neteweyî dixetimîne û bi têkiliyên herêmî bi hev ve tên girêdan. Ev yek, qederekê me dide fikirandin û dihêle em pê ne rehet bin.

Ji bo ku em karibin vê taybetmendiyê bi misogerî di nav rêxistinê de tasfiye bikin, me têkoşîn meşand. Lê di vê qadê de gelek tiştên ku were kirin heye. Lêbele, divê ev were zanîn ku ev bi dîtinek hêsan an jî tedbîrek pratîkî ya bi şiklê *"ez ê xwe rast bikim"* nabe, pêwîst e di vê mijarê de kes, nûbûneke bi kûrahî bijîn, di qada çanda (kültürel) mirovahiyê de têra xwe amadekarî bikin û paşê, encamên herî bi sûd ên ji vê çanda pir berfireh bi dest bixin û bi nirxên li ser van axan re bikin yek. Piştî ku kesayetiyên bi vî şiklî derketin, mirov dikare li bendê be da ku rêzdarî û rêhevaltiyeke diyar çêbe.

Dibe ku li xwezayê, an jî dibe ku di nava civakê de be, di dîrokê de pir tişt hene ku mirov jê re rêzê digire û baweriyê bi heybeta wan tîne. Di vê mijarê de em xwe mezin nabînin, berevajî, li pêşberê van tiştên bi heybet ên di nava civakê de, di nava xwezayê de em biçûkbûna xwe dibînin û ji rewşa xwe nefret dikin. Lê ji ber ku me otorîteyeke diyar afirandiye, em nikarin xwe di bin siya wê de jî veşêrin û bi riya têkiliyên bi şiklî, em nikarin tesîra xwe ya li ser civakê hê jî mezintir bikin. Reftariyên (davranış) bi vî şiklî reftariyên biçûk in. Weke me daye diyarkirin, kesê ku dîroka civakê û

pêvajoyên pêşketina made baş fêm dike, ji van têkiliyan bi vî şiklî zêde tiştekê hêvî nake. Lê belê, wê li pêşberê van pratîkan helwesteke dijwar jî hebe. Helwesta evqas mirov ji nav ji nav zeîf dibe, beriya her tiştî eger kesek li pêşberê xwe bi hurmet be, bixwaze jiyana xwe manîdar bike, wê bi misogerî şerekî bimeşîne.

Li gorî me, ev ê bi şer çêbibe, em bawer nakin bi dostanî çêbibe. Wê bi misogerî şerek çêbe, ji bo nû kirina kesayetiyê wê bi temamî şerek çêbe lê em nabêjin, çi dibe bila bibe em ê di vî şerî de dest û lingan bişkînin. Dibe ku uslûba şer hinekê zêde dijwar be, lê belê ya girîng, eger faktorên di cewhera şer de, faktorên ku şer xwe dispêrê, faktorên ku hedefên şer in li ber çav werin girtin, wê xirabiya dijwariya şer ji ya tê hêvîkirin kêmtir be, heta wê tesîr neke jî.

Divê heval zanibin ku, ji derveyê îrade be jî, dixwaze bila sedemên pir mafdar bin an jî dixwaze bila sedemên pir neheq bin, sedemên pir girîng ên helwesta dijwariyê hene. Hewceye heval karibin vê bibînin. Ji ber ku ev pratîka me ya grubê jî, pratîkeke jiyanî ya gelek salan e, em van bi vî şiklî diyar dikin. Yanî em pir baş dizanin da ku ji vê/î hevalê/î re, ji helwestên wê/î re pêwîst e bi çi şiklî rêz were girtin. Ya rast ew e; em pir baş dizanin ku pêwîst e li ku derê, çawa, kingê rêz were nîşandan. Lê, em kêm an jî zêde dizanin ku derê kesekê/î seqet e jî. Di vê mijarê de, kêm be jî pîvanên me yên ku ne qure û egoîst in jî hene. Lê belê, hewce ye em pêşxistina kesayetiya hevalan, veguhertina kesayetiya wan, helbet ne weke birayekî mezin, ne weke rihsipiyekî an jî ne weke kesekî pir pispor, pêwîst e em vê weke fikirmendekî, kesekî dixwaze bi timî fikirên xwe pêş bixe bi cih bînin. Hêviya me ji her kesî/ê ev e. Timî fikirên nû derxistin û ev bi kesan dan qebûlkirin, di nav civakê de wezîfeyeke diyar e. Ev, fonksiyonên ku pêwîst e rewşenbîr û şoreşger pêk bînine û-eger neyê xirabkirin- fonksiyoneke girîng a gel e. Eger nirxa vê were zanîn, fonksiyoneke pir girîng e û dibe ku

di veguherîna civakê de, di pêşxistina civakê de bi rolên pir girîng rabe. Bi taybetî li gel me cihê vê pir girîng e.

Heval ji bo çi nikarin vê taybetmendiya me fêm bikin? Ne tenê taybetmendiyên me yên şexsî, ji bo çi nikarin taybetmendiyên sosyalîzmê yên di vê mijarê de fêm bikin? Ji ber çi nikarin li gel xwe, aliyên sosyalîzm yên weke zanebûna ku di mirov de pêş dixe an jî ruhê fedakariyê, ruhê cesaretê ku afirandiye, aliyên wê yên bi pisporî kar kirinê, bi şiklekî îlegal kirinê û dîsa, timî ev doz weke dozeke pîroz û mezin dîtinê, di asteke pir bilind de pêş bixin. Ji ber çi heval nikarin timî li gel xwe taybetmendiyên rêxistinî, taybetmendiyên şervantiyê pêş bixin? Eger nekarîne ku pêş bixin li gorî me, ev ê bi şiklekî bi sînor karên xwe pêk bînin.

Ev feraset (anlayış) bi misogerî şaş e: bêyî ku hedefeke îdeolojîk-polîtîk, pêkhateyeke rêxistinî were pêkanîn, eger heval weke gundiyan an jî weke mînakên mêrxasiya feodal derkevin meydanê, ev ji bo me dibe helwesteke karîkatorî û dibe ku were jiyîn jî. Ev heval di çi astê de baş dibin bila bibin, dibe ku çalakiyeke hêsan a ku di aliyê îdeolojîk, polîtîk, rêxistinî û hedefên siyasî de pir xurt e û ji aliyê hevaleke/î me ya/ê cuda ve hatiye pêkanîn, ji me re pir manîdar were. Em dikarin maneya ve ya kûr fêm bikin. Em dikarin ferqa û cudahiya di navbera çalakiyên bi vî şiklî û çalakiyên ji vê bingehê bêpar in de fêm bikin. Di jiyanê de gelek bandorên çalakiyan ên weke polîtîk, civakî, îdeolojîk hene. Eger, mirov nikaribe encamên çalakiyên xwe bifikire, wê demê ferqa wê/î ji gundiyekê/î namîne .

Lê, divê helbet ev hebin. Ya rast ew e ku eger mirov bi vî şiklî tevbigerin, ji bo çalakiyên xwe hedefên îdeolojîk, siyasî diyar bikin û vê bigihînin asteke diyar a rêxistinbûnê û hemû tedbîrên xwe li gorî asta dijmin jî bigirin, eger di vê mijarê de jî çalakî li darxin, wê ti kes peyda nebe da ku ji vê re rêz negire, ji vê kêfxweş nebe. Di vê mijarê de zêde tişt hene da ku gelek qezenc bike. Ti kesa/ê vê înkar bike jî nîne.

Rewşa me, di vî aliyî de girîng e: li gel komînîstan timî fikra ekîbekê, fikra komîteyekê heye. Bi taybetî eger em ê di pêvajoya pêş de ji nû ve berê xwe bidin bi rêxistinbûnekê, divê heval vê bigirin ber çavan: stîla min a xebatê an jî şiklê nêrîna min li bûyeran, taybetmendiyên min ên tevgerînê girîng in. Divê ji nav van hevalan ekîbek derkeve ku karibe bi min re kar bike û mijara, ew ê karibe li gel min çendî bi hevsengî kar bike safî kiribe. Heta ya rast dive karibe ji bo vê jî cesaret were nîşandan: eger ekîbek ku bi şiklekî cidî li gel min kar bike çêbe an jî eger karibe ekîbek ku hê sûdmend çêbe, em dikarin rêxistinê bikişînin nav pozisyoneke hê cudatir. Lê eger di pêvajoya pêş me de, meşandina rêxistinê ekîbeke din bigire ser milê xwe, wê hê baştir bibe. Ez jî dikarim li hin qadên din, bi taybetî dibe ku di qada fikrî de hê zêde sûdê bidim.

Lê eger nikaribin vê cesaretê nîşan bidin, divê ev bi şiklekî misogerî were fêmkirin: ez li pêşberê xwe şexsên weke kuklayan ji her gotina min re dibêje *"erê"* naxwazim, li aliyê din jî şexsên bê mejî jî naxwazim, nikarim kesayetiyên ji bingeheke pêşneketî tên jî, qebûl bikim. Ez dikarim bi şiklekî herî giran jî, van kesayetiyan bînim rewşeke bê rûmet; divê ev timî ji min were hêvîkirin. Ji ber ku tê xwestin da ku qedera bi hezaran kesî were meşandin. Yanî dibe ku mirov di vê mijarê de şexsên wisa bike bin lingên xwe. Eger hewce bike, dibe ku tifî ser çavên yekî were kirin. Yanî, divê ku ev hemû werin hêvîkirin û dibe ku mirov di vê mijarê de rê û rêbazên herî dijwar jî pêş bixe. Bêyî ku di destê mirov de be, dibe ku mirov qeza jî bike. Divê, kesek bi zanebûna van hemûyan di ekîbekê de erk û wezîfe bistîne.

Di vê mijarê de rêza min ji hevalan re heye: taybetmendiyên wan ji bo min girîng in, rêza min jê re heye. Ji bo zererê nedim kesayetiya wan, helbet di çarçoveya berjewendiyên têkoşîna şoreşgerî de, çi pêwîst bike ez wê dikim û min kiriye jî. Lê eger na, bêyî ku rewşa min fêm bikin, baweriya wan hebe ku wê karibin

weke dilê wan dixwaze bixebitin, wê demê xuya ye xwe dixapînin. Dibe ku ez di vê mijarê de biqasî ku hûn nikaribin pê bifikirin û li bendê bin, bi şiklekî ecêb tevbigerim. Belê, dibe ku ez bi şêweyek ku hûn tiştekî jê tênegihîjin û fêm nekin, tiştan bikim. Ez ne kesekî wiha nezan û saf im, bi çavekî wisa li xwe nanêrim. Bi ev qas hevalî/ê re merhabaya me, hevaltiya me heye, yanî dibe ku me li gel hevalan baweriyeke weke *"em ne li bendê bûn, me pir pê bawer kir"* çêkiribe. Lê belê, divê zêde pişta xwe neyê dayin vê baweriyê an jî divê ev were zanîn; dibe ku ev bawerî bi pîvanên di bin tesîra kesayetiyê de ne, zêde an jî kêm were guherîn.

Em, zêde xwe mezin nabînin: dixwaze ji aliyê manewî ve be, dixwaze ji aliyên din ve be em xwe di asteke herî dawî de bihêz û têrê dike nabînin. Lê, em hewl didin da ku di vê mijarê de şiklekî jiyanê ava bikin. Divê heval jî şikla jiyana xwe û cesareta xwe nû bikin û her roj ji xwe re hêviyên nû biafirînin.

Jiyana me ya her roj, bûyerek e. Eger kesayetiya wan nebûyibe fosil û pê re kevirbûn çênebûyîbe, eger mezinahiya erka me ya veguherîn û afirîneriya li Kurdistanê tê fêmkirin, divê heval jî baş bizanibin ku pêwîst e her roj xwe nû bikin. Em pê ne bawer in ku heval nikaribin vê fêm bikin. Lê belê, divê ji nûbûnê, berê xwe dan helwestên (davranış) hêsan ên teqlîdwarî neyê fêmkirin. Bila nûbûn be ji çil salan carekê pêk were, lê divê birastî jî nûbûn be. Li şuna ku wiha be, bila nebe hê baştir e.

Ez dixwazim diyar bikim ku me di xebatên heya îro de bi hevalan re qet weke ekîbeke bihêz kar nekir. Ev dixwaze bila ji helwesta min were, dixwaze bila ji taybetmendiyên şexsî yên hevalan çavkaniya xwe bigire, lê eger em ê di demên pêş de wezîfeyekê bigirin ser milê xwe, em neçar in ku hev du baş nas bikin. Ez bawer im, jiyana me ya heya niha ya bi hev re ji bo ku em hev nas bikin delîlên girîng nîşanî me dide. Eger quweta analîzê hebe, em ê hev nas bikin. Mînak, me kariye em evqas heval, bi hezaran, bi deh hezaran heval çêbikin bînin gel hev. Eger balê

bikişîne, hûn bi xwe jî dibînin ku hûn durist in û zêde zêde baweriya we bi hev heye. Hûn bi qasî ku canê xwe bidin, bi hev bawer in; ji vê gumana me nîne. Lê, ya ku em dixwazin bêjin, di nas kirin û bawerî pê anînê de hin pîvan hene. Helwest, meyl û şexsên ku xebata pêkhateya van hevalan kêm bike, vê pêkhateyê bi şiklekî ji rê derxe jî, divê bi misogerî zanibin ku wê hê zêde nikaribin bijîn. Û divê ev kesayetî fêm bikin ku wê ji vê pê de bi şun de bimînin. Divê, fêm bikin ku dikarin li cihê layiq in bimînin.

Mirov bi dozên wiha naweste. Dibe ku di dozên wiha de hin bedel werin dayin, di asteke diyar de hin nexweşî çêbin, lê eger keseke/î bi moral be û hê jî rewşa wî/ê ya psîkolojîk zindî be, ev kes dikarin her roj xwe nû bikin, dikarin her roj enerjiya xwe ya têkoşînê biafirînin. Şexsên beşdarê vê pêkhateyê dibin, bi taybetî hevalên di têkoşîna Kurdistanê de xwediyê îdîa ne; ji ber çi nikarin hedefên xwe nû bikin, ji ber çi derbara armancên xwe de nikarin xwe bigihînin feraseteke (anlayış) zelal, ji ber çi nikarin bi xwe re zekayeke afirîner pêş bixin, ji ber çi hê zêde nikarin wêrektir bin, fêm kirin zehmet e. Lê belê em pê bawer in, wê ev heval timî karibin vê cesaretê nîşan bidin û zanebûna xwe nû bikin. Eger nikarin vê pêk bînin ev nîşan dide, wan hevalan ev doz fêm nekiriye û zanebûneke diyar a vê dozê li gel xwe çênekiriye. Em dibêjin; zeîfiya hemû rêbertiyên wan, ji vê yekê çavkaniya xwe wergirtiye û ji ber ku wan cewhera dozê fêm nekiriye, ev rewş bilez li ser girseyan belav bûye, bûye sedema gelek tesîrên neyînî jî.

Helbet em îdîa dikin ku li paş vê, pêkhateya civakî, siyasî û îdeolojîk jî heye. Yanî gelên ku têkoşîna sosyalîzm û serxwebûnê didin ev pêkhate neafirandine; berevajî, mêtingerî, feodalîzm û hemû saziyên îdeolojîk, siyasî ku wan bi şiklekî tevlihev çêkirîye, mejî û fikra wan, şexsiyetiyên me weke qîrê dorpêç kiriye. Ji vê zekaya bi qîrê hatiye dorpêçkirin afirîneriyeke zêde, ji vî dilê bûye weke qîrê jî coşeke zêde dernakeve. Kêm zêde em hemû di vê rewşê de ne. Lê ya girîng ew e ku bi hewldanên di vê mijarê de û bi

baweriya mezin a vê dozê, çewisîn û texrîbata ku civakê afirandiye were derbaskirin. Baweriya me bi hevalan pir mezin e da ku wê karibin vê pêk bînin.

## Wezîfe û Hedefên Me

Em dikarin hin pirsgirêkên ku me di vê pêvajoyê de jiyîne bigirin dest. Em dikarin bêjin nedîtina hin rastiyên bi vî şiklî ne mimkûn e: di navbera herêman de nebûna têkiliyan, pir bi hêsanî ketina zindanan, di qadên cûr bi cûr ên weke ciwan, gundî, jin, karker de xebat bi şiklekî çawa lê hato meşandin an jî xebatên van qadan bi cidî û weke layiqê wan qadan nemaşandin, di kadrobûyinê de rê û rêbazên cûr bi cûr bi karneanîn, asta çalakiyan daxistin heya asta çalakiyên ji bingeha îdeolojî û siyasetê bê par, ji aliyê rêxistinê ve negihandina kadroyên bihêz, nekarîna xwe bi rêxistinkirinê ya hevalên ku di asta pêşengiyê de. Heta em dikarin aşkere bêjin; di vê mijarê de qasî bi hemû armancên me yên siyasî di pratîkê de xwe didin der, ewqas jî pêkhateyeke kompleks heye. Yanî em qet pê ne bawer in da ku her tişt aram bûye û ketiye pêvajoyeke sekinînê. Lê em dikarin vê diyar bikin; bi şiklêkî çors (kaba) be jî, weke şiklê têkiliyên sereta yê gelan be jî, fêmkirina me ya sosyalîzmê û ew di qada pirsgirêkên welêt bikaranînê de em berendamê pêkhateyeke wisa ne ku heval wê karibin baweriya xwe pê bînin.

Armancên siyasî, têkiliyên pratîkî yên ku armancên siyasî hewl didin wan dorpêç bikin, qadek ku heval karibin li ser şoreşgerî bikin afirandiye. Em dikarin bêjin; eger heval di baweriyên xwe de bi israr bin, eger hê îro jî bixwazin baweriya xwe ya bi welatparêziya vî welatî re bi şiklekî bi biryar bidomînin, tevî li qada ku îro hatiye afirandin weke hatiye rexnekirin kêmasî hene, bi şerta ku taybetmendiyên burjuwaziya biçûk nîşan nedin, dema pir tengav dibin nekevin aloziyê, mirinê jî rizgarbûnê jî di nav vê pêkhateya îdeolojîk û siyasî de lê bigerin, ji berê hê zêdetir xwediyê şertûmercên erênî ne. Niha bûne xwediyê gelek kes û amûrên ku

berê nikaribûne peyda bikin. Eger em îdîa dikin da ku em di armancên xwe yên şoreşê de hê jî xwediyê baweriyê ne (bê guman em îdîa dikin), eger hewce bike em ê vê baweriyê her roj ji nû ve ji nû ve nû bikin, em ê vê baweriyê ji nû vê ava bikin dîsa jî bi parêzin, em ê dîsa jî baweriya xwe ya bi têkoşînê îlan bikin. Îro amûra li gel me, hê zêde derfet dide me da ku em şoreşê pêk bînin.

Em dibêjin em xwe û pêkhateya civakî ku em di nav de ne ji bo ti kesan naecibînin. Eger hûn çiqas bêjin *“vê pêkhateya civakî tiştek nedida me”* û çiqas li dijî vê pêkhateyê (yapı) civakî serî hildin, pê çiqas hanekên xwe bikin, çiqas bin pê bikin û biaciqînin hûn ewqas amade ne. Belê, me ev zanebûn, ev hêz da, em ê berpirsiyariya wê ya dîrokî qebûl bikin. Lê, li aliyê din em dikarin bêjin civak û hêviyeke nû ava kirin jî erk û wezîfeyeke mirovahiyê ye, hê zêdetir erk û wezîfeyeke welatpêriziya ku ji vê çavkaniya xwe digire û pîvaneke girêdayî mayina bi berjewendiyên gel ve ye. Yanî; me dema ya kevin xira dikir, ji hev dixist û li aliyê din me ji nû ve riyek nîşanî van mirovan dayin, ji bo van mirovan hêviyeke nû afirandin ji bîr nekir. Bertekên (tepki) ji bo raboriyê, nefreta ji bo raboriyê û di roja me ya îro de bertekên li dijî bi her şiklê zilm û zorê, ti car em nêxistin nav helwestên şexsî an jî helwestên anarşîst û nikare bêxe jî. Ketina nav helwesteke bi vî şiklî, tê maneya xelasbûnê. Li qadên ku me ya kevin xira kir û belav kir, em timî soza ji nû ve avakirina sîstemekê didin, ku em dikarin li beranberê dijminên hindur û derve vê pêk bînin. Em tenê bi dayina sozeke wiha namînin, em dibêjin bi qasî ku quweta me têrê dike em ê ji bo vê bixebitin, helwest û fikrên me hemû jî li ser vê esasê ne.

Eger bala we kişandibe, ez weke rewşeke bi guman hebe diaxifim. Ya rast van hemûyan ji bo xwe tînim ziman. Ez xwediyê her delîl û belgeyê me ku dikarim nîşan bidim; ji bo jiyana niha nabe ku zêde bi guman bim an jî girêdayî van armancên xwe me. Lê tevî vê, ez weke bûyî ji axifîna li ser şaxsiyeta xwe, xwe nadim aliyekî. Ya rast, ji hemû hevalan vê hêviyê dikim. Yanî, divê heval

şexsiyetên xwe (dixwaze bila kesayetiyên pir xurt, dixwaze bila aliyên pir lewaz bin) bi keda xwe îsbat bikin. Ji ber ku aliyên wan ên pir lewaz (zeîf) hene, kes nikare hanekên xwe bi wan bike an jî kes nikare bi rexneyên pir giran wan bixe bin erdê. Dema ku ew vê zeîfiya xwe îtiraf bike, wê bi misogerî pê re derfeta hê zêde pêşketinê peyda bibe. Dîsa, hevalên ku taybetmendiyên wan ên xurt hene jî, pêwîst e li ser esasên ku me niha behs kirine bi rastî jî karibin bi ked û afirîneriya xwe, vê nîşa bidin. Bila ti kesek ne ji otorîteya min ne ji otorîya yeke/î din, ne ji vê/vî ne ji wê/î xwe çav tirsandî neke. Bila, ji ya ku hûn rast dizanin heya dawî birinê, ti hêz we bi şun de nede.

Rêziknameya (tüzük) ku wê ji vê pêvajoyê bi şun de were çêkirin û merkeza ku di pratîzekirina vê rêziknameyê de berpirsiyar e û li gorî qaîdeyên vê rêziknameyê hereket bike; wê bi misogerî li gorî armancên siyasî yên hatine diyarkirin, rêxistinbûnekê pêş bixe û dema vê rêxistinbûnê ava bike wê beşeke mezin ê rexneyên heya niha hevalan pêş xistine derbas bike. Xebatên ku em ê li ser rêzikname û li gorî vê rêziknameyê pêş bixin; wê derbara rewşa çalakiyan de, derbara nêrînên sosyal şoven û reformîst de, di mijara rexneyên ji bo gundî, karker û jinan hatine pêşxistin de, derbara xebatên bi rêbazên nû yên ku kadrobûneke hê li pêş û mayende pêş bixin de wê gelek bi me bide qezenckirin. Beşeke mezin a van rexneyan wê karibe were derbaskirin. Tevî ku em li ser sed hezaran bitesîr in, ji ber ku em nikarin şikleke rexistinî ya xurt û her diçe cewhereke şerker pê bidin qezenckirin, di mijara pêwîstiya bi xebateke birêxistinkirî ku jixwe heye, di nav hevalan de tevlîheviyeke mezin derdikeve meydanê. Em, ji bo soza rizgariyê ku me daye van kesan, rêxistinbûn û îlankirina armancên xwe yên siyasî bi cih tînin.

Ji ber ku em nikarin li beramberê daxwaza van zêde xwe ragirin, em bi vî şiklî derketina holê weke erk û wezîfeyekê dizanin. Ya rast em di vê mijarê de bi bawarî ne. Em bi rehetî dikarin bêjin

ku em ê ji bo vî welatî saziyeke polîtîk a nirxdar biafirînin, ji derveyê xayinên harbûyî yên vî welatî di serî de ji bo karker, gundî, kedkarên din û beşên ku girêdana xwe ya bi welêt re bi welatparêziya xwe ya di astekê de didomînin em ê bibin çavkaniya hêviyê û li hemberê dijmin rêzdariyeke diyar bidest bixin. Em dikarin bi hedefên siyasî yên li pêşiya me, bi kadroyên heyî, bi qaîdeyên rêxistinbûnê yên li pêşiya me, pêşerojê li pêşiya me bikin pêşerojeke nirxdar û ji bo beşên hê berfireh ên gel, bikin çavkaniyeke hêviyê. Rêxistinek ku bi siyaseta 'em ê çêbikin' re mijul dibe û hemû pêdiviyên vê yên îdeolojîk û rêxistinî pêşwazî (karşılama) dike, wê di nav refên gel de bibe xwediyê wezîfe û hêzeke hê mezintir û li hemberê dijminên xwe jî cihekî hê bi şeref û keramet bi dest bixe.

Dema em vê tînin zimên, divê em vê jî ji bîr nekin: Bi rastî jî tiştê rêxistin û tevgerên din bi navê Kurdistanê li Kurdistanê kirine rûreşiyek e. Şexsiyetên ku li navarastê ne, bi qasî mirov silav jî nedê, bênirx û bêkêr hatine kirin. Mejiyên wan di aliyê polîtîk de zêde zêde bi hin cihên din ve girêdayî ye. Mejiyên wiha ne ku, ji aliyekî ve girêdayî bi Moskowayê, ji aliyekî ve girêdayî bi Çînê, ji aliyekî ve girêdayî bi Emerîkayê, ji aliyekî ve girêdayî bi Enqereyê, ji aliyekî ve girêdayî bi Stenbolê, ji aliyekî ve girêdayî vî an jî wî feodalî ne. Ev mejî, ne azad in û siyatên ku van mejiyan afirandiye jî, zêde azadiyê nahewîne. Van hêzan bi temamî berevajiya serxwebûna gelekî û daxwazên wan ên demokratîk, hêviyên wan bi şiklekî bê rehm xerc kirine, nekarîne ku di vê mijarê de di kesayetiyên xwe de serxwebûnekê biafrînin û ji bo gelan bi kesayetiyên xwe, hin tiştên ku bibin mînak derxin holê an jî di vê mijarê de ketine nav sûcên giran.

Em raboriyê (geçmiş) dîsa bînin bîra xwe: Wê demê bi rastî jî her kesî bi peyva Kurdistanê hanekên xwe dikir. Heta me jî weke tiştekî hov e behsa Kurdbûna xwe dikir û me digo 'rewşa Kurdan diyar e'. Lê, îro ev hatiye derbaskirin. Em, ne bi saya vê an jî wê

kêrhatinên xwe, bi saya çanda pêşverû ya gelên cîhanê, bi saya têkoşînên wan û di serî de jî, bi saya sosyalîzmê hatine vê qonaxê. Lê ev roj, ne tenê ji bo Kurdan bi vî şiklî ne. Hemû gelên bindest biçûk tên dîtin û ji mirov nayên hesibandin; lê belê ji bo Kurdan ev hê zêde wiha ye û hê zêde derbasdar e. Ji ber ku Kurdîtiyeke wiha heye, ji aliyê kesî ve nayê ecibandin. Qaşo her kes ji vê Kurdîtiyê ye, lê ji aliyê ti kesî ve nayê ecibandin. Em hewl didin da ku vê Kurdîtiyê biecibînin, qebûl bikin, ev, tiştekî pir cidî ye. Em hewl didin ku Kurdîtiyek ku di dîrokê de bi paşverûtiyê hatiye strandin, bi her şiklê pîsatiya feodalîzmê hatiye tewizandin biecibînin, qebûl bikin.

Me ceribandiye da ku em têkiliyan pêş bixin û bi sosyalîzmê jiyaneke nû biafrînin. Eger heval di helwestên xwe de bi rastî jî durust bin, divê bibînin ku ji vê cudatir riyek nîne. Hin kapîtalîstên nûgihîştî (yeni yetme) hene, ji wan e ku ew ê dinê fetih bikin. Eger heval armancên van kapîtalîstan parve nakin, eger xwediyê wê baweriyê ne ku di cîhaneke bi vî şiklî mêtinger û feodal de wê nikaribin tiştekî bi dest bixin, eger di mijara di bin vê statukoyê de wê zêde nikaribin jiyanekê biafirînin de durust bin, wê demê bi rastî jî ji cih girtina di nav şerekî timî yê şoreşeke pir bi xof de û ji bo ku karibe ji xwe re qada jiyanê biafirîne, ji xwe dayina sosyalîzmê, ji afirandina rêxistineke xurt, ji afirandina kadroyên xurt, ji afirandina çalakiyeke xurt, ti riyên cuda ên hevalan nîne. Lê belê tevî vê, eger hê jî li gel hevalan rewşa bi ajoya gundîtî (em vê zêde biçûk nabînin, tiştekî seretayî ye lê bêkêr e) û dîsa bi pasîfîzma burjuwaziya biçûk, ji burjuwaziya xwe an jî ji burjuwaziya biyanî parse kirinê nemayîbe û, eger li beramberê rastiya jiyanê jî rêzdar bin, divê heval qadên jiyanê biafirînin.

Hatin dinê ne wiha karekî ji rêzê ye. Bûn mirov, di serdema me de ne karekî hesan e. Gelek pirsgirêkên van mirovan ên weke serbixwe bûn û azadiyê hene. Şexsên ku weke me ji vê ti par wernegirtine, xwediyê erkên hê mezintir in. Lê hin caran ji devê hevalan ev axaftin tên bihîstin; "*Em ecz dibin, em dikevin nav aramî*

*û seknekê, êdî mejiyên me têra van pirsgirêkan nakin."* Na, divê têrê bike! Eger têrê nake, tû yê kêmasiyê biavêjî ser kê? Ma tu yê kêmasiyê bikî ya civak û malbata xwe? Eger te kariye fêm bikî da ku ew jî zêde nesucdar in, tu yê bibînî ku ev çavkaniya xwe ji fikreke din digire û berê xwe bidê, hewce ye em berê xwe bidinê. Rewşa hawirdorê çawa ye? Li gel hin hevalan psîkolojî û sekneke wiha heye ku qey tu dibêjî ji bo me pir zêde derfetên pêşketin û jiyînê hene. Ji ber vê yekê jî rewşa mirovên di bin çewisandinên (baskı) cur bi cur de tengav bûne nadin der, diyar nakin.

Eger heval ji hemû xirabiyên mêtingeriyê, ji tarîtiya ku ji aliyê pêkhateya (yapı) civakî ya serdema navîn ve hatiye afirandin nerehet bin, divê durust bin, zanibin ku ev her du jî pir xeter in, ya rast ew e divê fêm bikin ku heya ev statu hebe, ew bi xwe di nav xiyalan de dijîn. Lê eger ev bixwazin serbilindî û kerameta mirovahiyê bibe para wan, eger xwe gihandibin vê zanebûnê, ji bûn mirovên rêxistinkarên xurt, mirovên di armancên xwe de bi zelaliyeke mezin tevdigerin û ya din jî, ji bûn mirovên bi rastî jî di çalakiyên xwe de hem hosta, hem kêrhatî, hem dikare derbeyên encamgir li dijminê xwe bide cudatir rê nîne. Rewşên bi vî şiklî, taybetmendî û karektera şoreşgerên Kurdistanê diyar dikin. Çawa ku taybetmendî û karektera têkoşîna şoreşgerî ya li Kurdistanê diyar dike, her wiha dikare bi van taybetmendî û karekteran, ji bo hemû gelên cîhanê, ji bo hemû gelên herêmê bibe mînak.

Eger em bînin bîra xwe ku kêm-zêde paşverûtiya herêmê ji me çavkaniya xwe digire, pêşneketina têkoşîna gelên herêmê û hê zêde jî pêşneketina têkoşîna li gel me, her wiha jî eger em fêm bikin ku pêş neketiye (aşkere ye ku em di vê mijarê de xwediyê cihekî çendî girîng in), eger em di helwesta xwe ya ku vê herêmê weke qada lîstokên emperyalîzm, feodalîzm û mêtingeriyê dibîne û li gorî vê dijî de berdewam bin, her hal zêde ji vê sûdeke gelên herêm û cîhanê jî nîne. Bi kurtahî ne tenê ji bo ku em ji xwe re qadên jiyanê biafirînin, ji bo ku em weke mînakeke serkeftî vê pêşkeşî gelên

cîhanê bikin û ji bo ku rewşa bindestiyê ya gelên herêm û cîhanê, ku ji ber me ye jî ji holê rakin, pêwîst e erk û wezîfeya dikeve li ser milê me, em bi cih bînin.

Ev, dibe sedem ku em fêrî hemû taybetmendiyên rêxistinbûnê bibin, heya asta dawiyê di armancên xwe de bibin xwediyê biryar û heya asta dawiyê di çalakiyan de aktîf bin, heya asta dawiyê şiyar bin û bibin xwediyê zanebûnê, yanî zanebûna hemû encamên çalakiyên me û bandora wan li ser me û ji derve, eger ji vê cudatir hovitiya dijmin tê zanîn, eger rastiya ku dijmin di seransera dîrokê de afirandiye tê zanîn, bi hêsanî teslîmî dijmin nebûnê jî tîne. Tevî ku li hemberê vî dijminî ji têkoşîneke bêhempa meşandinê cudatir ti riyên me yên din nîne jî, heya pêvajoya îro em nikarin bêjin ku em di vê mijarê de zêde serkeftî ne.

Tevî ku di armanc û rêbazê de wezîfeyeke wisa li meydanê ye, heval nikarin bêjin ku pêkhateya heyî xwe gihandiye taybetmendî û karektereke wisa. Heval, hem di fêmkirina armancên siyasî de û hem jî di çarçoveya rêxistinî û çalakvaniyê de di pratîzekirina vê de zêde zêde paşde ne. Her diçe em kêmasiyan peyda dikin û derdixin. Lê, berpirsiyarî çi ye? Ma nikare divê mijarê de hin tişt werin kirin?

Em hewl didin da ku tiştê mirovek dikare bike, em bikin. Lê belê em pê bawer in ku her mirov jî dikare karekî bike. Ez pê bawer im ku her kesek jî dikare bêyî ku zêde gilî bike, bêyî ku bi giliyên xwe derdorê mijûl bike an jî hemû kêmasî û nebaşiyê biavêje derdorê û bêyî ku xwe bispêre hêzên cuda, di esas de bi xwe sipartina kesayetiya xwe bi xwe, bi xwe spartina hiş, zanebûn û ruhê fedakariya xwe, wê pir tiştan pêş pêş bixe. Bi kurtahî, nêrîna min a li mirov ev e. Baweriya me pê heye ku mirov dikarin vê biafirînin, di vê mijarê de di navbera hev de têkiliyên pir xurt ên kolektîf pêş bixin û dozên pir mezin bi ser bixin jî. Divê ti otorîte, quweta hevalên xwe paşguh neke û ti kes enerjiya xwe li gel xwe ranegire. Divê ev karibin di çarçoveya pîvanên dozekê de hevkariyeke kolektîf biafirînin, xwe bidin ber her tiştê ku di vê

mijarê de pêş bikeve. Divê bi her şiklê pêdiviyên dozê yên derdikevin meydanê pêşwazî bikin.

Me, aliyê teorîk ê vî karî danî holê. Eger em vê hê jî daxînin asta mînakên berbiçav (şênber), eger em hewl bidin da ku herêm bi herêm, kes bi kes daxînin asta kesayetiya xwe, ez bawer im dem ê zêde dirêj be û zêde sûdê jî nede. Lê dîsa, aşkere ye ku armanca van rexne û nêrînan çi ye. Ti heval nikare bêje, *"ez jê fêm nakim"* an jî "*ne karê min e"*. Çawa ku ez ji hemû hevalan, xwe berpirsiyar dibînim, her heval jî neçar e da ku pêwîstiya bi parvekirina berpirsiyariyên girîng ên vê têkoşînê bibîne û zanibe. Eger niha bêyî ku vê zanibe û bibîne gav diavêje, dibe ku sibê xwe ji kendalekê jî biavêje.

Eger em bi bermahiyên hin fikran û bi fikrên parçe parçe li ser pirsgirêkê kûr bibin, ti car ez bawer nakim ku em serkeftî bin. Lê, eger em di vê mijarê de bibin xwediyê têgihên (kavram) rast, prensîbên rast, rêgezên rast (jixwe ev hemû temsîla îdeolojiyê dikin) û li ber ronahiya van, bi nêzîkbûneke îdeolojîk a bi hêz xwe bigihînin van pirsgirêkan, eger em pirsgirêka vê ya rêxistinî û kadro ji bîr nekin, ji bo ku em bi ser nekevin ti sedem nîne.

Dîsa, em vê timî dibêjin: ji ber ku timî dest û lingên gelan hatine girêdayîn û bi taybetî ji ber ku di aliyê ekonomîk de bêquwet û bêamûr hatine hiştin, ji wan e ku şoreşger jî wiha ye. Na, şoreşger naşibin gelekî ku burjuwaziyê dest û lingên wî girêdayî. Şoreşger bi aliyekî xwe tê maneya mirovên ku zincîrên xwe şikênandine û destên ku zincîrên xwe şikênandine jî, timî dikarin quwetê biafirînin; mejiyên ku dîlbûna mejî ji holê radikin, ew mejî ne ku wê karibin her roj fikra afirîner û fikra serbixwe biafirînin. Eger ev mejî û ev destên hilberîner bibin yek, ez ne bawer im da ku em timî di nav pêkhateya burjuwazî ji me re çêkiriye de bimînin û nikaribin zêde hêzê kom bikin, zêde qadê biafirînin. Em dikarin biafirînin. Em ne girseyeke gel a ji rêzê ne, ne mirovên dest û lingên wan girêdayî û ji mejî bigir heya dilên wan ji her aliyî ve di nav tirs, teror, ketîbûn,

biyanîbûnê de dijîn e. Şoreşger mirovên wiha ne, ku timî çareserî diafirînin, timî amûr pêş dixin û timî rê nîşan didin. Belê, şoreşger mirovên wisa ne, vê bi jiyana xwe pêk tînin. Vê, bi têkoşîna li hemberê dijmin, bi têkoşîneke mezin, li hemberî her astenga ku derdikeve pêşberê wan tînin cih. Şoreşger xwediyê cewhereke wiha ne. Ji ber vê yekê ne mirovên ji rêzê ne, ji ber vê yekê rêxistineke alîgir in ku rê nîşanî rizgariya gelan didin. Şoreşger, rêxistineke fermandariya giştî ne. Organ û beşên ku her roj çareserî, alternatîf û amûrên rizgariyê pêş dixinin.

Em dizanin ku ji aliyê Lenîn ve jî ferasetek (anlayış) ku nikare ferq û cudahiya di navbera şoreşger û mirovên ji rêzê bibîne, çawa hatiye nirxandin. Em dizanin; ferasetek ku şoreşgeran dike dûvikê girseyên gel û ev feraseta di nav pirsgirêkên gel ên rojane û ekonomîk ên siyasî de ekonomîyeke diyar, bi şiklê siyaseteke diyar dide der, feraseteke çendî serasera ye û Lenîn li dijî vê ferasetê çawa têkoşîn daye meşandin. Em nikarin di nav van pêkhateyan (oluşum) de cih bigirin. Lê, li aliyê din şoreşger ne xiyalperestên mezin in jî. Ne maceraperestên lingên wan bi erdê nakeve û tiştên afirandine û pêş xistine wê çawa encam bide nizanine jî. Şoreşger ji derveyê her du şaşitiyan, ji derveyê her du aliyan, li cihekî cuda cih digirin. Rêxistina şoreşgeran civat û rêxistineke şexsên wiha ye; dizane di hemû xebatên xwe de bi plansazî û bi hesab tevbigere, bibe xwediyê hêzê, di lêdana derbeyên xwe de di çalakiyên xwe de li gorî quweta xwe tevbigere û van hemûyan jî li gorî analîzek ku li ser dijmin pêş xistiye bike; yanî dikare hemû plansaziya ku dema fermandariyeke giştî artêşekê dimeşîne li dardixe, li dar bixe.

Ne hewceye ku di vê mijarê de zêde axaftin were kirin. Ji ber ku doxtrîna Lenîn ya ku rê nîşanî me dide li holê ye, diyar e. Pêwîstî pê nîne ku em jî di vê mijarê de îlahî rêgezekê (ilke) pêş bixin. Em dixwazin di nav refên me de jî ev rêgez (ilke) werin pêkanîn, em dixwazin heval fêm bikin û pê re bibin yek. Ez bawer im, bi vê amûra dest xwe em dikarin bêjin; dixwaze bi program, dixwaze bi

rêzikname, dixwaze bi heyina kadroyan û dixwaze bi çekan be, bi riya çi amûrê dibe bila bibe, di pêvajoya pêş me de di plansazîkirina armancên demdirêj de, di plansazîkirina armancên demkurt de û helbet di rêxistinbûnê de em ê hê serkeftîtir bin. Yanî em dikarin bêjin; me, îro ji ber ku kêmasiya hin amûrên ku berê di dest me de nebûn hineke din derbas kiriye, em ê karibin di dema pêş de plansazî û rêxistinbûneke hê baştir li dar bixin. Û çawa ku hûn îro vê pêşketinê li gorî demên borî hê erênîtir dinirxînin, divê hûn bi misogerî li bendê bin da ku wê di pêvajoyên pêş me de jî wisa be.

Bi rêziknameyê, wê çend wezîfeyên nêz ên merkezê werin tesbîtkirin. Di vê mijarê de helwesta kolektîf a şexsên ku ji bo meşandina merkezê werin hilbijartin û kêsên ku wê bi hev re kar bikin girîng e. Ji vê cudatir mijareke girîng ew e, ku her yek ji van valahiyekê dagire û afirîner be. Pêwîst e timî enerjiyê bide têkoşînê û li aliyekî cesaret, li aliyekî zanist, li aliyekî fedekarî bide derdorê; di qada weşanê de bi pisporî û karbeşiyê bi karanîna amûrên cur bi cur, timî pêşketinên têkoşînê ragihîne. Divê karibin plansaziyên têkoşînê yên li ser pêşerojê tesbît bikin; divê karibin program, programên xebatê yên têkoşînê yên li ser hedefên dûr û nêzîk, pêş bixin. Divê karibin kêrî çêkirina şiklên rêxistinbûnê, organ û rêxistinên cur bi cur werin, pêwîst e di vê mijarê de qebîliyetên xwe bi kar bînin. Divê karibin erkên xwe yên rojane û acîl, li ber ronahiya şert û mercên şênber (somut) pêk bînin. Eger guherînên taktîkî lidarxistin hewce be, divê karibin di wê kêliyê de vê bikin, pêwîst e karibin di vê mijarê de nermbûn (esneklik) nîşan bidin. Divê karibin kêrî afirandina organên ku pêdiviyên acîl yên rêxistinê pêşwazî dikin û kêrî dan xebitandina van organan werin. Pêwîst e xetereyên ji nêz ve gef li rêxistinê dixwun û demdirêj in, ji beriya ku derkevin meydanê bibîne û di vê mijarê de hin plan pêş bixin. Dîsa, pêwîst e karibin mutefîkên rêxistinê yên dûr û nêz bibînin, divê di çarçoveyeke diyar de bi van re têkilî bimeşînin. Bi kurtahî pêwîst e rolên xwe yên merkezî bi şiklekî herî baş bînin cih.

Divê neyê jibîrkirin, ku navend (merkez) di nav rêxistinekê de xwediyê cihekî pir girîng e û bi ser vê de jî, pêşketina rêxistinek ku aliyê wê yê merkezîbûnê hê li pêş e hê zêdetir ji navendê tê destpêkirin. Pêwîst e ji ber vê yekê jî, ji ti fedakariyan xwe dan aliyekî çênebe.

Pêwîst e teoriya Marksîst-Lenînîst pir baş were fêmkirin; divê kadroyên pêşeng timî serî li Marksîzmê bidin, ji bo bikin modela sereke û destpêkê, doxtrîna Marksîzmê bi rastî jî baş fêr bibin. Li gorî min a herî girîngtir jî, pêwîst e bibin xwediyê sebir, cesaret û fedakariya ku temsîla tevgerekê bike. Xalên herî girîng ev in. Dîsa, divê bi berpirsiyariya rêxistinê li pêşberê dîrokê û gel hesab dayinê ti car ji bîr nekin. Pêwîst e bînin bîra xwe, ku têkiliyên rêxistinbûnê yên di navbera xwe de çêbikin, wê ji bo pêkhateya hevalan a jêr, bibe model; ji ber vê yekê jî mînakên herî baş li vê qadê biafirînin û van ber bi jêr ve zêde bikin. Dîsa, em diyar bikin ku divê her yek karibe valahiyekê dagire û ne bi şiklê ku barên xwe biavêje ser milê hevalê xwe û barên hev giran bikin, barên heyî, berpirsiyariyên heyî bi şiklekî kolektîf li hev parve bikin û erkên zehmet bi hev re bimeşînin.

Helbet di mijara kontrolkirin û meşandinê de jî bi misogerî ev ê hin tedbîran pêş bixin. Ji bo ku hewîrdora tevgerekê dorpêç bikin, ya ku ji destê wan tê wê bikin. Jixwe di programê de wezîfeya gerîna li ser herêman hatiye diyarkirin. Lidarxistina civînan, çêkirina konferansan, avakirina rêxistinên taybet ên cur bi cur, rêxistinên talî û komîteyan û çêkirina cihên ku temsîla rêxistinê dikin, di aliyê rêxistinî de bi qasî karibe wê tevgerê bi xwedî bikin. Ji vê cudatir, ji aliyê enformasyonê ve wê bulten û danezanên cur bi cur biweşînin, derhaqê tevgerê dem bi dem agahî bidin. Wê dem bi dem bi qasî ku pêwîstî pê hebe bi danezanan, bi bultenan û dîsa, ji derveyê van bi materyalên weşanê yên merkezî, bi curên weşanê yên ji bo kadro derbixin, heta wê bi curên weşanan yên ku ji bo girseyên gel pêş bixin, ji bo propaganda û ajîtasyonê pêşengî bikin an jî wê ji bo

propaganda û ajîtasyonê dokumanan amade bikin; wê di vê mijarê de çarçoveya îdeolojîk-teorîk çareser bikin û teoriyê derxin holê.

Em pir-hindik dibînin ku merkezek dikare çi tiştî bike û ji bo vê yekê wê pêwîstî bi çi bibîne. Ya girîng ew e, em weke berpirsiyarên tevgereke heya asta dawî pêşketî, bi moral û sekneke wiha ya xebateke kolektîf, di pratîkê de jî bêyî ku bi astengên mezin re rû bi rû bimîne (qe nebe herî kêm heya kongre, civîn, konferanseke demên pêş, dibe ku civînek berfireh jî bibe), heya vê pêvajoyê vê derxin meydanê. Eger em ê piştî çar sal an jî demeke hê kurt werin gel hev û li ser pirsgirêkên xwe nîqaş bikin, pêwîst e wê demê serhildanên gel, tevgerên gerîla, tevgerên ciwanan werin pêşxistin û divê karibe kontrola dagirkeriya li welêt û feodalan di asteke bilind de were şikênandin û ji gel re şert û mercên hê berfireh ên serbestî û azadiyê were afirandin. Pêwîst e were nîşandan ku em jî ji biyanîbûnê hê zêdetir rizgar bûne, me wezîfeyên xwe yên siyasî hê baştir fêm kirine û me cihê xwe yê di nava mekanîzmaya rêxistinî de hê baştir nas kiriye.

Em ê çawa xwe serkeftî hîs bikin? Ji bo ku em di pêşerojê de ji xwe re bêjin em serkeftî ne, divê ji beriya her tiştî rêxistinek ku li gorî qanûnên fîzîkê heyina xwe îsbat kiriye, tevgerên girseyê yên ku ev rêxistin ji wan re pêşengî dike û tevgerên ciwanan hem di aliyê cewher de û hem jî di aliyê hejmar de pir zêde xurt bin û li welêt werin asta quweta sereke. Dîsa, pewîst e di vê pêvajoyê de tevgerên gundiyan, li dijî axayan têkoşînên gundiyan pêş bikevin. Pêwîst e di vê mijarê de rêxistin pêşengî bike û divê tevgerên berfireh ên gundiyan werin pêşxistin. Eger îro pênc-şeş rêxistinên me yên gundiyan hebin; divê em karibin di pêvajoya pêş me de vê hejmarê li ser çend herêman belav bikin. Divê em karibin bi misogerî pevçûnên di navbera eşîran de têkbişkînin, yanî dozên xwînî di astek girîng de ji holê rabikin. Pêwîst e otorîteya axayên paşverû û şefan, bi giştî jî û bi taybetî ev binesaziyên (alt yapı) ku ji aliyê mêtingerî û MİT'ê ve têne pêşxistin, ji holê werin rakirin, ji

bûn astengeke timî ku li şoreşgeran gef dixwe were derxistin, hewceye ku herî kêm şoreşger ji binesaziyek ku ji van zererên mezin dibînin were xelaskirin an jî dorpêça îxanetê ku ji aliyê van ve hatiye honandin di asteke girîng de were parçekirin. Tesîra partiyên mêtinger, faktorek e ku gel bi dewletê ve girêdide. Pêwîst e di asteke girîng de ev ji holê were rakirin.

Ya hê girîng jî divê li pişta hemû van tevgeran bi misogerî hêzeke me ya xurt a çekdarî were avakirin. Yanî, pêwîst e hem di qada îdeolojîk û hem jî di qada polîtîk de ji bo parastina hebûna me ya rêxistinî, timî li pişta me hêzeke xurt a çekdarî hebe. Em ê ti car vê ji bîr nekin: Eger li pişta hemû xebatên ku em ê bimeşînin quweteke çekdarî ya xurt nesekine, divê em zanibin ku em ê timî werin tinekirin û wê ti car mafa jiyanê nedin me. Pêwîst e em ti car ji bîr nekin ku di pêvajoya avabûna îdeolojîk, polîtîk û rêxistinî de em ê karibin bi hêza çekan xwe li ser lingan bigirin. Quweta me ya îdeolojîk, siyasî û rêxistinî çendî xurt dibe bila xurt be, eger em quweteke çekdarî ya ku vê hêzê, li beramberê rêxistin û şexsên provokator biparêze çênekin, wê ev ked hemû li ber avê biçe. Ji ber vê yekê ye ku; hê ji kêliya destpêkê ve, ne ji bo ku bi tenê çend hedef werin îmhakirin, bi serê xwe, ji bo ku hemû destkeftên me yên îdeolojîk-polîtîk werin parastin, ji bo pêşî girtina li ber îmhaya van destkeftên me, em neçar in hêzeke çekdarî ava bikin.

Hiquqên burjuwa yên welatên din, kêm-zêde destkeftên wan ên îdeolojîk-polîtîk rewa (meşrû) nîşan didin û nafikirin da ku wan zêde texrîb bikin an jî wan rakin. Lê, desthilatiya burjuwa ya li Kurdistanê, hiqûqa wê an jî hiqûqa feodal, zordestî, nîşan dide ku her kes dikare jiyana xwe bi çekan qezenc bike û bidomîne. Eger bi ser de jî, ev hêz rêxistineke şoreşgerî, tevgereke şoreşgerî ya avabûnê (kuruluş) be, helbet bi misogerî hebûna çekan pêwîst e. Divê ji bo wê jî tevgerên ku bên pêşxistin û avabûna rêxistinî û îdeolojîk li ser esasa hêzeke çekdarî were amadekirin. Di vê mijarê de jî em neçar in bi misogerî tevgereke çekdarî ava bikin. Eger em

karibin vê biafirînin û bidin jiyîn, em ê karibin xwe serkeftî îlan bikin.

Di civînên demên pêş de dema merkez hate gel hev, eger ev pêk anîbe wê xwe serkeftî bibîne. Eger karibûye di qada siyasî û rêxistinî de kadroyên xwe bike xwedî tecrube, karibûye wan bîne rewşek ku kar dikin, wê were hesibandin ku di asteke girîng de wezîfeyên xwe yên rêxistinî pêk aniye. Eger karibûye kadroyên xwe bixebitîne, eger karibûye di nav rêxistinê de wezîfeyekê bide her kesê/î û eger dikare kêm zêde her kesê/î li gorî qebîliyeta wê/î bixebitîne, rêxistin an jî merkezeke wisa, wê bê hesibandin ku ew bi ser keftiye. Dîsa, eger kariye cesareteke di asta herî pêş de û ruhekî fedakariyê bide kadroyên xwe, eger kariye ji bo têgihîştina dinê û welêt feraseteke (anlayış) zelal bide kadroyên xwe, wê bê hesibandin ku xwe serkeftî dîbîne. Dîsa, eger di çavtirsandin û bêdengkirina ajan-provokatoran de, li ser şexsên harbûyî yên ku temsîla mêtingeriyê dikin, bi taybetî serkêşên faşîst ên herî bi xeterî, çalakiyên îmhayê hatibin lidarxistin û li ser axayên bi van re di têkiliyê de ne teror hatibe pêkanîn û di çalakiyên bi vî şiklî de serkeftin hatibe bidestxistin, eger hemû ev jî bi şiklê ku gel karibe qebûl bike û li ser morala hevalan bandoreke erênî bike û heta cesareta wan zêde bike hatibin pêkanîn, dikare were gotin di mijareke wiha de serkeftin hatiye bidestxistin. Ji bo ku gel bi welatparêzî û ruhê demokrasiyê re bibe yek, eger pêşketineke girîng hatibe pêkanîn, eger kariye hê zêde girseyên gel tevlî tevgereke wiha bike, eger kariye li hemû qadên welêt, li hemû herêmên wê, li gund, li bajar, li navçe, li febrîqeyan, li qadên kar-hilberînê, li qadên perwerdeyê, fikrên di qada welatparêzî û demokrasiyê de bi zêdehî bi girseyên gel re kiribin yek û kariye li welêt bibe tevger û fikra hakim, eger kariyê vê rewşê ragihîne derve û hindûr û rewa bike, wê xwe serkeftî bibîne. Ev qadên ku navên wan derbas bûne, mijar an jî pîvanên wisa ne merkezek ku niha li gel me ye, wê bi ser bikeve an na, diyar dikin.

Merkezeke/î neserkeftî, eger van tiştan pêk neyne wê çawa were çareserkirin? Em ê li gorî kîjan pîvanan bêjin, merkez neserkeftî ye? Eger di aliyê hejmar de têkiliyên heyî zêde kirine, lê zêde nekariye di aliyê cewher de pêşketinekê çêbike, eger nekariye ku beşeke girîng a kadroyan bi rêxistin bike, eger nekariye ku li gorî qada ew lê pispor in wezîfeyê bide wan, eger nekariye wan bîne rewşa organîzmayeke aktîf û zindî, eger nekariye di navbera wan de ruhê rexne-rexnedanê, fedakarî û ruhê cesaretê pêş bixe, eger nikarîbe bi wan kar bide kirin, eger nekariye di qadên weke têkoşîna çekdarî de, di qada têkoşîna îdeolojîk de, di têkoşîna polîtîk de van bigihîne asteke diyar a çalak û di demeke diyar de çendek pêşketinên çendaniyê (nîcel) çêkiribe û pêkhateyên heyî xistibe nav aramî û bêdengiyekê, helbet nayê hesibandin ku merkezeke/î wisa erk û wezîfeyên xwe bi cih aniye.

Her wiha bila dixwaze li parçeyên din ên Kurdistane be, bila dixwaze li Tirkiyê be, bila dixwaze di tevgerên şoreşger ên welatên din ên cîran de be, bila dixwaze li Ewrûpayê an jî li welatên sosyalîst be, eger nekariye ku hin cihên lê temsîla me tê kirin vebike, eger nekariye bi têkoşînên li van deveran re dest bi pêvajoya hevkariyê ya aktîf bike, bi kurtahî eger nekariye tifaqên di asta yekem, duyem de û heta her diçe di asta seyemîn de pêş bixe, eger nekariye di vê mijarê de cihên lê temsîla me tê kirin, rêxistinbûn û piştgiriyê biafirîne neserkeftî ye.

Eger merkezê, di platformeke herî berfireh de, mînak, li gel tevgera şoreşger ya Tirkiyê bingeha avakirina Eniya Rizgariya Neteweyî avêtibe, helbet bêyî ku ji serbixwebûnê tewîz were dayin, eger dikare bi hêzên ku xizmeta vê bikin ên antî-faşîst re bibe yek, li şuna ku tesîra wir li ser vir çêbe, eger dikare hê zêde di qadên îdeolojîk û rêxistinî de yanî bi îdeolojî û rêxistinbûneke sosyalîst ji bo têkoşînên parçeyên din ên Kurdistanê bibe ronahî û asta têkoşînên wan deveran hê jî bilintir bike, bêyî ku vir bike yêdekeke

wir, eger kariye di navbera hêzên cewherî yên vir û hêzên cewherî yên wir de têkiliyên bi tendurustî çêbike, wê serkeftî be.

Bi taybetî di pêvajoya li pêşiya me de dikare weke hedefeke din a cuda ev were nîşandan: Pêwîst e, di hilbijartina li parlementoya Tirkiyê de were kirin, (her çendî ji bo niha tiştek nayê gotin jî) endamên ji aliyê feodalên komprador ve hatine tercihkirin, hê zêde jî reya êrênî ya burjuwaziya Tirk girtine û ya din jî endamên rêxistinên burjuwaziya biçûk yên noker in, werin derbe kirin û çûna wan a parlementoyê were astengkirin.

## Encam

Em nêzî dawiya civînê bûn. Eger em niha bi analîzkirina şert û mercên em tê de ne, giraniya erk û wezîfeyên em pê re rû bi rû ne fêm dikin, ya rast ev tê maneya ku em bi karekî ku di pêşerojê de tesîrên girîng derxe holê re mijûl dibin. Ji bo ku di pêşerojê de tesîrên vê hê zêdetir bin, dîqeta ku em ê ji vê bi şun de nîşan bidin bi rastî jî pir girîng e. Ya ku îro hatiye diyarkirin, bi qanûn û rêgezan hatiye hedefgirtin bingehên rêxistinekê ye: dibe ku beriya bi salan bingehên wê hatibû avêtin, lê eger em ê ji vê pêvajoyê pê de, bibin tevgerek ku li gorî rêgezên hê rêxistin kirî yên şênber ên hê diyar dimeşe, nirxa gavên dibe ku em niha biavêjin, dibe ku em ji vê bi şun de biavêjin pir girîng e. Eger em karibin weke tê xwestin van gavan biavêjin, eger em karibin maneya dîrokî ya van gavan fêm bikin, eger em nirxê wê zanibin, em bi rehetî dikarin diyar bikin, ku di dîroka rizgariya gelê welêt de ev dikare bibe xaleke werçerxanê (dönüm).

Afirandina qadeke siyasî ku pir nû û zindî ye, afirandina qadeke demokratîk a zindî, li Kurdistanê afirandina qadek ku lê şoreşger bi hêsanî kar û xebat dimeşînin, wê bi hewldanên pir zêde yên ku em ê ji vê bi şun de bimeşînin mimkûn bibe. Ji vê cuda, li şuna kar û xebata ku li hemû qadên jiyanê tê meşandin û hê zêdetir xizmeta paşverûtiya herêmî, xizmeta berjêwendiyên quwetên çewisîner

(baskıcı) ên neteweperest dike, her çendî bi xetereyan tijî be jî hewldaneke wisa ku mirov timî ber bi jiyaneke serbixwe û azad ve bide tevgerkirin, hewldaneke herî nirxdar e. Heval hemû ciwaniya xwe didin vê; ya rast ev ne mijarek ku ecêb were dîtine. Ciwantiyeke bi vî şiklî, eger rêza ji bo mirovahiyê neqedî be, ji vê cudatir bi tiştekî din re nayê mijulkirin. Helbet ew ê bi şer û têkoşîn dayina ji bo dozeke mezin maneyekê bigire ser xwe, wê kesayetiyekê qezenc bike, bibe şexsiyeteke jê re rêz tê girtin. Ji ber vê yekê, em, bi jiyana wan bibe mal jî, ti xetere tê de nabînin da ku heval bikevin bin her herî barê giran, û erkên dikevin li ser milên wan bi cih bînin. Helbet rewşeke me ya weke fikara burjuwaya biçûk, fikara feodalekî, fikara baviksalariyê nîne; eger hebe jî em ê bilez ji van fikaran dest berdin.

Dozên mezin, ti car bi rêgezên bûne klîşe yên ku hatine fêrbûn, bi rêxistin û ferasetên kevneşopiyê (geleneksel) naçin serî, serkeftinê bi dest naexin. Dozên mezin tenê dikare, timî bi derketina ji derveyê klîşeyên hatiye fêrbûn, timî bi derketina li dijî rêgezên ku her kes li ber stu xwehr dike, bi hewldanên rêxistinî ku kesî newêraye û çalakiyên bi vî şiklî were biserxistin. Serkeftin, dikare bi hê zêde şexsên pêşeng ku wê van berpirsiyariyan rabikin were biserxistin. Em, mirovên serdemeke bi vî şiklî ne. Em, weke mirovên vê serdemê xwe berendam dibînin. Em dixwazin mohra xwe li serdemeke bi vî şiklî bidin. Serdem û şert û mercên vê yên civakî hene. Êdî, ya ji vê bi şun de girêdayî bi xebitîna bîr (hafiza) û dilê me ve ye. Pêkanîna van jî, di destê me de ye. Yanî ev karekî wiha ye ku kesek dikare bi îradeya xwe, vî karî bike.

Dema em hêdî hêdî weke grubekê derdiketin, xetere û bêderfetiyên li pêşiya me li gorî îro bi caran zêdetir bûn. Dîsa, îro jî xetereyên li benda me ne, zêde zêde ne. Ne kêm in, lê amûrên di destê me de li gorî doh hê zêdetir in. Divê em karibin jiyanek ku di nava têkoşîn û şer de tê jiyîn bikin armanca sereke ya jiyanê, em ê vê bikin û em dikin jî. Bi taybetî eger bê hêvîtî hebe, divê heval bi

riya fikra şoreşgerî, bi riya pratîka şoreşgerî, vê derbas bikin. Divê, şaşî û kêmasiyên ku kirine, ji ber ku hê di temeneke ciwan de ne, hê li pêşiya wan pratîkeke têkoşînê ya dem dirêj heye, bi riya çalakiyên xwe yên serkeftî derbas bikin. Û ya ku ji dîrokê re bimîne, ya ku rayên xwe berde nav civakê û di nav dilê civakan de ji xwe re cih çêbike jî, fikr û helwestên bi vî şiklî ne.

Çalakiyên ku me çarçoveya wan diyar kiriye hene. Me diyar kiribû ku di mijarên amadekirina danezaneke avabûnê ya baş û di nava têkoşîna me de li ser cihê hevalan ku berê xebat lê meşandine biryarên me hene, em ê di vê mijarê de du erk û wezîfeyên girîng bînin cih. Ya din jî, me qebûl kir da ku, merkezek ku em ê di pêşerojê de amade bikin (dixwaze bila beriya dema xwe ya asayî be, dixwaze bila em di dema wê de çêbikin, dixwaze bila di konferansekê de be, dixwaze bila di kongreyekê de be) di vê mijarê de xwediyê raye (yetki) ye jî. Bêyî ku em hê axaftinê dirêj bikin, hilbijartina hevalên ku me taybetmendiyên wan, pîvanên wan ên serkeftinê û feraseta wan a xebatê diyar kiriye bûye mijara axaftinê, mirov hinekê dikare li ser hejmara wan nîqaş bike. Em ê hewl bidin, di jiyanê de pêşniyarên derketine holê pratîze bikin. Ev aşkere ye lê belê em ê piştî bi demeke diyar belav bin, piştî bi belavbûnê tiştê ji hevalan tê xwestin, ku mijara herî girîng ya pêwîst e ji bîr nekin ev e; li gorî ku wê rêxistinbûneke wiha ji jor ve were pêşxistin, divê têkiliyên xwe yên ku li herêman li gorî xwestekên vê merkezê amade bikin. Yanî, bi kurtasî, divê potansiyela hevalan, ku li gel wan amade ye, li gorî qadan yanî li gorî vesazkirineke (düzenleme) muxtemel a ji bo van qadan were çêkirin bigirin dest û weke komîteyeke wir a herêmî tevger bikin, divê zanibin ku her kêliyê dibe ku di vê mijarê de bi pêşniyarekê re rû bi rû bimînin û li gorî vê tevger bikin.

Berpirsiyariya vê rêxistinbûnê ne tenê ya me ye. Berpirsiyariya vê rêxistinbûnê li ser pişta wan hevalên e, ku wê belav bin û pir zêde têkiliyan çêbikin. Heta eger nayê xwestin ku hin tişt werin

fedakirin, pêwîst e karibin baş li potansiyela hevalên li gel wan in xwedî derkevin û vala vala xerc nekin. Dîsa divê heval ti car, amadebûna ji bo rêxistinbûneke bi feraseteke nû û fermî, ji niha ve avakirina komîteyên muxtemel, sazî û komîteyên jêr ên girêdayî van komîteyan, grubên bajaran, grubên febrîkayan an jî herî kêm di vê mijarê de amadekarî kirinê ji bîr nekin. Wê rêxistinbûna me ne bi şiklê fêmkirineke rehet, heya asta dawiyê bi aramî, heya asta dawî rehet pêş nekeve. Em dizanin ku, wê li Kurdistanê ti tişt ji nişka ve û di carekê de pêş nekeve. Wê her tişt li gorî hesabekî diyar an jî wê li gorî pêşketinek ku hêdî hêdî pêk tê û li ser hev kom dibe, çêbibe. Wê rêxistinbûn hêdî hêdî pêş bikeve, hêdî hêdî ber bi jêr ve belav be û hevalên ku xwediyê qebîliyetên baş in wê li cihê ku lê ne werin birêxistinkirin.

Em ê di encam de bi taybetî di demeke diyar de qe nebe materyalên di destê xwe de birêxistin bikin. Em ê li beranberê derve û li beranberê rewşa kompleks a hindurê xwe, wan sererast bikin. Eger heval pê bawer bin ku ev gavên avêtine dîrokî ne, eger di vê baweriya xwe de durust bin, divê bi misogerî helwesteke şaş a herî biçûk jî nîşan nedin. Aşkere ye ku divê di xebatan de ne ku arambûnekê qebûl bikin, hewce ye rêxistinbûneke hê bi disîplîn bînin bîra xwe û wan xebatan xurtir bikin. Hûn evqas nasnameyeke polîtîk a mezin didin tevgerê, hûn dizanin ku ev ê, dijmin û hêzên wî yên zordest çendî texrîk bike. Lê hûn ê têvî vê ji berpirsiyariyên vê yên giran jî xwe bidin aliyekî! Em, vê hêviyê ji hevalan nakin û vê qebûl nakin. Eger heval helwestên wisa nîşan bidin, merkez nikare tiştekî bike. Dibe ku merkez jî bi bêberpirsiyariyeke mezin ji her tiştî dest berde an jî bi hêsanî tasfiye bibe. Pêwîst e, ji ber vê yekê helwesteke wiha were raberkirin, ku merkez li dijî polîs, li dijî îqtîdara siyasî, li dijî zordariya herêmî, li dijî hêzên sosyal-şoven û burjuwaziya biçûk a reformîst nekeve rewşeke zehmet û divê hûn timî ji me re bibin çavkaniya oksîjenê, hewaya paqij bi me bidin stendin; timî hinaseyeke (nefes) nû ya nav refên civakê, enerjiya

wê, xwîna nû ragihînin nav refên rêxistinê. Divê, hûn di têkiliyan de hê zêde derdor, hê zêde endam qezenc bikin û karibin timî van tevlî nav têkoşînê bikin û em di vê mijare de li bendê ne, hûn gavên ku em pir pê kêfxweş bin biavêjin.

Em dibêjin di vê mijarê de bi agahiyên erênî quwet bidin me.

Pêwîst e heval bi rastî jî, fikarên xwe yên şexsî, nêzîkbûnên xwe yên şexsî bidin aliyekî. Arteşên burjuwa jî, bi disîplîneke li ser bingeheke neheq û derewîn tên meşandin, lê tevî vê hemû, timî di rewşek ku karibin bikevin şer de ne. Mijarên herî girîng ên ku em ê li bendê bin ev in; pêwîst e hevalê me jî, her kêliyê weke rêxistineke şer, weke serfermandariyeke îdeolojîk-polîtîk xwe li hizûra gel bibînin. Pêwîst e di vê mijarê de tirs, bêzarî û fikareke şexsî ya herî biçûk nekeve dilê hevalan û heval timî enerjî û cesareta xwe nû bikin.

Dîsa, di vê mijarê de ji fikarên weke *“çima nebû, gelo dîsa hin tişt çêbûn?”* re zêde cih nîne. Li gorî ku li Kurdistanê, em pêş ketine, em natirsin an jî ji ber ku aliyê timî bi pêş dikeve em in û yê ku zû dike û pêwîstiya wî bi vê heye dijmin û çînên ku temenê wan xelas bûyî ye. Em jî hêzek wiha ne; ku bi berdewamî raboriya xwe li ser hev kom dikin, pêşeroja gelê xwe amade dikin û roja me ya îro fêm dikin. Ji ber vê yekê pêwîstiya me bi lezkirinê, pêwîstiya me bi bêsebirbûnê nîne. Em dikarin bi şiklekî aram, bibiryar û bi xwînsarî ji bo şoreşeke herî bihêz a cîhanê xwe amade bikin. Ma em ê çima rewşa panîkê bijîn, çima em ê bi tirs û fikar bin? Divê em bi ruhekî bi tenduristî û hêrî pîroz erk û wezîfeyên xwe bicihanînê bidomînin.

Bi hemû mijarên heya niha hatine axifîn, ji hevalan re têra xwe hatiye vegotin ku divê em bi vî şiklî bimeşin. Me cewher û taybetmendiyên rewşê, cewher û taybetmendiyên riya ku em ê bimeşin, karekter û taybetmendiyên pêşerojê danîbû holê. Ji vê re ji tevlîbûneke bi xwestek û cesûr cudatir, ti riyên me yên din nîne. Dema em van axaftinan dikin, weke we hemûyan dîtiye em ne bi şiklekî bi heyecan û kêfxweşî bi coş dibin, ne jî heya asta dawiyê

çavê xwe ditirsînin. Belê ne ew heye, ne jî ya din. Em bi taybetî ji xwe re, di nav xwe de dibêjin; em ê bi mantiqeqe qeyim, fikar û hevîyên xwe biparêzin, ne bi baweriyeke zêde û ne jî bi zêde fikaran, lê em dikarin hê bibiryar, hê bi mantiq vî karî bimeşînin.

Dibe ku di vê qonaxa dîrokê de bi rastî jî zimanê civakê nebe. Dibe ku civak bêxem be û di xewê de be. Dibe ku civak nîvmirî be, dibe ku dengê wê, zimanê wê û çanda wê nebe. Ev hemû nabin sedem da ku em li pêşberê pirsgirêkên gel bêxem bin. Ya din, dibe ku mêtingerî, hêzên zordar ên neteweyî, di her aliyî de bêrehm bin, dibe ku ew, tiştekî ji heq û hiqûqê fêm nekin. Dibe ku azadiyeke herî biçûk nedin gelan û bi şiklekî herî harbûyî gelan tine bikin. Lê ev hemû nabin sedem da ku em bêxem bin û bi helwestên layiqê şoreşgeran tevnegerin. Em ê rewşa xwe ya heyî, bi rewşa ti hêzan îzah nekin û bi rewşa ti hêzan re pêşberê hev nekin. Em ê hemû tiştên erênî yên serdemê bînin gel hev; divê em hêzên ku pêwîst e bên bi binxistin û hêzên ku pêwîst e azad bin nas bikin û pêşengî bikin. Ez bi israr bal dikişînim ser vê mijarê; divê em ti car ji bibiryarbûna xwe ya di vî warî de dest bernedin. Ev sekna bibiryar, eger em li cihê xwe jî bisekinin, wê gelek tiştan biguhere. Baweriya di vê mijarê de heye, hewldana  di vê mijarê de heye wê gelek tiştan biguhere. Cudatir, wê ji gel re deriyekî hêviyê yê mezin veke.

Hejmara me çendî kêm dibe bila kêm be, temenê me, tecrubeya me çiqas têrê nake bila têrê neke, tevî van hemûyan ji bo wezîfeyên giran ên ku wê dîrok bide ser milê me, pêwîst e em ji bo xatirê wan wezîfeyan hewldan û biryarbûneke têrê dike nîşan bidin. Divê em weke diranên şeyekî wekhev bin; dîsa, divê em weke neferên artêşekê, weke ekîbeke dibe ku her kêliyê, li cihekî bikeve mewziyên cuda, bikevin nav têkoşînê û ji ber vê jî, gumaneke herî biçûk, tirseke herî biçûk nekeve dilê me. Em dibêjin pêwîst e li gel me timî rêxistin û hevalên bi vê karekterê çêbin. Nirxa vê, ji bo têkoşîna me pir mezin e. Aşkere ye ku zanebûna me, xwe nû kiriye, aşkere ye ku klasîkên Marksîst-Lenînîst û pratîkên rizgariya

neteweyî ji nû ve wê di ber çavan re werin derbaskirin. Aşkere ye da ku em ê bi şikênandina qeyd û bendên mêtingeriyê ku bêhnê li me diçikînin re, ji bo em mejiyên xwe li çanda pêşverû ya cîhanê vekin, em ê zorê bidin xwe. Dîsa aşkere ye ku em ê aliyên gelê me yên zindî yên ku koh (körelmiş) bûne ji nû ve vekin, bi gel re, bi aliyên wî yên pêşverû re em ê bibin yek. Ya din jî em ê zaninbin, ku ji ber pêşketinên di qadên civakî, çandî û siyasî de bêhn li civakê çikiyaye, ji ber vê yekê jî di van qadan de bêhneke paqij û rehet bi gel dan sitandinê û gel rakirin ser piyan, em ê ti car ji bîr nekin.

Dîsa, divê heval di têkiliyên di navbera xwe de zêde zêde giranî bidin nêzîkbûnên îdeolojîk-polîtîk. Divê nêzîkbûnên hevalan, li beramberê hev, bi wezîfeyên îdeolojîk-polîtîk û rêxistinî re bi aheng bin. Divê zêde rê neyê dayîn ehbab çawîştiyê. Divê ji derveyê xebatên îdeolojîk-polîtîk, zêde dema xwe nekujin, divê bi temamî xwe bikin şexsiyetiyeke/î îdeolojîk-polîtîk. Pêwîst e dema hanekan dikin jî, pîvanên îdeolojîk-polîtîk li ber çav bigirin. Divê em di qadên jiyana taybet de jî, li gorî helwestên îdeolojîk-polîtîk tevbigerin û berjewendiyên tevgerê li ber çav bigirin. Divê heval karibin weke endameke/î têkoşîna me, xwe di her qada jiyanê de nîşan bidin.

Em dixwazin ku (bi taybetî ji vê şunde); di berdêla mirina gelek hevalan de, di berdêla di zindanan de rizînê, ya din jî di berdêla fedakariya mezin a hevalên ku mayine de, ji vê bi şun de bi hêzeke nû, bi rêxistin û hevalên jidil, di encama pêşketineke çar-pênc salan de tevgerek ku bi başî û nebaşiyên xwe ve heya vê qonaxê hatiye, bînin rewşa rêxistineke vî welatî ya herî zêde rêzdar, herî zêde hêvî dide. Xwesteka me hemûyan ev e, xwesteka gelê me ev e, xwesteka gelên cîhanê ev e.

Pêwîst e ev hemû, ji me re weke tiştên derveyê cidîbûnê neyên, an jî ji derve weke tiştên derveyê cidiyetê neyên fêmkirin. Ev hemû, erkên herî zelal ên serdema me ne. Karê herî şaraza (uygar) yê serdema me, karê herî girîng ê ku mirovahiya hemdem dike û karê ku hêrî zêde diyarker e ev e. Tiştê ku her kesî ji mêj ve

kiriye, bi şiklê dereng mayî, em niha dikin. Pêwîst e ti heval wisa nebêjin; *"çima her kes li ser karê xwe ye, her kes bi hewldaneke pir kêm têkoşînê dide, çima ez wisa weke dîn û harbûyî dixebitim"*, û vê neynin bîra xwe. Ji serdemên herî kevin ên dîrokê pê de hêviyên gelê me yên serxwebûn û azadiyê timî di bin zilm û zordariyê de hatine çewisandin, ji vê jî wêdetir xwestine gelê me tine bikin. Em, weke hêzek ku têkoşîna vî gelî didin, dîsa li gorî ku em hêza pêşeng a tevgereke siyasî ya li herêmê, encamên pir girîng bide ne û afirînerê vê tevgerê ne, nabe ku qe ti gavên em diavêjin ji me re bêmane were an jî nabe ku her roja derbas dibe em weke rojek ku ji temenê me diçe, lê binêrin. Divê em bi tamamî weke jiyan bi xwe ye li vê binêrin û pêwîst e qet bi ti kesî/ê re poşmaniyeke herî biçûk çênebe. Divê hûn di zindanê de jî, li ber sêdarê jî, di demên herî giran ên ku bi tena sera xwe dimînin de jî, di rewşa xwe ya herî bi alozî jî, vê ji bîr nekin. Divê hûn li xwe mukur werin, ku ya hûn dijîn bi temamî jiyan bi xwe ye.

Herî dawî, pêwîst e encamên li vir derketine meydanê werin gihandin herêman, bigihîjin herêman. Hûn ê, rasterast nebêjin *"me ev an jî ew tişt kir"*; lê her kes dikare bi şiklekî nerasterast, li herêma xwe rêbazên ragihandina encamên vê civînê peyda bike. Em dubare diyar bikin; li herêman weke komîteyekê tevgerîn, wê nîşan bide ku encamên vê civînê hatine fêmkirin. Erk û wezîfeyên herî germ, herî girîng û jiyanî ew in ku; heval, encamên civînê bi vî şiklî ragihîn herêmên xwe, herêma xwe li ber ronahiya vê civînê ji nû ve amade bikin, ji têkilî û wezîfeyan re amade bikin.

Adullah ÖCALAN